


Gulistan



Dr. Abdullah Kiran

Rojen Barnas

Celadet Ali Bedir-Xan

Kaleciwan

Osman Ozçelik

M. Emin Bozarslan

Rohat Alakom

Recep Dildar

Mustafa Aydogan

Serabî

Şahinê Bekirê Soreklî

Salihê Kevirbirî

Riza Çolpan

Berken Bereh

Bedirxan Epozdemir

Mem Xelikan

Felat Dilgeş

Tital Mûradov

Eskerê Boyık

Lokman Polat

Aramê Çaçan

Gulistan

Kovara Çandı û Edebî ya Mehane
Nisan 2002

Bi Navê Evin Turizm İnşaat ve

Yayincılık Ltd. Şti. Xwedî:

Zozan SEZEN

Berpirsiyarê Nivîsan:

Mahfuz YILDIZ

Şêwîrmendêن Hiqûqi:

Av. Kamber SOYPAK

Av. Ercan SEZGİN

Berpirsiyarê Giştî:

Dr. Abdullah KIRAN

Navnîsan (Adres)

Tarlabası Caddesi No: 95/1

Beyoğlu/İSTANBUL

Tel/Fax: 0.212- 237 10 61

E-Mail: kurtkav@ttnet.net.tr
dilges@ttnet.net.tr

ISSN: 1303-3743

Pergala Bergî û Rûpelan:

Ozgur BASUT

Şertên Abonetiyê (Salane)

Li Tirkîyê: 36.000.000 TL.

Li Ewrûpa: 48.- Euro

Li Amerîka, Avusturalya

û Kanada: 45.- \$

Îlan:

Rûpelê Paşin:

400.000.000 TL.

Rûpelê Navberê:

150.000.000 TL.

Hesabêni Bankê:

Mahfuz Yıldız

Yapı ve Kredi Bnk. Taksim Şub.

No: 0552121-6 (TL.)

No: 3009448-2 (EURO)

Hesabê Postê: 1051173

Çapxane: Yön Matbaası

Tel: 0.212- 544 66 34

Kovara Gulistanê, di çarçowa
proja MATRA/KAPê de, bi alî-
kariya Sefaretxana Hollanda ya
li Stenbolê çap dibe.

NAVEROK

Dr. Abdullah Kiran	2-3
Rojen Barnas Bêşansî	4
Celadet Alî Bedir-Xan Xwe binas.....	5-10
Kaleciwan Emê Şivan.....	11-16
Osman Ozçelik Balzac.....	17-22
M. Emin Bozarslan Bi histirêن çavan têñ nivîsandin helhestêñ me.....	23
Rohat Alakom Silîva dikeniya bajarê ko hûye şahidê dîrokê.....	24-29
Recep Dildar Jiyan bi kurdi xweş e! ..	30-31
Mustafa Aydogan Warek wêran hû- mirovahî jahrdadayî hû.....	32-35
Şerabî Vîza Şerabistanê.....	36-38
Şahînê Bekirê Soreklî Çivîk ji ser daran ketin.....	39-41
Salihê Kevirbirî Şivan Perwer.....	42-45
Gulistana Zarûkan Pîrê û rovî.....	46-49
Riza Çolpan Tu Nemirî.....	50
İbrahim Seydo Aydogan Romanekê nîvcomayî "Sorê Gulê"	51-58
Fatma Bozarslan Stranêñ tarîtiyê.....	59
Evdile Koçer De were lê.....	60
Berken Bereh Kiras.....	61
Bedirxan Epozdemîr Mela Emerê Gulpîkî.....	62-68
Mem Xelikan Şevbider im.....	69
Felat Dilgeş Pişti.....	70-76
Tîtal Mûradov Serhatiya Emrekî.....	77-81
Metîn Yıldız Têderxistinok.....	82
Ahmed Cînar Gotinêñ Pêşîyan.....	83
Eskerê Boyîk Elifba.....	84-86
Lokman Polat Hemend.....	87-90
Mûsa Vazgalî Rev.....	91-93
Aramê Çaçan Du rûvî.....	94-95

Merheba!..

Bi hejmara sisiyan a Gulistanê re em cardin bi we re ne. Wek ku me di hejmara pêşî de anî ziman, em dixwazin ku ji mehê carekê li derê we, li deriyê dilê we xin û hûn jî bi mîvanperwriya welatî deriyê dilê xwe ji me re vekin. Dîsa em dixwazin ku Gulistan, li gor hêz û karîna xwe, wek kovareke edebî, hunerî û kultûrî valahiya ku di warê ziman û edebiyata me de tê jîyîn dagire, bi qasî misqalakê be jî tîhna me bibe, hilmê li me fireh bi ke. Herweha me dil heye ku em bi her hejmara nû re, pê bi pê kêmâhiyên naverokî û teknîkî yên Gulistanê kêm bikin û lê bixebeitin ku kovar ber bi tekûziyê here.

Diyar e ku di vî warî de hê em li serê rê ne û riya ku li ber me ye dûr û dirêj e. Ev xebat, gava ku ji alî xwendevanan ve hat himbêzkirin û em li zimanê xwe xwedî derketin wê bigihîje armancê. Belê çi heyf e ku xwendevanên Kurd pirr kêm in û yên heyî jî di pirsâ ziman de sist in. Çend pirtik ne tê de, em bi rik, bi ïnad, bi bawerî û bi berx-wedan li vî zimanê xwedî dernakevin. Heta hinekan ji me dane ser riya ku dibe helaq û hilweşînê. Bê-guman ev rê, dev ji zimanê Kurdi û Kurdbûnê berdan e.

Rast e, bi hezaran Kurdên ku dev ji koka xwe, ji zimanê xwe, ji welatê xwe, ji nasnama xwe, ji rastiya xwe berdane hene; belê yên

ku dibêjin em Kurd in û li hember ziman bêxem in jî li ser riya hundabûnê ne.

Îlanek

Di herdû hejmarêne pêşî yên Gulistanê de îlanek çend kitêbên li ser Xiristiyaniyê û CDyê filmê Isa Mesîh hebû. Ev îlan, bi rica min, ji bo ku ji kovara Gulistanê re bibe alîkariyek, ji alî hin bawermendên Mesîhî ve hatibû dayin. Hemû kitibên ku di îlanê de hatibûn dayin, li zimanê Kurdî hatibûn wergerandin. Hin ji van kitêban bi gellek zimanê cihê jî çap bûbûn.

Bi awayê ku hat gohê min, hin ronakbîrên me acisiya xwe ji vê îlanê kirine û vê îlanê wek propagandaya baweriya Mesîhî dîtine. Li gor van ronakbîrên me, kovara Gulistanê ne cihê îlanên weha ye. Rast e, ji navê van kitêban jî tê fêmkirin ku ew li ser Xirîstiyaniyê ne û dibe ku bi naveroka xwe ji propagandaya Xirîstiyaniyê re xizmet bikin. Belê ev kitêb, naveroka wan a dînî li aliyekî, gava ku li zimanê me hatin wergerandin, êdî ew ji bo me di çarçowa xebata kulturî dane.

Ez meraq dikim, gelo me îlana çend kitêbên ku li ser dînê İslâmê ne û li zimanê me hatine wergerandin bida, wê reaksiyana van ronakbîrên me çi bûya? Sibê, berpirisiyarên weşanxana Nûbiharê werin û bixwazin ku îlana çend kitêbên xwe bidin, divê em çi bikin? Weşanxaneyeke me ya ku bi meyla xwe Sosyalîst tê zanîn, hê beriya

D U R Ü V İ

Rojê, rojgarekê
Nêzîkî keloşkekê,
Du rûvî hatin şikevtikê,
Gotin em qewmin ji êlekê,
Em ewledekin ji qebilekê,
Emê bikin misileta şevê
Heta sibe li me hiltê.
Rûvîk pirsî ji yê dinê,
Yê serê jorîn rûniştî
Go: -ezim xweyê cil fêl-fenî.
-Lê tu çend fêla zanî?
-Ez ci bêjim, ez heyrano,
Lo birango, ez qurbano,
Ezim xayê fêl-fenekê,
Ebûr dikim ez tik-tenê,
Mera tacî, aqil, zane,
Ulmdar ber te teve tane,
Erş û ezman li vir şede,
Emê wele qûlê tene.
Rûviyê zerîn serê jorîn
Kubar-kubar kire weqîn:

bûye du şeqan. Aliyekî wî bihuşt e yet dojeh, aliyekî wî serhildêr e yet bizdonek, di aliyekî wî de gul û kulîlk dibişkivin, di aliyê din de dipişirin, dilê min bûye bela serê min, li ser riya Helewê ji min dewa nalê kera dike. Şilopeyên di dile min de dê bage-reke mezin bizeyî nin.

Ji çûyinê re min avêtiye qulpa paşiyê. Li nava buroya germ germokê digerînim. Valêzê min li ber masê devgirti disechine. Destê min di bêrî-kên min de heyâ berpacê dicim û di jor de li kolanê dînihêrim. Kolan ji şenîyan serobino dibe. Roj li qilêwil dibirqe û şenî li nava sukê diçilvilin. Geremoleke geleki mezin heye, şenî her wisa pir in ku tu çenek xwêlî bavêjî misqalek li erdê naeve.

Bi pife pif vedigerime nava buroyê. Sekreterê şirketê ji bêhntengiya min aciz bûye, na aciz nebûye, dilê wê bi halê min dişewite û berxwedi-keve. Dike ku berdilê min ve were û dibêje, "Kekê, dixwazî heya texsî werê ji te re qehweyekê çêbikim." Lê naxêr, dile min naçe tu tiştêkî. Bêyî ku xeber bidim, bi serê xwe "na" dibêjim. Vedigerime ser masa xwe û rû-dinêm û pala xwe dispêrime qoltixû û her wisa çavê min bi arîkênu buroyê ve dadiliqin û diseke nim. Hêdi hêdi çavê min diqulibin. Ez di bêdengiya buroyê de li ser qoltixa çêrm ditelim.

Du siyar ji kêrtê inko derdikevin û ber bi tendurekê diçin. Hespekî kimêt û mehîneke hêşinboz ji kêrtê re ber-war diloqin. Hêdika û emar berjêri besta çalixa dibin; li mîrgan dikevin û ber bi kolê hestiya dibezin. Li pêş-berî Bubo, siyar ji hespên xwe peya dibin, hespê xwe di zinavikêna ava Buboya camaxi de av didin, pey re

tengê wan dişidînin. Pê dixine zengiyan û peniyan didinê. Du ceniyêni ji tewla xwe filitî tevî bayê zozan dan bin û qilêwil de diqulibin. Ez li pey wan dikevim, "Loo siyaro di ku de, neçin min jî bi xwe re bibin" dibêjim û diqîrim lê guh nadine min û ez li ser situ dizivirim. Porsîde dibim û diseke-nim. Vedigerime dewsa nalê hespên wan, tenê toz û dûman dimîne ji min re, diqîrim û vediciniqim. "Li ser su-retê xêrê kekê Seyit ci bi we bû" dibêjê tifala sekreter. Mîna ku ez di şermê de têm girtin soromoro dibim, "Qet!.. Bawer dikim min xevnerojkek dit" dibêjim û radibim ser xwe. Di-kim ku herim çend kulm av li ser çavên xwe bireşnîm ku xewê ji ser xwe bavêjim, zîla dêrî lêdikeve. Xortek li berdêrî hatina texsiya ku me xwes-tibû elam dike. Sekreter valêzê min heyâ ber texsiyê hildigre û ez hêdi hê-di ji pêlekanan berjêr dibim. Xatir ji sekreterê dixwazim û li kêleka ajovan rûdinêm.

Sekreter ya keja çavşîn, "Kekê Se-yit zutirê vege rin emê bêriya we bi-kin" dibêje û li pey min destê xwe ba-dike. Ez jê re beşevetêm û bêyî ku bersivê bidimê gilêya li zengloka min peyda bibe dikim ku daqultînim. Ez jî destê xwe jê re ba dikim çavên min sil dibin.

"Bi ku de kekê" dibeje ajovan. Ez bistekê bêdeng dimînim û pey re, "Tu çawa dixwazî, tenê min ji vî bajarî derxe bes e" dibêjim û bi tilya xwe aliyê rojhilat nîşan didim. Bêyî ku ajovan bibihîze ez di dilê xwe de ni-fira dawî di ser bajêr de dibarînim û em rê digrin.

Ey bajaro! Bila vege bi min bibe kirkirkêñ êzidiyan.

Ez di destê dile xwe de ketime arzarê û tenegezar im. Ez iro ketime berbayê dilê xwe yê dîn, nema dikarim xwe zeft bikim û min biryara koçeke bê kewran girtiye. Ezê xwe di oxira adarêñ bêhnbihuşt de bervaba bikim.

Bajarêñ ku ez lê dijîm jî her wekî dixwaze min pêkî pêste ji nav xwe bi-virvirîne û baveje. Herweki berdide min, min dide revê. Her kû ez çivan didime xwe ku xwe ji ber vê yekê bi-filitînim, lê tirseka ku ji mêt re bi min re destebiratiya xwe daniye, mezin dibe. Tırsa kû mérän bidev xwe digre ji kozikan derdixe û ûrtê lê diqeline. Belê tırs û rev. Du heval piştên hev. Mina cêwiyen zikekî. Bi hev re dizên, bi hev re mezîn dîbin û nepeniyêñ dilan de qıjrîpjîrî dileyîzin. Herdem li pey hev in. Yek ya din dibezine.

Tırsa min destebirake min e ji mejde. Me destebiratiya xwe di nava dû-kela kevirên kavîlbûyi de dani. Wê çaxê hê min di pêşa diya xwe de xev-nîn mexmer dipışirandin nav hepçûkan. He min bi tetikêñ xav hevokêñ şikestî dijenîn li ber hingilan. Dema ku ez ji ser reh û reçilêñ bav û kalêñ xwe hatim hilqetandin û penaberî mîna benîstekî bi eniya min ve zeliqî hillego bû. Gava min pê avete nava vî bajarî tırsî li min serî hilda û herkû çû mezin bû. Ez gelekî ji vî bajarî tırsiyam. Bajar di roja roj de li min hate hev û kir ku mîna hûtekî min daqurtîne. Tırsê li vî bajarî çirik li min bada. Ez xistime nava pencêñ xwe, dike ku min mîna dêwekî hûf bike. Ez, ez di nava qîlêñ wî de hatime dabarandin. Ji min re bûye motik, dûwa min bernade. Mîna teniya bi don û qîra bi sîr bi min ve zeliqiye. Ku de diçim li pey min e. Mîna borekê xwe li laşê min

walandiye. Tırsê êdi her aliyê laşê min qeperçe kiriye mîna dêwekî heft serî hergaw heft beraşen aşa li ser serê min ba dike. Li hêvî û heyecanêñ min tê xezebê. Hevî û peşeroja min bi qaqa reş asê dike. Dike ku şîrê zikma-ki ji firnikêñ min bipijîqîne. Heya wê rojê min xwe li ber wê bi awayekî ta kir; min xwe vir de wê de geh xapand, geh ragirt û geh ji têkçûm. Lê iro nema dikarim xwe ragirim, temla min êdî nemaye, êdî li min hatiye qiriqê û li ser serê min re davêje. Mîna merivê têkeve behrê û bi dêv here kefê min ji dev avêtiye revê. Ezê ji ber tırsa xwe û vî bajarî konê xwe bavejim û barbikim. Anglo birevim.

Wexta min ev biryara xwe di êva-reke westiyayî de eşkere kir, diya min ew salêñ reva me ya ji dewerên kam-baxbûyî bibîrxistin. Her çiqas ez ber ji dilê wê ve hatim jî lê belê wê guh nedâ min û dîsa dest bi kulama xwe ya ku tenê min pê dizanibû kir.

Belê deraxlêye ye û min karê xwe kiriye ku ji van penabergehan biqetim û careke din li pey xwe venegerim. Min biryar daye ku ji vî bajarê bêxêr li pey xwe kewkiyanbihêlim. Min dil heye ji vî bajarê bêhbehre durbike-vim ku tu kes li pey şope piyêñ min hêsiyêñ penaberiyê kom neke. Bila êdi zukê zuka min di guhê gundê min de bivelide. Bila êdi mîna berxê mijo serî carê li ber hingilekî navkutkî ne-bim. Bila di mexelê hogecê sitru şikestî, sitru bikşînim ber kerê, tenê bi-la rûyê vî bajarî bi min neyê kifşê. Rûyê vî bajarî li min ava hêvîr be, tevî rûyê hemû cure penabergehan.

Ji çûyîna min re çend deqe mane. Saetê min bi jimar in. Dilê min germ bûye, her ku diçe disincire. Dilê min

Rev

Mûsa Vazgalî

Deraxlêve ye. Zivistanê pel û potikên xwe bi dev xwe girtine û cehimi ye. Dor dora baharê ye. Dinya ne bi zor ê bi dor ê, bi dor ê. Anîha av diçilvile di binê rîçalên kulîkkan de. Kulîk ji rewer û bîhukan re dibisirin. Rewer û ruhber topası ji tavê daxwaza destûra dîlanekê dikin. Tav hê di destpêka demên xwe yên qizaniyê de ye; serê xwe di nava ewran re mîna keçikeke şermoke tele tel nîşan dide û dîsa vedikişe û xwe vedîşêre. Ax... av çûye binê guhe axê, dilê axê hildikute, di her aliyê wê de tiştekî serî rakiriye, dikin ku zikê wê bidirinîn. Ax vedikelişê; bi usûl, di nerma xwe de; ji qelîştekên zikê wê giyan dibijiqe. Bêhnek ji axê difûre. Bêhneke ku laşen pûç û rizyayî diliivîne. Bêhneke ku penabergehan şiyar dike û radike ser piyan, penapergehan şiyar dike û daweti dîlaneke bêşînor dike.

Belê dem bahar e. Bayek di nerma xwe de ji bakûrê dilê min bêhna adarekê giyanwer heya penabergeha mîn a genîbûyî jî hanî. Bayê adarê yê hênik porikên gihayêن palaxan dalêstin di zeviya dilê min î bêpirêze de. Dilê min bi vê bêhnê har û dîn bû. Di ciyê xwe de şek rabû. Hilkuta û ez bi xwe re rakirime helana.

Hemend ji bo ku cin e, xwedî sihr e. Dotmîrê dike neynik û dixe bêrîka xwe. Diçe malê, diya wî dibêje "Bêhna îns û cinsê xerîb ji te tê." Hemend ji diya xwe soz digre ku pê xirabî na-ke. Dotmîrê dixe şîklê wê yê keça ci-wan û li cem xwe dide runiştin.

Hemend ji diya xwe re dibêje ku "Ji Dotmîrê gelek hez dike." Malbatâ Hemend li ser rewşa Dotmîrê bi hevre dişêwirin û biryar didin ku Dotmîr jî bibe bûka cinan. Malbatên cinan da-wet çêdikin. Hemend ne tenê bi Dotmîrê re dizewice, divê bi çardeh keçen cin ên din re jî bizewice. Loma jî Hemend şeva dawetê çardeh keçen din dikuje û destê Dotmîrê digre û ji wir direvin, diciñ.

Piştê revê gelek tişt tê serê Hemend û Dotmîrê. reva wan ne hêsan e. Divê ji welatê cinan derkevin. Xaltiya Hemend li pey wan dikeve ku heyfê bistîne. Hemend dizane ku Xaltiya wî li dû wan e. Ew çiqas bixwazin jî, ji ber wê nikarin birevin. Loma jî, Hemend sihir dike. Ew sihir ci ye? Hemend bi sihrê xwe û Dotmîrê dike ci? Ev jî bila wek meraq bimîne.

Paşê ci dibe? Hemend xwe ji destê Xaltiya xwe xilas dike, lê dê karibe xwe ji destê Meta xwe û diya xwe xi-las bike? Her çiqas "Xaltiya Hemend cineka bijare ye jî, nikare xwe bigihî-ne hêz û şarezayıya Hemend." Lê, ge-lo Meta wî û diya wî?

Xaltî destvala vedigerê malê. Vêca Meta Hemend li dû wan dikeve. He-mend dîsa sihir dike, xwe û Dotmîrê dike şîklek din. (Ez vê sihrê û vê şîklî jî nabêjim.) bi vê hawayî, meta He-mend jî destvala vedigere malê. Êdî dor dora diya Hemend e.

Diya Hemend tinazê xwe bi wan

dike û dibêje "Ew dikare we bixapîne, lê ji destê min nafilite." Belê, xwen-devanên ezîz, gelo Hemend ji destê diya xwe bifilite yan na? Diya Hemend li pey wan dikeve. Hemend vê-ca ji dil saw digre, ditirise. Ew hêza diya xwe baş zane û dizane ku dê çi tofan li serê wan rabe. Diya wî dê xe-zeb li ser serê wan bivarîne.

Hemend vêca jî sihrek dike û xwe û Dotmîrê dixe çikleke din. Diya Hemend tê cem wan. Dik dizane ku ew herdu tişt Hemend û Dotmîr in. Diya Hemend wan nas dike. Bi wan re dia-xife.

Diya Hemend bi çavêن xwe ji he-vûdu hezkirina Hemend û Dotmîrê dibîne û hinek nerm dibe. Tu hêzek bi hêza evînê nikare. Diya Hemend vê dizane û loma jî bê ku wan bikuje, wan azad dike. Lê, diya Hemend her çiqas dev ji wan berdide, wan serbest dihêle jî, dema ji cem wan diçe, nifirek li Dotmîrê dike.

Wek tê zanîn, di nav kurdan de nifir wek kulturekî gelêrî û netewî, wek tradîsyonekî civakî berdewam dike. Di nav kurdan de gelek cure nifir he-ne. Herî pir jî jin nifiran dikin. (Xwe-ziya nivîskarekî kurd li ser nifirê kurdî pirtûkek amade bikirana, hemû nifirê kurdî berhev bikirana û di pirtûkek de biweşandana.)

Belê, diya Hemend jî nifir li Dotmîrê dike û piştê demeke Dotmîr jî ber nifira wê dikeve tengasiyê. Ev nifir ci ye? Dotmîr ji ber vê nifirê çawan xilas dibe? Bersîva vana di dawiya pirtûkê de hene. De bila ev jî wek me-raq bimîne ku xwendevan vê pirtûka bi navê "Hemend" ku ji alî nivîskar Aram Gernas ve hatiye nivîsîn, bixwî-nin.

na keça Mîr bê. Kalemêr van hersê şertan qebûl dike û vedigere malê.

Di mal de, kalemêr bi gîlî û gazin hersê şertên Mîr ji marî re dibêje. Kalemêr ji marî re dibêje "Tiştên ku hatine xwestin ne karê eqilan in û tu car nayêñ bi cîh anîn." Mar jî bersîva wî dide û dibêje "Şertên ku Mîr daye ber te û tiştên ku hatine xwestin ji niha ve amade ne."

Roja din, kalemêr van hersê tiştên ku Mîr xwestiye hildigre û diçe qesra Mîr. (Ji bo ku ez xwendevanan di meraqê de bihêlim û wan teşwîqê xwendina pirtûka "Hemend" bikim, min behsa ku kalemêr û marî van tiştan çawan peyda dikan, anku çawan bi dest dixin, nekir.)

Belê, kalemêrê bavê marî diçe hizûra Mîr. Ew tiştên ku jê hatine xwestin datîne pêşberê Mîr û dîwana wî. Ji bo ku hersê şertên Mîr hatine cîh, Mîr li ser soza xwe dimîne û keça xwe di de kalemêr ku ji kurê xwe re bibe.

Kalemêr keçikê dibe malê. Keçikê hêj yê ku dê pê re bizewice nedîtiye. Dibe êvar. Keçik di odeya xwe de li benda zava ye. Mar tê dikeve hundir. Keçik wî dibîne û ditirise. Mar jê re dibêje "Dotmîra delal rûne, metirse!" Lê, keçik dîsa jî ditirise. Mar pê re di axife, dibêje "Navê min Hemend e... Ji bo ku tu min di şîklê însan de bibînî, ez ê sê şertan bidim ber te."

Keçik anku Dotmîr şertên Hemend qebûl dike. Hemend kirâsê mar ji xwe davêje û xwe dike xortekî bedew û spehî. Hemend û Dotmîr bi hevre şâ dibin. Lê, niha dora ceribandina bi cîh anîna şertên Hemend e. Divê Dotmîr hersê şertên Hemend bi cîh bîne.

Dotmîr şertê yekem ê Hemend bi

cîh tîne. (Ji bo ku xwendevanan di meraqê de bihêlim, ev şert ci ne? Min negot. Divê her xwendevanê kurd vê berherma hêja bixwîne ku bizanibe ew şert jî ci ne?) Hemend -ji ber ku Dotmîrê şertê wî yê yekem hanî cîh - eniya Dotmîrê radimîse û şertê xwe yê duyem davêje ber. Dotmîr şertê Hemend ê duyem jî tîne cîh. Dimîne şertekî. Heger Dotmîr vê şertî jî bîne cîh, êdî Hemend dê bikeve çiklê xortekî û êdî nema bibe mar. Lê heger Dotmîr vê şertî neyne cîh, dê Hemend bibe mar û wenda bibe, biçe.

Lê, ci heyf, Dotmîr vê şertê sêyem naynê cîh. Hemend wenda dibe, diçe. Dotmîr korpoşmanî vedigere mala bavê xwe. Dotmîr ji diya xwe re dibêje ku "Mêrê wê, anku Hemend wenda bûye û dixwaze biçe lê bigere."

Dotmîr bi serê rê û dirban dikeve, bi çiya û çolan dikeve, li evîndarê xwe digere. Ew di vê lêgerîna xwe de tî û birçî dimîne, ji hal dikeve, lê di heşê wê de tim Hemend heye. Di pêvajoya vê lêgerînê de sal û demsal derbas dibin, li ciheke dûr, Dotmîr şopa Hemend dibîne. Lê, dê xwe çawan bigihişîne cem?

Dotmîr li ser kaniyê, ji keçikan fêr dibe ku ew şev daweta Hemend heye. Keçikek hatiye ser kaniyê ku av ji Hemend re bibe. Dotmîr bi dizîka gustîlka tiliya xwe derdixe û dixe nav mesîna avê.

Hemend cin e. Gustîlka di nav avê de dibîne û diçe cem Dotmîrê. Hevûdu dibînin. Dotmîr jê re dibêje "Piştê ku tu ji ber çavên min wenda bûyi, min têderxist ku çiqas ji te hez dikim. Û waye tu dibîni ku şaşıya min ci anî serê min û ez bi salan li du te geran-dim."

bang"ê de û di redaksiyona kovara "Roja Nû" de jî xebitiye. Gelek nivîsên wî jî di rojnameya "Azadî", "Dengê Azadî", "Hêvî", "Roja Teze" û di "Dema Nû" de hatine weşandin.

Aram Gernas, di van demêna da-wîn de, bi navê "Hemend" pirtûkek weşand. Ez dixwazim vê pirtûkî bi xwendevanê kurd bidim danasînê.

Hemend çirokek antîk e. Di nav civaka kurd de gelek çîrokên bi vî şê-weyî bi devkî têne gotin. Çîrokên weha xweş û edebî heger neyên nivîsîn, piştê demeke têن jibîr kirin, wenda dibin diçin. Nivîsîna çîrokên edebiyata devkî a kurdan kareke hêja ye û bi afirandina berhemên weha, edebiyata kurdî a nivîskî dewlemend dibe. Aram Gernas gelek baş kiriye ku vê çîroka antîk a gelêrî nivîsiye.

Wî bi nivîsîna vê çîroka antîk kîraseke nû lê kiriye, rengeke xweş da-ye pê. Çîroka Hemend bi hêsanî, lê bi meraq tê xwendin. Wêneyên di pirtûkê de ne, ji alî wênevan Arîf Sevînç ve hatine çêkirin. Wêneyên gelek xweşik in û hemû wêne li gor naveroka çîrokê hatine nexşandin. Bergê pirtûka Hemend jî gelek xweşik e, bi rengîn e.

Form û teknîka nivîsîna çîroka Hemend gelek baş e. Çîrok bi zimanekî herîkbar, li gor şêweya qalkirina çîrokên gelêrî hatiye pêkanîn. Bûyerîn çîrokê bi westaşî li hevûdu hatine hûnandin. Zimanê wî jî, vekirî, zelal û herîkbar e, zimanekî edebî ê çîrok-bêjiyê ye.

Naveroka çîrokê balkêş e û manedar e. Mîr û jineka navsalîn hene, ji wan re zarok çê nabe. Ew dixwazin ku ji wan re ewladek çê bibe û pê nesla xwe bidomînin. Di demek de mi-

radê wan tê cih û jinik hemîle dibe. Dema jinik diwelide, jê re zarokek çê dibe lê ev zarok mar e. Ev mar marekî ku wek însanan diaxifê ye.

Rojek mar ji bavê xwe re dibêje "Here qîza Mîr ji min re bixwaze." Bavê marî her çiqas naxwaze biçe keça Mîr bixwaze jî, kurê wî, anku mar wî mecbûr dike ku biçe keça Mîr bixwaze.

Dema bavê marî diçe hizûra Mîr û keça wî dixwaze, Mîr aciz dibe û fermanın dide leşkeran ku wî bigrin û serê wî jê bikin. Lê şêwirmendekî Mîr midaxele dike, nahêle ku wî bikujin. Li ser daxwaza şêwirmend, Mîr mîrik efû dike û serbest berdide.


Mîrik vedigere malê. Mar jê re dibêje "Ez dizanim ci bi serê te de hat. Lê, divê tu dîsa biçî bicerbînî û keça Mîr ji min re bixwazî." Mîrik her çiqas di berxwe de dide, dibêje "Mîr dê serê min jê bike." Lê feyde nade, mecbûr dimîne carek din diçe hizûra Mîr.

Mîrik ji bêçaretiyê carek din daxwaza kurê xwe pêşkêşê Mîr dike. Mîr dîsa dixwaze ku serê wî jê bike, lê vêca jî şêwirmendekî ku di dîwana Mîr de ye, dibêje "Em wî nekujin, wisa xuyaye ku kalemîr xwedî sirenî ye û pişta wî qewî ye.... Bihêle em hin şertan bavêjin ber. Heger bi cîh hanî bila bijî, na eger bi cîh neanî em ê wî bidin destê celadan!.."

Mîr sê şertên gelek zor û zehmet davêje ber. Şertê yekem; xaliyekê ji salona mezin a qesra Mîr re bîne ku temamiya salonê bigre. Şertê duyem; weşiyek tirî bîne ku têrî hemû xulam, qewraq, leşker û kesen qesrê bike. Şertê sêyem; di nava qalîqê gûzê de qatek cilê bûkîtiyê bîne ku tam li bej-

Hemend

(Çîrokek kurdî ya antîk)



Lokman Polat

aram Gernas kedkarê çand, edebiyat, huner û muzîka kurdî ye. Wî di van hêlan de xebatên gelek hêja kiriye û niha jî dike. Ji bo zarokên kurd bi navê "Baxçeyê Zarokan" du pirtûkên muzîkê bi meqam û noteyan ve amade kir û weşand.

Ji bo ku şanoya kurdî a nivîskî qels e, wî di vê hêlê de jî xebat kir û ji ber çîroka "Zembîfiroş" şanoyek nivîsî. Aram Gernas di hêla wergerê de jî wergerêkî jîr e. Gelek wergerên wî di kovara "Roja Nû" de derketin. Wî pirtûkeke zarokan, pirtûka "Şervanê Biçûk" ê Vietnamî jî wergerand û wek pirtûk hate weşandin. Wî du pirtûkên westayê peyy û hevokan, nivîskarê bi navûdeng Shakespeare jî wergerandiye û ev herdu pirtûk (Romeo û Juliet - Othello) li ber çapê ne. Wî romanekê Mâksîm Gorķî, pirtûkek Jack London, romana nivîskarê ermenî Haraçyan -ku navê romanê "Bêrî" ye- û pirtûka helbestan a Ahmed Arîf jî wergerandiye kurdî.

Aram Gernas romanekê bi kurdî jî nivîsiye û niha ji bo çapê amade dike. Wî karê weşanvaniyê jî kiriye û demek di redaksiyona kovara komeleya nivîskarên kurd li Swêdê "Çira" de, di kovara federasyona komeleyên Kurdistanê li Swêdê "Ber-

*Em jî wan dera
ketibûn
Me nizanbû kuye, ku?*

*P. Paîz
Zer xwedikin çiya,
banî
Dikewgirin cew-kanî,
Kerî-sûrî têne gund
Sivre tijî temê rind.*

*Îdî qawin û zebes,
Mîna xûne, dendikres,
Sêv, şivtele, hurmiyê
nar,
Gûşiyê tiriya û hinar.*

*Gundê mera têr-tije
Paîz usa tê-diçe.*

*P.' P'işik
Pişik û mişk bûne
heval,
Bûne qewmê heve
helal,
Tev diçin-tên, veduxun
tev,
Paşla hevda radizên
şev,
Hev arxayîn, hev hev
hebandî
Bi pizmamtiya kal
bavaye,
Nav salada ceribandî.
Paşê emîş hildidin şâ,
Diçne mala seyê bira,
Hevra qurban, hevra
heyran,
Tev şas mane-
pizmamtiya wan.
Eva rokê dîk gilî kir,*

*Nizam we jî jê bawar
kir?
R'. R' ûvî
Rûvî rabû û revî
Rêça wî ser berfê ma,
Reşo da tivingê
Rêçeda çû berbi çiya.
Çiyada hezar rez û rê,
Hezar reng û rewir,
Reşo nava gelyada
Rêça rûvî unda kir.
Û êvare rût û-tût
Bê risq, nêçîr-nava
çiya,
Reşoyê me
por-poşman
Bi loqe-loq vege riya.
S. Sêv
Divên ev dara
Kalko nikandiye,
Têra mala me
Sêv lê stendye.
Dara kêlekê
Bavo nikandiye,
Têra gundê me
Sêv wî stendiye.
Were ez tu jî
Van binikînin,
Ku têra dinê
Sêva bistînin.
X. Xebat
Kalkê min divê:
Xebat xêr, bêre,
Kê naxebite
Ewî bêkêr e.
Xebatê hizke*

*Bê minet bî tê,
Xebatçiyê xwe be
Hizkiriyyê xelqê.
H. Hîv
Tûlekî ewte-ewte,
Vî alî-wî alî diewte,
Nabêjî vê evarê
Wî li ezmîn hîv dîtye.
Û. Ûrisî
Kalkê min digot:
"Kê ûrisî nizane,
Bizanbe lap nezan e,
Bi zimanê ûrisî
Tê bighîjî her pirsî.
Ew zimanê Lenîn e,
Hînbe lao ûrisî,
Bi zimanê ûrisî
Tê dinyayê bihesî".
Ç. Çâîr
Çarnikalê gundê me
Çâîr-çîmanîn,
Bihatarê gelî
Fêzê zozanin.
Çâîr biharê
Dibne xalîce,
Tebyet gundê me
Rengada dipêce.
Ç'. Ç'ivik
Çivîkê çive-çive,
Qırş û qala top dike,
Berbi hêlîna xwe dive.
Hêlîna xwe dihûne,
Qey tê bêjî merivê...
Çivîkê, çive-çive..*

*Werger ji tîpêñ kîrîlî:
Serdar Dicle*

Z. Zivstan

*Zozan, zevî qerqaş bûn,
Bin berfêda xweş razan,
Zerê, Zoro û Zînê
Hildan xizik û lekan.
Kirne gazî can, hey can
Zivstane, zivstan.*

K. Kokil

*Kokil
Kevir kir kewkanî,
Û kewkî kewê kir,
Kew firî ser kon danî
Dilê Kokil pey xwe bir.*

*Kuçekî din kewkî kir,
Lê kuç sela keşka ket,
Û xuşna keşkara
Kevanya hêrs kon derket.*

*Kokil tirsa hîşt, revya,
Kew jî ser kon dikenya.*

K'. K'eskeler

*K'awa biçûk banzda malê,
Ecêbmayî gote xalê,
-Xalo hela nexwekî çâ
Xwe avîtye pêşîra çiya.
-K' aw-kubara mine porşor,
K'eskeler, ew k'eskeler.*

L. Legleg

*Lodê berfa sare qerqaş
Bûne leyî, kişiyan çûn,
Laçik-libsê mij dûmanê
Nizam kuda unda bûn.*

*Legleg dîsa şâ vegerya
Ser hêlîna xwe danî,
Bi perê xwe wê letîfê
Ev bhara xweş anî.*

M. Moskva

Mezin bûm ezê

Herme Moskvaê.

*Kalkê min divê:
Moskvaye
Dilê dinyaê.*

*Divê rind hîn be,
Bibe yekî çê,
Ku laîq be, lao
Çûyîna te li wê!*

N. Neme

*Nazê neme nivîsî
Nena pîrka xwera şand,
Têda şîklê Elîbê
Bi qeleme reng kîsand.*

*Binda jî herf rêzkir wê
Ji "A" girtî heta "N"-
Usa hema xilaz kir
Naza biçûk nema xwe.*

O. Obe

*Oba me nafa çiyê ye,
Hezar nexş-nîgar lê ye,
Dorê mêrg û çîmanin,
Guhêr, gom, mozilaganin,
Binatarê gelî ye,
Bi cew û kanî ye,
Zinar mîna tevan,
Mîna fil û devan e.*

*Oba me pala çiyê ye,
Hezar reng-ewaz lê ye.*

U. u

*Pişikê unda kiribû
Berçevka xwe
Û mişk digerya,
Mişk unda kiribû
Riya qula xwe
Nikaribû vegerya...*

*Ketibû nava herfa,
Hildabû herfa "u"*

ESKERÊ BOYÎK

ELIFBA

A. Aş

*Aşê me, aşê tokê,
Arwanê salê dhêre rokê,
Aşvan apê Ahmed e,
Camerekî comerd e.
Arwan dike dewla aş
Jê tê arê çûl-qerqaş.*

B. Berxik

*Berxika Bedir xezal e,
Bedew nazik delale,
Xilfike-qer, belek e,
Ustyê wê da xeleg e,
Nav karada ew yek e.*

V. Vêrgûl

*Ez vêrgûlim, vêrgûlim,
Niqitkeke zef hûrim,
Vediqetînim berekê
Fikirê her cumlekê.*

*Ü her xeber aqil tê,
Ciyê xweda ker rûdine,
Bi min rehet dixûnin,
Lê, min jî qe bîr naynin...*

G. Gulan

*Gulane, wê gelî-geboz
Girme-girmin, gaze-gaz,
Cewik mîna hespek boz
Firqas dike wê hevraz.*

*Gevez û şîn xwe kirine.
Ger û gêdûk, girê ciyê,
Şîlanê reng kulîlk dane
Rabe, bira merin wê.*

D. Dîk

*Dîk hisyar bû
Ji xwe razî,
Rabû ser ban
Kire gazî...*

Qure, qutan

*Gote qazê:
-Na, ez nîbim
Dinyayê ha,
Xwera razê.*

Elîfba

*Elîfba xwe temamî
Ez zanimê ezberî,
Dersdara me, herf bi herf
Ber min vekir ew derî.*

Ezê naха bixûnim

*Kitêb, defter, destana,
Wekî mîna Gagarîn
Bifirime rûyê ezmana.*

E'. E'rs

*E'rşgera wê e'rş û e'zman
Xwera îro kirye meydan,
Ez jî rabim E'-yê xwe syarbim
Bajom herme li wan mîvan.*

J. Jijû

*Jiwû çêjik tîmar kir
Go: -çi xweşe, hermûşe,
Mer go jana derziyê we
Ax, qe bîra min naçe.*

Gotinêن Pêşîyan

Amadekar: Ahmed Cînar

- * Berxê çê li ber kozê kifşe.
- * Ku beranê biskobûya wê tevî pezê bavo bûya .
- * Şênahiya gunda di berayiya riyan de kîfş e.
- * Kaniya esîl nabe mesîl.
- * Neyarê bavan nabin dostên lawan.
- * Du bira neçin gura.
- * Li zikê min dixe piştä min dêşê.
- * Mala barkir ê min, derziya min li serê min e.
- * Şêr dibê ku gerêdana min bi rovî be berdana min bi mişk be, delîl li halê min be.
- * Şûjina ber çevênen xwe nabîne derzîya ber çevê xelqê dibîne.
- * Ku tu ketiyê ha çokkî ha navkî ha qırıkkî.
- * Derba li hevala tîra li kendala.
- * Çave li deriya xwelî li serîya.
- * Heye pirani ye tuneye mirtivi ye.
- * Ya ezê xwe li têrek mewîj xim, ya xwe li kelemekî tûj xim.
- * Mala li kerkî salê li derekî.
- * Bila avis be, bila dereng be.

Têderxistinok

- 1- Qevdik pûş lî ber kevirê tûj.
- 2- Hîva lî Axurê.
- 3- Radikim qemçê dev jî hev ve-dibe.
- 4- Sê bira li hev dinhêrin.
- 5- Teyare xweş teyare çibikim se-rê wê dar e.
- 6- Kalik hat ji deştê tewalek dî-rî(stri) li piştê.
- 7- Çûm odekî cil tax cil miştax cil ortax.
- 8- Bizina reng hinar bazda zinar.
- 9- Tiştikî min heye dirêje dîrêje heya mala derwêş.
- 10- Her gemo mer gemo bi şev û bi ro li ber çemo.
- 11- Ji tetik teniktir e ji kêran ze-ximtir e.
- 12- Ez çûm nava delkî, tê qêrîna darekî.
- 13- Dara li nav dara sor dike jî guhara
- 14- Digere digere rêç tune di fetile fetile toz û dûman tune.
- 15- Penc bira hene du bira tavê dîbînin sê bira nabînin.

Amadekar: Metîn Yıldız

- 1- Sîmel
- 2- Çavén Ga
- 3- Medes
- 4- Küçük
- 5- Wêris u hegû
- 6- Juji
- 7- Hîmar
- 8- Şîhor
- 9- Hûr u rûvi
- 10- Sîtil
- 11- Dewkul
- 12- Bilur
- 13- Darra tewyie
- 14- Seart
- 15- Lîmîş

wî-Xanê gelekî hati bû guhastinê û ewî pêşiyê ew nas nekir. Gava ew ber derê mala diya xwe sekinî, kulfetek ber derî bû. Evdo ji hespê peya bû û ewê ew tekîlîfî malê kir. Ewê gote bûka xwe, Werdê, wekî sapogê mêvan bêxe û here bêje mîrê xwe - Omer, bira bê, wekî mêvanekî ermenî hatiye mala wan. Gava Werdê sapogê Evdo ji lingê wî existin û çû, ewî ew jina, ku malê da pêşberî wî sekinî bû, jê pirsî:

--Lê kanê Xanê? - Ewê got ku Xanê ew bi xwexaye. Evdo usa jî jê pirsî, wekî kurê wê Elo ci dike? Gelô ew zewiciye, zarê wî hene? Xanê got, wekî Elo cem birê wêye, gundê Camûşvana mezinda şivantiyê dike, hela nezewiciye. Ewî xeberdana xwe kuta nekir û ji wê pirsî, wekî kurê wê -Evdo li kuye? Gava ewê ew yekabihîst, bû xule-xula hesira ji çavê wê jorda hatne xarê. Hema wî çaxî kurê Xanê-Omer derda hat. Gava ewî dît, ku diya wî digirî, ewî bi hêrs li mêvan hilat û destxweda pirsî, wekî ew ci dixweze û çima rûyê wîda diya wî digirî?

Evdo keniya û gote Omer, wekî ew rûne. Evdo tewaqekir, wekî Xanê wîra avê bîne. Ewê av da wî. Gava ewî ji destê diya xwe tasa avê hilda, destê wî ricîfî û av rijya ser ciyê ku lê rûnisti bû, ew ji ciyê xwe ra bû û diya xwe hemêz kir û ramûsa. Omer û Werdê çavê hev nêhrîn û nizani-bûn ci bigotana. Evdo usa jî nêzîkî Omer bû, ew hemêz kir ramûsa:

--Birê min, birê min, ez qurbana tebim. Gava Xanê ev xeberêd hana bîhîst, xeriqî û ket. Cînar hatin û mala Xanê da tijî bûn, av reşandine ser

çavê wê û ew xweva hat, nêzîkî Evdo, kurê xweyî undakirî bû û ramûsa. Pez şerjekirin, xarin hazirkirin û hetanî êvara dereng kêf kirin.

Sibetirê birê Evdo, Elo jî ji Camûşvana mezin hat. Du roja vira man. Evdo temamiya serhatiya xwe wan ra şirovekir. Roja sisiya Xanê, Evdo, Elo çûne gundê wan, mala Nado. Vira jî gund-gundîtî hatne çavronkaya wan bona dîtina Evdo. Bira şêx û pîr pêhesîan, wekî Evdo hînî xwendinê bûye û eva yeka wa-na xweş nehat. Ewana destpêkirin derheqa Evdo da nava gundiya da giliyê xirab bela kirin, wekî ewî xwendiye, ji dînê xwe derketiye, gotî wan tiliyê destê wî rastê ber da jêkin, bi kîjana ew dinvîse. Çawa gelek gûndiyêd gundê wan-Camûşvanê, usa jî gûndiyêd gundê cînar dihatne bal Evdo, ku ew wanra erza nema binvîse. Ne axir wî çaxî bawer bikî gund-gundîtî nexwendî bûn. Ewana ji Evdo gelekî razî diman. Bona wê xebata Evdoyê baş, ku ewî nava gûndiyêd xweye nexwendî da û ne ku tenê gundê Camûşvana mezin da, dikir, ji aliyê gûbernatorê Êrêvanê da ew bi pesinnemêva hate rewakirinê. Cimaetê wî ra digotin, "Evdoyê pîsir". Lê ruhaniyê rînedida wî. Derheqa wîda gelekî xirab xeberdidan. Ew yekê Evdo gelekî nerihet dikir. Ew gundê xwe da zewicî û çend sala şûn da destê jin û zarê xwe girt û çû bajarê Gurcistanê-Tîbilisiyê. Zarongêd xwe da ber xwendinê. Ew jî mînanî bavê xwe bûne merivne xwendî.

* Werger ji tîpêñ Kîrîlî:
Serdar Dîcle

yizê ew dane mektebê. Timê guhê keşîş ser xwendina wan bû, diçû mektebê û pirs dikir, çika ew çawa hîn dibin. Carna ew dibirine mektebê û ji mektebê danîne malê. A bi wî te-herî Evdo bûbû kurê Vardan Ter-Mxitaryanê keşîş. Evdo û Avetîs bi zimanê ermenî gîmnaziya bi açixî kuta kirin.

Keşîş teslîmî faytonçiyê xwe - Serob kiribû, wekî ew Evdo û Avetîs hînî wê yekê bike, ku ew karibin hespê bajon. Bona wê yekê ewî her yekî ra hespek kiri. Çawa idî jorê hate kivşkirinê, wekî keşîş tu firqî nedikire orta kurê xwe-Avetîs û Evdo. Evdo ji Avetîs çêtir hesp dajot. Ew gelekî serxwe û jîr bû. Gava hev ra diketne qoşê, Evdo pêşîya gişka diket.

Raste, idî gelek wext bû, ku Evdo mala keşîş da dima, lê ewî zimanê xweyî dê bîr nekiri bû. Gava ewî bajêr da kurmanc didîtin, wan ra xeber dida. Keşîş zani bû, wekî ew rastî kurmanca tê, wan ra xeber dide, lê xatirê Evdo nediket. Salekê pey kutakirina gîmnazîyâra keşîş Avetîs û Evdo birne bajarê Petrogradê (nuha Leningrad) û ew semînara ruhaniyê da dane hildanê. Bira bi zimanê ûrisî sê sala hîn bûn. Hewa Petrogradê pak wan nedihat, xrab hukumî ser cansagiya wan dikir. Ew vege riyan û hatne Aleksandropolê.

Evdo idî zulam bû, bîst salî bû, rû û simêlê wî hati bûn. Ew bejnê da ewqasî blind nîbû, lê bedew bû. Geleka xwezila xwe bejin û bala wî ya bedew danîn. Gava ew syar dibû, meriv lê-lê bû wî binheriya. Lê Avetîs tiji bû, mînanî Evdo serxwe nîbû.

Keşîş û jina wî idî epêce emr kîribûn. Cariya wan, jina faytonçî Serbo-Sato mir. Idî her tiş mînanî berê nîbû. Keşîş timê digot, wekî ezê hebûna xwê orta herdu kurê xwe da parevekim. Lê çawa nebe, dîsa Evdo kurê wanî helal nîbû. Ewqasî, mînanî kurê xwe Avetîs guh nedida Evdo. Mala wane Camûşvana mezin, heval û hogirê wî ji bîra wî nedîcûn. Mîla wî ser ciyê wî ye azrotiyê bû. Mûkûriya diya xwe, Xanê û birê xwe Elo dikir, gelekî dixwest ew bidîtana. Carekê jî idî dilê Evdo temûl nedî, hate cem keşîş û ji wî tewaqekir, ku ew ïzana wî bide, ku sê roja here wî gundî, ji ku ewî ew anîbû. Ewî got, ku ewê here û dîsa vegere bê. Gava keşîş ev yeka ji Evdobihîst, gelekî ber xwe ket, kelogirî bû. Ewî Evdo nihîrî û bi dilekî kul birîn got:

-- Ez ïzna te didim, here lao, - Evdo rind fem kir, wekî çiqas çetine keşîş ra, ku ew diçe. Ew hinekî melûl bû û paşê çû kîleka wî rûnişt û bi dilovanî got:

-- Bavo, ez zanim te ra çetine, ku ez diçim, dilê te bona min dêse, lê ezê vege riym û bêm. Gava ewî keşîş da bawerkirinê, wekî ew terka wî na-de, ewî Evdo ramûsa û got:

-- Lao, tu bi şîrê xwe, me tu mezin kirî, xwendin daye te. Idî tu zanî.

Pey wan xebera ra anî kincê baş Evdo kir, pere û hesp dayê û rîvekir. Berî hîngê keşîş Evdo ra goti bû, wekî kura here gundê xwe Camûşvana mezin. Evdo rîket û zûtirekê gihişte gund. Pêşiyê çû gundê Pambê, li ku bû diya wî û paşê çû mala xalê xwe, Nado, ku li Camûşvana mezin bû. Nava deh-donzdeh sala da diya

Lê keşîş orta merivêd berevbûyî da rûnişti bû, kurê wî ser çoka wî bû. Kincê wî û Evdo mînanî hev bûn, ji kinca girtî hetanî midasa û gora. Rastî ji, herdu zaro ne ku tenê bi ri-halê xwe, lê bi bejin û bal, sfetê xweva mînanî hev bûn. Gelek usa jî difîkirîn, wekî dibe ku bona wê yekê ji keşîş ev xwe ra anîye û kiriye kurê du da. Ewî usa jî digot, wekî Evdo kurê wî yî du daye û izna tu kesî tune xatirê wî keve.

Wî çaxî jina keşîş ji ciyê xwe ra bû û Evdo yê biçûk ramûsa. Wê şûn da herdu zaro birine bal hev. Ewana hev hemêz kirin, çûne dest û rûyê hev. Te qey digot birê helalin û zû da hev nedîtine. Jina keşîş her du zaro hemêz kir, ramûsa, giriya, cariya wê jî kelogirî bû, ji cêva xwe dezmal derxist û pê wê çavê xwe zaha kir.

Keşîş merivekî dewletî bû, avayê wî da 6 otax hebûn. Ewî emr kir, wekî bona herdu zara otaxekê başqekin. Ewî gazî cariyê kir, wekî otaxê da her tişt bêne danînê. Carî ku tividarekdîtina şîvîva mijûl bû, destxweda çû, wekî her tiştî otaxê da dayne: kerevat, nivîn, texte, rûniştok û hûr-mûrêd mayîn.

Navê kurê keşîş Avêtîs bû. Evdo hela wextê gundê xwe da bû, cara li deşte zarê wan gundêd ermeniya, ku cînarê gundê wan-Camûşvana mezin bûn, dilîstin, pirî-hindikî hînî xeberêd ermenî bû bû, wextê teşte, yanê jî fravînê, keşîş û kulfeta wî her du zaro kêleka hev di dane rûnişstandinê, wanra tiştêd hewaskar şirove dikirin. Avêtîs û Evdo zû hînî hev du bûn. Gava her sibe kincê wan herdu zara lêdikirin, ser û çavê wan dişûştin û

danîne bal keşîş, ewî ew kêleka xwe didane rûnişstandinê û wan ra derheqa wê yekê dâ şirove dikir, wekî heyş sala pêş da wîra du kur bûn (cêwî), kurekî wî yî sê salî dizîn, birin û, wekî pênc sala wî kurê xwe digeriya û ew gundekî kurda da dît. Ewî timê digot, wekî Avêtîs û Evdo birê heve helalin, temê dê û bavekêne, gotî ji hev neqetin, timê hev ra bin, tevayî bilîzin. Çaxê kulfeta keşîş derheqa kurê xweyî undakirî da dibihîst, xule-xula hespa bû ji çavê wê dihatne xarê. Ewê timê digote kurêd xwe, wekî sivderâ xanî da bilîzin, ji hevdu neqetin. Gava Evdo idî mezin bû, pê hesiya, wekî rastî ji kurekî keşîş di zîbûn û ew kurê wî yî helal nîne. Evdo usa texmîn dikir, wekî ji kêderê ew anîne û kurê kî ye, bavê wî qaçaxa kuştine, diya wî saxe û kîjan gundîda mîr kiriye. Ewî usa jî ew yeka zanibû, wekî birê wî heye, navê wî Eloye, cem xalê wane. Lê nenihêrî wê yekê, ewî nexwest ji mala keşîş here, çimkî vira ew pak dihate xweykirinê. Xên ji wê yekê ewî zani bû, gava ku ew vegere gund, xalê wî wî bişîne ber pêz. Cariya malê ji Evdo û kurê keşîş nediqetiya, timê rex wan bû. Sal hatin û derbaz bûn. Evdo idî hînî mala keşîş, kurê wî Avêtîs bû bû.

Merivekî ne ewqas kal û ne ewqas jî cahil hate mala keşîş. Ew wî çaxî dihat, gava zara idî taştê dixarin. Dê xarin dida wan. Pey taştê ra ewê zaro dibire otaxa zara. Wî çaxî ew mîrik dihat, xwe ra kagez danîn. Paşê Evdo pê hesya, wekî ew dersare, wê dersê bide wan. Evdo û Avêtîs weke hev hîn di bûn. Paşê pa-

Xanê qirar kir, wekî here gundê Pamba kurda (nuha Sîpan), ku 3-4 kîlometra nêzîkî gundê Camûşvana mezin bû. Vira xizmê wê hebûn. Zû-tirekê kurê du da jî kete destê wê. Navê wî danîn Elo. Xanê hê tere can bû, nêta wê ya mîrkirinê he bû. Îlahî, wekî birê wê Nadoyê Ûso (ew gundê Camûşvanê da dima) xweykirina Evdo û Elo hilda ser xwe. Gava pey kuştina mîr ra du sal derbaz bûn, ewê gundê Pamba kurda da mîr kir. Navê mîrê wê yî du da Çeto bû.

Dibêjin, wekî zaro aliyê dê da êtim dibin. Evdo û Elo gelekî mukuriya diya xwe dikirin. Xule-xula hê-sira bûn ji çavê herdu tifala jorda di-hatine xarê. Timê çavê wan li riya orta gundê Camûşvana mezin û Pamba kurda bû.

Sal hatin û derbaz bûn. Evdo idî heyşt salî bû, fember bû, dor û berê xwe nas dikirin, pakî û xirabî ji hev cuda dikir. Xalê wî-Nado, dixwest ew bikira dûajo, biçuya ber keriyê pêz.

Rojekê baharêye xweş bû. Gelî û guhêr, deşt û zozanê çiyayê Elegezê ji xewa zivistanê hişyar bûbûn. Baraneke hûr-hûr dibarî. Evdoyê biçûk derketi bû ser rê, hizreta dê dil da. Çilkê baranê ji porê wî ser eniya wî ye kever da jor da dihatine xarê. Kelogirî çavê wî rê bû, gelo dibe ku diya wî wê ra derbaz be, çavê wî dayika wî keve, wê têr bibîne û ramûse.

Hema wê demê faytonek riya navâ gundê wan ra derbaz dibe, merivê faytonê da rûniştî li wê zara, ku ser rê xwe qincilî hev kiribû, nihêrî, gunê wî lê hat û qirar kir, wekî wê zarê xwe ra bibe mala xwe. Tu ne-

bêjî ew meriv keşîşê bajarê Aleksandropolê (niha Lenînakan) bû. Ewî Evdo anî kîleka xwe da rûniştandinê, nanê leweş û goşte mirîşka ji xurca xwe derxist û raberî zarê kir. Fayton rêket û berbi Aleksandropolê çû. Zara feqîr nizanibû, wekî wî ku-da dîbin? Ewî hey nan dixwer û hey li merivê ku ew kîleka xwe da bû rûniştandinê, dinihêrî. Keşîş Evdo gelekî begem kir. Gelek wext derbaz ne bû, gava fayton gihîşte bajêr û hat ber derikî sekinî. Keşîş destxwe da gazi jineke cahil kir û got: - Hanê vê zarê bibe, avê lêke, kincê wî biguhêze, porê serê wî hilîne. Ewî usa jî gote cariya xwe, wekî tu kes, hetanî neferê malê jî gerekê haj anîna zarê tunebin.

Ewê destxwe da zaro ji faytonê peya kir û ew bire hewşê, li ku gerrekê av lêkira, kincê wî bi da guha-stinê. Berî wê yekê xwarin dane wî. Gelek wext derbaz nebû, gava delak hat û porê serê wî hilda, paşê teşta darîn anîn, serê wî şuştin, kincê temîz lêkiran. Ew gişk bona Evdo mînanî xewnê bû. Pay wê yekê ra cariyê çû û gote malxê malê, zaro şuştin û veşuştîye, kincê wî guhastine. Ewî gote wê, ku zarê bîne cem wan. Gava çavê Evdo otaxêd bedewe demûezgekirî ket, wê demê mala wane li gunde mînanî holika kete bîra wî, ew zendegirtî ma. Bira qasî deh meriva ne ku ser erdê, çawa gundê wan, lê ser kursiyê bedew rûniştî bûn. Ba-werpikî hemû jî merîne sere bûn. Gava Evdo der da anîn, yêd ku ota-xê da rûniştî bûn, wî dinhêrîn, îlahî, jina keşîş. Ewê bi heyr û hijmekar wî tifalî dinhêrî.

Şenol'da, Şerhatiye'yi çok sevmiyordu. Bu iki arkadaşın birbirlerini sevmesini çok seviyordu. Bir gün Şerhatiye'yi bir arkadaşının evinde buldu. Şerhatiye'yi çok sevmeyen bu arkadaş, Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu. Bu arkadaşın evinde bulunan Şerhatiye'yi biraz da sevmiyordu.

SERHATIYA EMREKÎ *

b avê Evdo-Mistoyê Miho şivanê gundê Camûşvana mezin (nuha gundê Elegezê, nehiya Aragasê) bû. Gund da wî hiz dikirin, çimkî xebathiz û helal bû. Ew çand sal bû, ku hatibû wî gundi. Vira tu xizmekî wî tune bû. Ne bay, ne bira, ne xûşk. Jina wî-Xanê, kulfeteke destemel bû. Ewqas bedew bû, meriv heîr û hijmekar bû wê binihêriya. Ewê bi tiliyê xwe yên mûmanî xalîce, carcim çêdikir.

De, mala şivanaye wî çaxî wê ci bûya? Misto bi cûrekî ebûra zarongêd xwe dikir. Rojekê jî cerdê ser keriyê pezê Misto da girt. Qaçax sîlikkirî bû, lê destê Misto da tenê çomaq bû. Ewî gelekî berxweda, kire şer, lê axirkê bi gulla qaçaxa hate kuştinê. Pey kuştina Misto ra, qaraniya malê kete stûyê Xana duhalâ.

wê rojê, min telefona destan bi xwe re nebiribû ber behrê. Di dilê min de xemginîyeke mezin hebû. Ez yê ku pirr li behrê vedibe, wê rojê sawek bi min re çêbû û ez pirr dûr neçûm. Bi telaş çavê min li ser Berken û Serhat bû. Giraniyeke mirinê bi ser min de girtibû. Hîsseke ecêb bi min re çêbûbû: Wek ku ewê yan ez, yan jî yekî min ê pirr nêzik bimire.

Di dora nîvroyê de, melê Akçayê azan da û xebera mirina yekî da. Sa- et tamdi dido û nîvan de, mele xebe- ra mirineke din jî da. Sawa di dilê min de bêtir bûbû. Berê êvarê, em ji ber avê bi rê ketin ku herin malê.

Xalê min di bîra min de ye. Çend roj berê hatiye Stenbolê û bi xeyd ji min qetiyaye. Ji neçarî du neviyên xwe bi xwe re anîbû Stenbolê, da ku li derekê bixebitin. Ji min re got, "Heke tu bixwzî, tê wan têxî karekî", li ser vê gotina wî, min jî lê vege- rand û got, "Xalo, wek berê pirr tê- kiliya min bi xwediyê karan re tune, belê ezê binêrim." Li ser vê yekê xalê min ji min acis bû û nepeyivî. Serê sibê gava ku min ew li otobosê suwar kir jî, ji min xeyidandî bû.

Min dizanibû ku ketiye tengahiyê. Hingê min ji xwe bi xwe re got, "tiştek nake, ezê ji zarûkan re karekî peyder bikim, dû re telefon bikimê û hinekî jê re bibim alîkar."

Gava ku ez gihîstîm malê û min li telefona xwe nihart, min dît ku 39 caran lêxistiye. Ez şaş û mat mam. Ma di nav çend saetan de, wê kî 39 caran li min bigere. Min bala xwe dayê ku mesajek heye. Gava ku min mesaj xwend, dinya li min tarî bû.

Xalê min Seyfedîn, bi qîrîzeke dil miribû. Xwadowo, niha êdî ez sêwî bûm. Xalê min, bavê min, xwe- diyê min, her tiştê min, welatper- werê ku neynokên wî di şikenceyan de hatin rakirin, tunebû. Felekê bê- bextkiyeke mezin li min kiribû. Di te- vahiya emrê min de, tenê carekê dilê xalê min ji min mabû û hê bêyî ku ez dilê wî şâ kim, miribû. Bi mirina wî re perçek din jî ji min miribû.

Qamyona pêşî Sadî, qamyona duduyan jî xalê min hilanîbû. Mala me xer bûbû. Wê mala bi mîvan, wê mala mezin, wê mala şen tunebû. Çend sal piştî mirina Sadî, xalê min li rû wî, di kêleka wî de bû.

Min xwendibû, bi gotina Sadî ez bûbûm mirov, lê piştî hê lî ser pişta min bû. Piştî hê jî li ser pişta min e. Xaniyê me hilweşıya, rezê Berê Bendê kor bû, Berê Kelê wêran bû, mala me ya bi mîvan û bi çûn û ha- tin xera bû, lê piştî hê li ser pişta min e. Diriyên piştî di pişta min re diçin. Bi şevan xewa min nayê. Ez Duder- ya di xewna xwe de dibînim, bi şev bi xalê xwe re dipeyim, pîra xwe gohdarî dikim, bi Sadî re diçim ber pez.

Roj derbas dibin, sal dibuhirin, ez radizêm û radibim. Ez ji xwe bi xwe re dibêjîm ev xewn e, wexta pî- ra min Asya min ji nav nivînan rake û bişîne per pez, belê kes min hişyar nake. Di şevê min de Duderya he- ye, belê rojên min dinyayek xerîb e. Ez hê jî nizanim, ma yê ku bi şevan li Duderya dijî ez im, an yê ku bi ro- jan li vî warê xerib digere ez im. Ez kî me? Lê ev piştî? Ax ev piştî?

Derbasiya li Farqînê ji gund gellek zehmettir bû. Dîsa jî Xalê min, bi ked û xebata Sadî û zarûkan piçekê xwe dabû ser hev. Di sala 1994an de, di destê wî de tiştek pere gihîstibû hev. Bi der û dora xwe, ji bo kirina karekî dişêwîrî. Hinekan ji kekê min re gotibû ku heke kamyonekî bikire, wê baş bibe. Hingê rabû kamyon kirî. Demekê bi şûn de kurê xwe Sadî şand ser kamyonê. Sadî şofertiya traktorê kiribû, belê çaxê ku dît karê kamyonê bi şofêrên xerîb rîve naçe, derket ser kamyonê û wî bi xwe şoferti kir.

Di 15ê Nîsana sala 1994an de xebra reş gihîst me. Li Bodromê, mobilyetek derketibû pêş Sadî û Sadî ji bo ku li mobilyetê nexe, bi qamyonê di kendalekî de firîyabû. Sadî can dabû û li pey xwe heşt sêwî hêştibûn.

Xalo, malmîrato!. Do mezinkirina sêwîyên xwişka xwe, iro mezinkirina sêwîyên kurê xwe. Bi ser de kula Sadî. Gula malê tefiyabû. Kîjan dilî, kîjan kezebeh dikaribû vî barîрагirta gidî.

Sal 1994 bû. Farqîn di dema xwe ya herî tarî re derbas dibû. Eger xalê min Sadî li gund veşarta, wê nikaribûya hergav biçe ser mezelê wî. Loma wî Sadî, mîvanê xwe yê herî ezîz li Farqînê veşart. Gora Sadî li hafa malê bû. Xalê min, li ber serê wî şaxeke tuyê danî û her sibe ew zi-yaret kir.

Niha heşt sêwî di sûtîyan de bû. Na, wî tu car xêr û xêrat qebûl nekir. Ji gotina "sêwî" pir acis bû. Wî nehiştibû ku kes ji zarûkên xwişka

wî re bêje sêwî, ma wê çawa bihêsta ku ji neviyên wî re bêjên sêwî. Wî şîna xwe dewisand dilê xwe û bi seriyek bilind xwe da ber neviyên xwe.

Farqîn di demeke tarî re derbas dibû. Dem wusa xerab bû ku jinan cinazê mîran radikirin. Der û dora mezelê Sadî tije bû. Li rû Sadî cihê mezelekî mabû. Xalê min got, "bila ev der vala bimîne." Vî cihî ji bo xwe hêştibû. Dixwast ku ev hesret, qet nebe li aliyê din neyê kişandin.

Bi mirina Sadî re qamyon di çavê me de reş bûbû. Li ba me qatîlê Sadî qamyon bû. Loma çavê min bar nedibû ku ez li qamyonekê binêrim. Piştî mirina Sadî, me xwest ku em xalê xwe ji qamyonê dûr bixin. Belê mixabin ku me rê û îmkana karekî çêtir jî neda ber. Kurê xalê min ê biçük derket ser qamyonê. Ew, kurê wî yê tenê bû. Vê yekê em yekcar acis kirin.

Di sala 2000an de, ha ku me dît xalê min, bi şirîkî qamyoneke din jî kiriye. Tu nebê kurê wî yê biçük wî yeqîn dike û dibêje ku ewê qamyon bi xebatê karibe deynê xwe bide. Belê kar sererast neçû. Bi kirîza sala 2001î re herdû qamyon bi mehan betal man. Deynê qamyonê xalê min piir acis kiribû. Xalê min, ji bo ku deynê xwe bide dest bi firotana erdênen xwe kiribû, belê kesî di wê qrîzê de pere di erd de nedida.

Herçî em in, piçekê ji korîtî, piçekê jî ji hêrsa kirîna qamyonê me xalê xwe bi tenê hêştibû.

Di 5ê Tebaxa 2001î de ez li Akgayê, li ber keviyê behrê bûm. Tenê

torek sitand. Êdî Sadî şofêrê traktorê bû. Belê siyaset li welat germ dibû û çiqas diçû şertên li gund mâyinê ji bo xalê min zehmet dibû. Mala me bi welatperweriya xwe dihat zanîn û ji ber vê yekê xalê min di bin tada û êrîşeke mezin de bû. Li der û dorê tiştek bibûya, xalê min dihat girtin û di şikencê re derbas dibû.

Her ku diçû şertên li gund mâyinê nediman. Xalê min neçar ji gund bar kir û hat li Farqînê bi cih bû. Ji gund derketin, bi qasî ku pîra min êşand, tu kes neêşand. Pîra min ji mîrên Kelê bû. Ji ber ku birayêne wê tunebûn, mal û mikê bavê wê ji jê re mabû. Li berê Berê Kelê darê wê yên beîvan hebûn. Havînân pirrê rojan em bi pîra xwe re li Berê Kelê bûn.

Pîra min a ku tu car ji gund derneketibû û nikaribû li wesayitan si-war bibe, carna ji Farqînê bi hesp an hêstirekê lêdixist û diçû Duderya. Vê rîwitiya wê du sê-roj dajot. Belê ne xema wê bû, Çimkî dilê wê li Duderya û li berê Kelê bû. Malê wê, milkê wê, rezên wê, darên hermî, alîsor, beîv, tihok û şekokên wê li Duderya û li berê Kelê bûn. Ev mal û milk, ev rez û zevî ji bav û kalan ve jê re mabûn; mîrasa bav û kalan bû. Wê mîwênen rezê xwe, da-rênen xwe, deviyênen xwe yek bi yek dinasîn.

Farqîn li pîra min nehat, " Ez dimrim, dimirim, dimirim" digot. Xîreta wê bar nebû, rabû tena serê xwe lêxist û çû Duderya. Her tişte wê roj bi roj li ber çavê wê ji destê

wê diçû. Ji neçarî bêtaqet ketibû. Kesekî wê yê ku rez bikole, li milkê wê, li dar û deviyênen wê xwedî derkeve tunebû. Gund, nîvê pirr vala bûbû û şenayî tê nemabû.

Xaniyê meyê gund, wî xaniyê ku me bi destê xwe, bi keda xwe çê-kirûbû û bi hezaran mîvan lê sitîrî bûn, roj bi roj li ber çavê wê hildi-weşiya. Taqeta wê ya ku derkeve ser xanî û balgeran bike jî tune bû. Pîra min, bi vî awayî di navbera gund û Farqînê de çend salan çû û hat. Axir rezên me kor bûn, xaniyê me hilwe-şiya. Hesreta Duderya û neçariyê li dilê Pîra min xist.

Şevezê zivistanê, li Farqînê Duderya got. Dilê wê hesreta Duderya ranegirt û bi qîrîzeke dil xatir xewst. Di wê berf, baran û şiliyê de û di bin zilma dewletê de, ew rakirin Duderya û li rû kalê min veşartin. Heta ez gîhiştîm gund ew veşartibûn. Pêşî ez çûm ser gora wê û min xwe avêt-ser. Êdî ew di himêza Duderya de bû.

Sermiyana mala me, mîra mîran tunebû. Pîra min, wê zanîn û şehrezayîya ku ji bav û kalan sitandibû, wan çîrok, têderxistinok û gotinên pêşîyan, wan peyvîn şêrîn ên zi-manê me, bêyî ku bispêre yekî serx-wet bi xwe re biribû. Pêxembera ji-nan Asê bar kiribû. Riknek esasî yê mala Mîr Mihemedê Kelî hilweşiya bû.

Bi mirina Asê re min rûyê mirinê yê tehl ji nêzik ve, ji kezebê ve hîs kir. Bi Asê re perçek min jî miribû. Min nizanibû ku mirin evqas bêbav, evqas bêbext e.

pişityê xwe hilîne, wî ji me hersiyan re, ji min, ji kekê min û birayê min ê biçük re piştiyên biçük çêdirik û di-da pişa me, berê me dida riya malê. Piştiyên me li ser pişa me, bi inte int em ji Berê Bendê ber bi malê ve di-şeşitîn.

Sadî, kîngê piştî dida pişa me û berê me bi aliyê riya malê ve dikir, li pey me bi dengekî bilind weha digot; "Vî piştiyê ha ji bir nekin. Ji bo ku hûn bixwînin û bibin mirov, bila giraniya vî piştiyî hergav li ser milê we be. Baş bizanibin, an hûnê bix-wînin û bibin mirov, an jî hûnê weha di bin piştyan de bin, wê dirî û kel-lêmê piştyan di pişa we re here. Ev dersa jiyanê ya pêşî ye. Baş lê bixe-bitin. An piştî kişandin, an jî xwendin. Tu car, heta dawiya jiyanâ xwe jî vî piştiyî ji bîr nekin. We bi piştî kişandinê dest bi jiyanê kir, riya ji piştî kişandinê xelasbûnê, xwendin e. Bixwînin û bibin mirov !."

Ev ders dersa me ya jiyanê ya pêşîn bû. Va ye, di navbera wî piştiyê pêşîn û iro de tam bîst û heşt sal derbas bûye; belê hê jî ew piştî di bîra min de ye, heta ew piştî tucar ji ser pişa min nehat xwarê. Hê jî ez gira-niya wî piştiyî li nav milên xwe, li ser pişa xwe hîs dikim.

Sadî, havîn- zivistan di ber kar de bû. Zivistanê balgerandina xanî, anî-na çûlo, destikkirina tutûnê; biharê kolana rezan, çinîna genim û giya, paleyî, havînê avadan û rakirina titûnê, payizê, çinîna çilo, çûna ser rezan, anîna êzangan. Salek sale-wext Sadî di ber kar de derbas dikir. Ne şev û ne jî roja wî hebû. Gava ku

karê wî biqediya, bazdida karê der û cîranan, di milê wan de dixebeitî.

Havînê, piştî ku dibistan tatîl di-bûn, em dihatin û digihîstîn Sadî. Bi hatina me re piçekê hilim û bîhna Sadî derdiket. Ji çend rojan carekê dora çûna ber pez ya mala me bû, di salêne pêşî de em bi Sadî re diçûn ber pez; lê çend salêne dawî êdî em hîn bûbûn û em bi xwe diçûn ber pez.

Cardin havînê, karekî me yê her-gavîn jî danîna titûnê bû. Me harsal titûn datanî. Danîn, avdan, eşefkirin, tevrikkirin û rakirina titûnê tevê havîna me distand. Bi pirranî di van karen de em di milê Sadî de dixebeitîn.

Xalê min Seyfedîn, li gel karê dew û dozan, hema bêje hersal karê kîrrîn û firotana titûn dikir. Hersal xalê min digot, "Lawo înşelah îsal wê baş here û xebata me badîhewa neçe." Belê bi saya serê ticareta wî, ked û xebata me jî badîhewa diçû. Xalê min, di titûna ku dikirî de zirar dikir û titûna me ya malê jî bi ser de dida. Ked û xebata me ya salekê bi vî awayî badîhewa diçû, belê xalê min tucar dev ji kirîn û firotana ti-tûnê bernedida. Ev yek jê re bûbû kurm.

Bi salan bi vî awayî ajot. Di havîna sala 1981an de min û kekê xwe, me berê xwe da riya Stenbolê. Bi vî awayî em ji karê titûnê jî xelas di-bûn. Heta ku me di sala 1984an de lîse temam kir, em havînan hersal hatin Stenbolê xebatê. Piştî sala 1984an jî êdî ez bi tevahî hatibûm Stenbolê.

Çend sal bi şûn de xalê min trak-

xwe dida riya gundekî. Te dît berê êvarê, tam gava ku ewê ro here ava mîvanek hat û weha got, " Min Şêx li newala jorî dît. Rê çedikir." Pîra min hinek nifir dikir, lê zêde bi ser ve nedîçû. Çimkî ji her kesî bêtir wê bi mîrê xwe dizanibû. Wê baş dizanibû ku ew di ser riyeye xerabûyî re derbas nabe û naçe.

Çend sal beriya ku ez werim din-yayê, hin jinêñ ku cîranêñ pîra min in, ji bo ku wê acis bikin û bidexisî-nin, gotinek belav kiribûn û gotibûn ku Şêx li filan gundê Berwarê zewiciye û çend zarûkêñ wî hene. Belê pîra min a ku bêhed jîr û bi hesab bû, weha bersîva wan dabû, " Şêx zewicî be û çend zarûkêñ wî yên din jî hebin, ew jî zarûkêñ me ne û mîrêñ pişta zarûkêñ min in. Xwedê bikim Şêx zewicî be."! Bi vî awayî ji-nêñ cîran di bin gotina pîra min de mabûn.

Êvaran mala xalê min şen bû. Havîn-zivistan, gava ku xalê min li mal bûya civat li mala me bû. Di van civatan de, em li ber derî rûdiniştin û me bi kurê xalê xwe Sadî re ji mîvanan re xizmetê dikir. Bi pirranî xizmete me, anîna avê, danîna nan û belavkirina çayê bû. Di vê xizmetê de jî serkêşê me, kurê xalê min Sadî bû. Heta ku ji dest dihat, Sadî nedixwest ku em biwestin. Sadî, li gel xizmeta ji civatê re, ji me re jî xizmet dikir.

Sal 1973, demsal payiz bû. Wê salê meyê dest pê bikira û emê biçûna dibistanê. Kurê xalê min Sadî, heta sinifa pêncan li gund xwendibû û ketibû ber kar û xebatê. Êdî ew

xort bû û karê malê jî li ser pişta wî bû. Beriya ku em herin dibistanê, gava ku Sadî li nêzik bixebitiya em jî pê re diçûn dera xebatê. Ew dixe-bitî, em jî li gor karîn û hêza xwe jê re dibûn alîkar. Wê payizê, wê Sadî der û dora rezê me yê ber malê, ku navê wî Rezê Berê Bendê bû sênc bikira.

Sadî ji seriya gund, ji Kûranê, ji Berê Bendê dirî tanî û li sêncâ ber rez dixist. Pîra min Asya li ser rezê Berê Bendê gellek xwar bû. Çimkî tiriyê xwarina me ji vî rezî dihat. Sadî bi piştiyan dirî dinanîn û li ber sêncê rez dikirin. Çend roj bi şûn de meyê dest bi dibistanê bikira. Dibistana ku emê biçûnayê li Farqînê bû. Gundê me Duderya li ser Pasûrê bû. Meyê li Farqînê dest bi dibistana Razeman bikira û bi mehan bêyî ku em werin gund, emê li dibistanê bimanâ.

Kurê xalê min Sadî, hê beriya ku em dest bi dibistanê bikin şîret li me dikir û li ser girîngiya xwendinê ji me re dipeyivî. Li gor wî, wî nexwendibû û ew nebûbû "mirov", belê diviya ku me bixwenda û em bibûna mirov. Nexwe li ber me du rê hebûn: Yek xwendin û bûyina mirov, dudo, nexwendin û bûyina şivan û gavan. Eger me bixwenda, meyê karibûya xwe xelas bikira û emê bibûna mirov, eger me nexwenda, dawiya me karê giran, xebata nanoziko û xulamî bû.

Wê salê Sadî, me jî kir ber kişandina diriyên rezê Berê Bendê. Piştiyê herî mezin, hergav li ser milê wî û para wî bû, belê beriya ku ew

Asya, piçek qeymax daniya ser nan,
min dida lotika û ez bazdidam di-
çûm ber karikan.

Min çavê xwe li Duderya li jî-
yanê vekir û li wir ketim şerê jiyanê.
Bi mirina bavê min re, xalê min em
anîbûn ba xwe. Em sê bira û
xwişkek bûn. Heşt zarûkên xalê min
hebûn, tevî me ve em bûbûn doz-
deh. Diya min, pîra min, kalê min,
xalê min, xalojna min, xalê min ê
mamoste û xatiya min, em hemû dî
malekê, di bin sitarekê de bûn. Em
hemû li ser hev bîst nefer bûn. Belê
mêvanên malê jî tu car kêm nedibûn.
Oda me ya mêvanan hergav ti-
je bû.

Em bîst nefer ji malê bûn, belê
pirrê caran mêvanên malê jî me jî
zêdetir bûn. Carna, gava ku di oda
mezin a mêvanan de cihê razanê nedima,
hin mêvan li ser kulînê radizan. Îcar gava ku kulîn para me za-
rûkan yekî biketa, hingê kêfa wî di-
hat. Ew şev "notirvanê malê" ew
bû. Bi taybetî kekê min ji razana li
ser kulînê hez dikir.

Her tiştê me yê baş, pêşî para
mêvanan bû. Xwarin, pêşî diçû ber
mêvanan û ya ku ji ber wan dima
para me bû. Mala xalê min, maleke
mezin û mêvanperwer bû. Havîn-
zivastan mêvan ji derê malê kêm nedibûn.
Roj hebû ku tenê du -sê tenûr
nan lêdiket. Mêvanperweriya xalê
min li der û dorê bi nav û deng bû.
Di şîn û şahiyê hemû gundiyân de
xalê min wek xwediyê malê dilivi-
ya. Di demên weha de, pezekî xwe
şerjê dikir û diçû pey mêvanan. Te
digot qey heke mêvan li malê tune-

bin, ewê nan di gewriya wî re derbas
nebe.


Li gel mîvanperweriya xwe,
xalê min Seyfedîn zilamek daw û
dozan bû. Li ku derê şer û pevçû-
nek, dozek hebûya, xalê min nav-
berkar bû. Li der û dora me, li war û
welatê me, bi sedan mirov bi saya
wî, bi navberkariya wî li hev hati-
bûn. Ew zilamek aştiyê, ûjdana gel
bû.

Herçî kalê min e, her çiqas nef-
rek ji malê be jî tenê salê çend rojan
riya wî bi malê diket. Rojên salê yên
din li kuderê, çawa derbas dikir,
aqilê me zarûkan nedigirt; belê zila-
mekî wusa bû ku dinya ne tu xema
wî bû, dinya têk biribû. Gava ku ri-
ya wî bi malê biketa jî, rebeno ji tir-
sa pîra min nizanibû ku ci bikira.
Çimkî pîra min pê re dixeyidî û he-
sabê gera wî jê dipirsî. Belê pîra min
ci jî bikira, çend roj bi şûn de kalê
min dîsa bi rê diket û diçû. Me xe-
bara kalê xwe ji mêvanên ku ji gun-
dên der û dorê dihatin distand.

Kalê min hergav di riyan de bû.
Îcar dera ku xelqê din di saetekê de
diçûnê, kalê min di rojekê de nedî-
çûyê. Carna çûyina wî ya gundekî bi
rojan dajot. Çimkî kalê min, riyên
ku tê re derbas dibû, ava dikir. Ne
adatê kalê min bû ku bi riyekê ve
here û derên rê yên xerabûyî çêneke
û derbas bibe. Karê wî yê esasî çêki-
rina riyan bû. Ji bo wî çêkirin û ava-
kirina riyan karekî pîroz bû û riya
çûyina cinetê di vê xizmetê re der-
bas dibû.

Carna serê sibê zû, bi berbangê
re kalê min ji malê derdiket û berê

P i g t i



Felat Dilges

min çavê xwe li Duderya vekir, zarûktiya min li vir derbas bû û min ji vir dest bi şerê jiyanê yê bêşewat kir. Duderya, bi salan e ku bi şevan xew-nên min dixemilîne. Min tu der bi qasî Duderya di xewna xwe de nedît; hê jî ez misêva Duderya di xewna xwe de dibî-nin. Berê bendê, Kaniya Milo, Şikefa Ga, Şengalê, Newala Kuranê, Behedê, Mezelê Reşê, Berê Kelê, Taxa Gomê, Kaniya Gûzê, Şikefta Qul.. li ber dilê min hê jî wusa şîrîn û ezîz e Duderya. Ne Parîs, ne Londra, ne Berlin, ne Moskova... tu der bi qasî Duderya min bi kelecan nake, dil û hinêvên min nalerizî-ne.

Lê wan rojêن zarûktiyê! Tu dev ji wê hêşîrî, wê feqîrî û wê tunehiyê berde. Ci xem! Ci derd, ci dinya! Seriyek pî-vaz, nan û dew, ji serê me zêde bû, ew bû, her ew. Serê sibê, gava ku pîra min

Şevbider im

*Rohilat li Nemrûdê hê
 Çeleng û bedew e
 Li hember rinda şer dike
 Av di çemên me de pir zelal û sar e
 Di şevan hîv têde ajne dike
 Berfli çiya yêن me pir spî û gewr e
 Ji binde berfin vedike
 Dengê kewa û çûçika
 Hê şêrîn e li ser zinarêن me
 Li wir bihar bi Newrozê des pê dike*

*Lê
 Jiyan kuştin
 Gundêن me şevitandin
 Ava çeman şêlî
 Çiya yêن me ar kirin
 Roj res
 Berfa spi sor
 Çûçik bêdeng kew lâl kirin
 Ez
 Bê cî û war kirin.*

*Rojê xwe veşart di paş Nemrûdê de
 Digirî û fedî dike
 Îdî di çemên me de hîv por şil nake
 Stêrkan xwe veşart di ezman da
 Berfin dernakevin man di bin berfê da
 Şev tarî û bêdengî ya çûçika
 Şevbider im
 Ax dîsa
 Rêwî û koçeber im.*

weriyêñ xwe yê olî, gelek caran jî asî bû ye.

* * *

Dîsa rojek, Mela Emer diçî cem Mela Heyder. Mela Heyder li mizgef ta gund bûye. Rewşa wî ya aborî ji ya Mela Emer çêtir bûye. Pêwîstiya Mela Emer bi hinek diraf hebû ye. Çûye jê xwestiye. Lê Mela Heyder gotiye perê min tuneye û nedaye. Çend roj di navê da derbaz bûye Mela Emer dîsa çûye mizgeftê. Ji Mela Heyder ra goitiye;

- Seyda min işev xewnekî dît.
- Xwedê xérke, ka bêje çî ye?
- Min te di xewna xwe da didît.

Xêre, şere ez nizanim. Lê xewneke pir eceb bû.

- Çî bû?

Mela Emer;

- Min didît, ku heşir rabûbû. Ez diçoma heşrê, li wê gelek insan di çona ber şeyînê, ber mêzênê. Herkes gunehêñ xwe, xêra xwe û îmana xwe diwezinand, li piyan hisabêñ xwe diditan. Ewêñ cenetibûn dışandana cenetê, ewêñ cehnemibûn dışandana cehnemê. Ez jî diçom, gava îmana min û gunehêñ min tavêtina ber hev; hingî îmana min ji gunehêñ min kêmter derdi- ket. Wê demê melyakete dihate ba min û ji min ra digot;

- Vaye hewqas îmana te kêm maye, gelo ka tu nikarî peyda bikî, ku em deynine ser. Tu heyfî em navêñ te bi- şeynine cehnemê.

Min digot;

- Ezê li ku peyda bikim?

Melyaket ji min ra digot;

- Çiqas nas û dostêñ te hene li vir in, di nav heşrê dane. Tu dikarî ji wan bipirsî.

Ez diçoma ciyek, didoyan, sisiyän

min pirs dikir. Herkes ji min ra digot;

- Ha ew çadirêñ ku xwiya dikin, tu dibînî?

- Belê ez wan çadiran dibînim.

Digotin;

- Di wan çadiran da bi navê Mela Heyder melayek heye. Tu nas nakî?

Min digot;

- Wile, ez Mela Heyder baş nasdi- kim.

Ez li nav çadiran digeriyam, min pirsa te dikir. Ji min ra digotin;

- Ev çadira pexember e, ev çadira Elî ye, ev çadira Ebûbekir e, ev ya Emer e û ev jî ya Mela Heyder e. Sedem ku çadira te li ba çadira pexember û van eshaban bû, ez gelek şah dibûm. Dema min te didît; rûyekî nûranî li te, quranek li ser çoka te, tu quran dixwînî. Min silav dida. Te serê xwe radikir, silava min digirt. Min digot;

- Seyda, vaye hal û mesela min wuha ye. Kederek îmana min kêm e. Tu dikarî hinek ji îmana xwe bidî min ku ez bibim, deynime ser îmana xwe? Ne xwe wê min bişeynine cehnimê.

Wê demê te destê xwe li quranê di- da û digot;

- Mela Emer, bi vê quranê, bi vê quranê, bi vê quranê piçikek jî îmana min tune. Tu çî ji min dixwazî?

Piştî ku Mela Emer xewna xwe ki- se dike, Mela Heyder lê hêrs dibî û jê dixeyidê û careke dî nave guh bide wî.

Belkî jî Mela Emer, mela meşhûre- ke me yê duwemîn e. Em nizanin. Pê- wîste em bê westan li heyînêñ xwe xwedî derkevin. Tiştêñ ku ji ber talan- kirin û werankirine mane birjînîne ser kaxiz. Ev bareke li ser milê me hemû- yan e. Gelo emê bikarbin di heqê vî barê giran û pîroz da bêñ?

Melyaket mislixa min nîşanî min dida. Ji mislixa min dilop-dilop av dihat.

Min digot;

- Mislixa Hemza axa kîjane?

Mislixa te jî nîşanî min dida. Çî bînim, ji mislixa te aveke wusa boş dihat, wek cuwa aşê bû.

Piştî melyaket bi karê xwe xerîk bû. Pariyek ji min dûr ket, ço aliyê dî. Min jî vî fîrsend dî û bênefsî kir, ez râbûm, min mislixa xwe bada, hindik vekir. Dilop bûne şirik. Şirkek zirav û zelal ji mislixa min hat. Tu nebêjî melyaket pê hisiya. Ji dûr va qîrek da min, hêrs bû, ji min ra xebera got. Hat, mislixa min bi tevayî dada. Min ax û wax kir, min pê va hêvî û zare-zar kir;

- Min bibexşîne, min şasî kir. Tika dikim, mislixa min veke, bila wek berê bî, bila dîsa dilop-dilop bê, ez zêdetir naxwazim. Ez qîma xwe li rewşa berê tînim.

Melyaket pir hêrs bibû. Min da û nedâ ji ya xwe nahate xwarê. Bi tûndî go;

- Te bê emrî ya xuda kiriye, îdî ji te ra risqeke serbûxwe tune ye.

Min go, îdî ezê çawa bikim, çawa nekim, key ezê bimrim?

Bersiva min da;

- Na tu namirî.

- Lê ezê çawa bijîm?

Min dî ku destê xwe avête mislixa te, hinêkêdî jî vekir. Ji min ra go;

- Min risqê te jî berda ser yê Hemza Axa. Ji îro û pêva tu yê risqê xwe li cem Hemza Axa bixwî û vexwî.

Sedem vî ez li vir im, ez ji bo risqê xwe hatime.

Ku meriv pêkenînê Mela Emer baş lêkolîn bike, wê meriv bibîne ku naveroka wan pir manîdar û balakê-

şin. Ewî bi wan gotinê xwe yên hêja rewşa gel raxistiye ber çevan. Ji bo wekhevî û edlayiyê senetê pêkenînê gelek rind bi kar aniye.

* * *

Mela Emer, rojek mevlûdê dide. Ji bo mevlûdê barek mewîj dikirê. Ba-rê xwe tînê datnê malê. Xwendina mewlûdê xilas dibî, dor tê belavkirina mewîja. Mela Emer dibê;

- Gelî gundiyan, ez mewîjan wekî mirovan, yan wekî xwedê belav bikim?

Gundiyên Mela Emer bi yekdeng dibêjin;

- Wekî Xwedê beş bike.

Mela Emer cembêk dide Hemza Axa, cemba mayî jî li çend malên nîv dewlemend beş dike. Tiştek-parê feqîran nakevî. Gundî neraziya xwe nîşan didin;

- Seyda! Ka xwedê wuha ye, ev çî beşkirine?

Mela Emer bi aramî bersiwa wan dide;

- Temaşa rewşa gundê me bikin. Xwedê jî mal û mulkê gund wuha belav kiriye. Min jî weka wî kir.

* * *

Mela Emerê Gulpikî, ji bo ku destmêj bigirê diçî ber çemêk. Piştî destmêjê divê gora xwe bixe piyê xwe. Ferêk dixe piyê xwe, fera mayî nabînê. Temaşa dike ku fera gora wî bi avêve diçî. Zor dide xwe, xwe dirêj dike ku fera gora xwe bînê, wê demê bayêk ji ber diçî.

Mela Emer bi hêrs dibêje;

- Ha ji te ra destmêja te, bide min fera gora min.

Ji van herdu pêkenînan meriv têdi-gehjê ku Mela Emer, di dema xwe da merivkê pir alî bû ye. Li gel bîr û ba-

Mela Emer piştî vê hêrsê gotina xwe didomîne.

- Piştî ku me karî xwe diqedand, ewan mirovan digotin; hûn herdu pêwîste bêne weznandin û giranî ya we weka hev bin. Me dibirin, diweznan-din. Dema me diweznan-din, ez pariyek ji te girantir dahatim. Piştî mer-heze dikirin, ka em çawa bikin, çawa nekin ku giranî ya me weka hev bêن. Piştî dengek ji paşva hat, got; -Min çare dît. Kuro, x.... Mela Emer bibrin, bixne q..... Mela Heyder.

Li ser me vê emeliyata zehmet pêkanîn. Gotin gerek çarêke dîn bêne weznandin. Piştî dîsa me weznandin. Vêca tu pariyek ji min girantir dihatî. Çare ji vî ra jî didîtin, gotin; Zimanê Mela Heyder bibrin, bixne q.... Mela Emer. Vê emeliyata han jî li ser me dikirin. Dîsa me diweznan-dan. Vêca em wekî hev dahatin. Piştî me azad dikirin.

Her wek bala we jî dikşînê; ev nukte nukteyeke gelek balakêše û bi hostayî hatiye honandin. Belkî jî numûneyeke hêja ye di nav wêja me ya nuktedaniyê da.

* * *

Li gundê Mela Emer, bi navê Hemza Axa axayek hebû ye. Gelek dewlemend bû ye. Lê di kîrinêñ xwe da merivekê normal bû ye. Yanî zilma wî jî, edla wî jî hebû ye. Nîvê gund yê Hemza Axa bûye, nîvê mayîn jî yê hemû gundiyan bûye.

Mela Emer, bi xwe pir xizan bû ye. Gelek caran debara wî ya rojane jî tune bûye. Rojek li mala wan tiştek nemaye ku bixwin. Zar û zêçê wî bir-çîne. Bê mecale. Radibî, jin û zarokên xwe dide peyî xwe û diçîne mala Hemza Axa. Dikevine hindir û rûti-

nin, zikêñ xwe têr dikin. Lê Hemza Axa ji Mela Emer napirsê ka hatiye çî. Çend roj di navda diçî, Hemza Axa temaşe dike niyeta Mela Emer tune ku herê. Mereq dike, ji Mela Emer di-pirisê ;

- Mela xêre, tu çend rojê bi jin û zarokên xwe li vir i?

- Hemza Axa min çend roj bêrê xewnek dît. Min va ku ez vê xewna xwe ji te ra kise kim.

- Xwedê li ser xêrê binivsînê ke-remke.

Mela Emer dest bi xewa xwe dike;

- Min didît, ez di nav hewşêk da bûm. Di nava hewşêda gelek mislixên avê hebûn. Ez li wan ecebmayî dimam. Min hev dît ku melyaketêk jî li vê ye. Ez hêdî-hêdî û bi tirs çome ba-lê. Bi xof min jê pirisi;

- Ev mislix ci ne?

Ji min ra got;

- Ev mislix, mislixên riskê insana-nin.

Min lê nêrî, ji hinek mislixan hindik, ji hinêkan zef, ji hinêkan dilop-dilop û ji hinêkên dî jî qet av nayê. Ez li vê rewşê sosret dimam. Min vê rewşê ji melyaket dipirsî;

- Ev ci ye, tu li vir ci dikî?

Melyaket bersiv dida;

- Ez melekê risqê me. Ev mislixên ku tu dibînî, heryek yê mirovêkî ne. Wextê Xweda îrada xwe li ser wan diyar dike, ez jî li vê gorê karê xwe pêk tînim. Ku yek hêjar bibe, ez li vir misixa wî piçikek badidim. Av hindik jê tê, li wê risqê wî kêm dibî. Ewê bimrê jî ez misixa wî bi tevayî dadi-dim.

Min misixa xwe û ya te pir mereq dikir û ji melyaket dibirisî;

- Ka misixa min kîjan e?

mereq dikan. Têñ li dora wan dicivin.

Mela Emer dibê;

- Min di xewna xwe da didît, şer bû şerekê giran bû. Pêşberê me kafirê Urus hebû. Tu qumandanê alayê bûyî. Ez di alayî ya te da bûm. Ez jî tabûr qumandanî bûm. Alayî ya me pêşberê Urus, tabûra me li pêşberê Urus şerekê tundî dikir. Me bi hevra lê dida. Şer dahata merhelêkê wusan leşkerên me çiqas diço kêm dibûn. Min ji te ra digot; Seyda vaye leşkerên tabûrê jî, yên alayiyê jî kêm dibin. Pêwîste em bi paş va bikêşin. Te digot: -Na ji ber kafirê paşve kêşan ne raste. Emê, şerkin.

Me dîsa bi hevra lê dida. Ne di tabûra min da, ne jî di alayî ya te da tu kes nedima. Ez û te tenê dimana. Min digot; -Seyda em birevin.

Te digot:

- Na, li ber qafirê revî ne raste. Hêj mecalên me hene.

Tifingekê di destê te da bû. Gava te gulebaran dikir, sê-çar kafir bi hevra dirêjê erdê dibûn. Min jî libo-libo dikuşt. Di dawiyê da berikên te jî û êmin jî xilas dibûyan. Vêca min digot emê çanbikin? Ji nişkava te duayek dixwend, te pif dikira xwe û tu difiriya yî. Min jî ev dua xewend, pif kire xwe, lê ez nedifirim. Ba min ranedikir. Dijmin dihatin bi aliye min va, ku min bigrin. Min digot; -Seyda medet, ya medet... !

Hama tu ji jorda dahatî, te ev dua dixwend, te pif dikira min, te ez tavêtim. Vêca ez jî difiri ma. Min ji te ra digot; -Seyda min ew dua çend caran xwend, pif kire xwe, ba li ber min neket, ez nefirim. Ev çî bû?

Te ji min ra digot;

- Mela Emer dua ev dua ye, lê devne ev deve.

Em difirîna, difirîna, difirîna...He-

ya ciyekê mîrg û çîman, ciyekê gelek xweş. Te ji min ra digot; -Mela Emer ku em li ha berjêrê xwarê bibin çawa ne?

Min digot;

- Wile Seyda pir xweş e.

Me li wê xwe berdida xwarê. Gava me xwe berdida xwarê, ez diketama nava kûviyekî, tu jî diketî nava kupêkî. Gava min mîze dikir, ev kûviyê ku ez ketim hê tijî pîsîtayî ya insana ye, yên te jî tijî hingivîne. Tu diketî nava kupê hingivîn.

Di vê navberê da sedem ku her tiş di lehê Mela Heyder da tê kisekirin, gelek li xweşê wî tê.

Çiqas Mela Emer çîrokê dirêj dike, ew tim dibê; ê, ê, ê ... Çî çîrokêke xweşe ka dom bike 10.

Mela Emer didomîne.

- Pişî ku tu ketî nava kupê, ez jî ketime nava kûvî ne tu dikariyayî derkevî, ne ez dikariyam derkevî. Me li berxwe dida, eman-yeman me tu çara nedîti ya. Paşî ev rewşa ha bala gelek kesan dikişand. Li dor me dicivîyan. Me ji vê rewşa han xilas dikirin. Me derdixistana. Ji me ra digotin; -Wille hun herduk jî qirêjin. Em nikarin xwe nîzîkî we bikin, we jî teklî xwe bikin.

Me digot;

- Nexwe emê çawa bikin?

Ewana digot;

- Pêwîste hun herdu hev bi alêsin.

Seyda, haşa min te di alêst, te min di alêst. Di dawiyê da ew kes dihatin, li me mîze û qontrol dikirin.

Di binê guhê min da hinêk pîsîtayî mabû. Ji te ra digotin, dê vê piçikê jî bi alêse. Te vê piçikê jî di alast.

Mela Emer hêja gotinê xwe naqedînê, Mela Heyder bi hêrs :

- Ev ne xewne Mela Emer... !

Mela Emer, çara xwe hama vedike. Ciye ku lê mîz kiriye, çara xwe li dor û aliyê mîzê girêdide û dibêjê; dê di ser çara min da vere xwarê.

Mela Îsa bi vî rengî ji serê darê tê xwarê.

Çawa ku Mamosta Feqî Huseyn ji min re kise kir, ewî wê cotika dara Gilyazê li ber derê mala Mela Îsa dîtiye, ji wana xwariye. Û dibê, "wextê ez gîhamê gilyaz hêj gelek digirtin. Zarokên neviyê Mela Emer, dihatin ew gilyaz ji xwe ra diciñiyan û dibirin. Min jî ji wê gilyazê xwariye." Ji van agahdariyan, meriv dikarê bêjê ku, Mela Emer, xwar-jor beri dused sala jiya ye. Lê heyf ku heya îro jî em nizanin ka li pey xwe berhemekê nivîsî hiştî ye yan, na. Tê gotin ku di nav gel da helbest û fiqre yên wî pir hene.

* * *

Mela Emer, rojek gayê xwe zîn dike, hefsar dixe serî, siwar dibe û ji gund derdikeye.

Gundî yên wî jê dipirsin;

- Mela Emer te xêr e, tu yê herî ku?
- Ezê herme cirîtê.
- Çî cirîte Mela Emer?
- Li Hîzan Seyîd Elî pêşwaziyek li dar xistiye, ezê herime wê pêşwaziyê.
- Pêşwaziya gayan ne?
- Nexêr pêşwaziya hespan e.
- Pêşwaziya hespan e, tu çawa siwarê gayan dibî?

Mela Emer;

- Hespê min tune. Gayê min he-ne, ez siwarê wan dibim û diciim.

Gundiyyê Mela Emer;

- Başe Mela Emer, qeq ev gate bi van hespên kihêl ra bikarbin bibazin?
- Wule wextê golik bû, tu hesp pê ra nikariya bibaziya. Nûha bûye ga, ehlaqê xwe terkandî ye.

Ez nizanim.

Wusa xuya ye ku Mela Emer, nuktedaneke osta û hazir bersiv bûye. Bi rastî jî pêkenînê wî îro jî ji bo gelek meselan wek numûnene.

* * *

Mela Emer û Mela Heyder gun-diyen hev bûne. Her roj sibê hev li mizgefta gund dibînin.

Mela Heyder her dem ji Mela Emer pirsan dipirsê. Pirs û axaftinê wî hama bêje her tim wek hev bûne. Ji xwe Mela Heyder, her roj yan, pênc roj, deh roj carek ji Mela Emer ra dibê min te di xewna xwê da dîfî ye. Ji bo ku xwe pê bide şîrînkirin, her tim pes-nê wî daye. Rojek dîsa sibeye, gelek kes ji bo limêja sibê amadene. Mela Heyder dibê;

- Mela Emer işev min te di xewna xwe da dît.

Mela Heyder, dest bi xewna xwe dike. Min te wuha dît, wuha dît.

Çawa tê kisekirin, di warê zanistî da melatî ya wana wek hev bûye. Lê Mela Emer, gelek caran ji Mela Heyder ra seyda gotiye. Mela Heyder, sofi, şexperest û menfietperest bûye. Ev taybetî yên wuha li cem Mela Emer tinâbûne. Vêca rojek jî Mela Emer, wextê tê mizkeftê ji Mela Heyder ra dibê;

- Wile, seyda işev min te di xewna xwe da dît. Xewneke zef ecêp bû.

Mela Heyder, sil dibe, guh lê bel-dibin, bi mereq;

- Xêr bû, kanê bibêje?

- Wile, nûha hişê min li serê min nîne, pişî limêjê bila cemet rûnê, paşî emê xeber bidin.

Neyse, pişî limêjê, herkes dizanê ku Mela Emer, Mela Heyder di xewna xwe da dîtiye. Ka bi çî awayî dîtiye

darê lêkolîneke bingeh fire ye. Sedem ku armanca vê nivîsê ne ev pirsên jörîn, ez li vir li ser wana nasekinim. Ev pirs û pirsegirik babetê nivîseke dûr û dirêj e. Min va ku ez piçêk tema edebiyata me ya pêkenînê bi we bidime tem kirin.

Mela Emer ê Gulpikî kî ye ?

Bi salan berê gava ku min hinêk mesele û pêkenînê Mela Emer bîhist, ji min ra pir balakêş hatin. Balakêş bûn, çimkî naveroka wan di her warîda dewlemend bûn. Ez li ser râwestiyam. Li dor û alî min va ku di heqê wî da zêdetir agahdar bim. Mala wan ava, çavkanî yên min mela û feqî bûn. Lê heyf û mixabin, agahiyêne zede li cem wana jî tunebûn. Divêm, bi taybetî ji mamosta Feqî Huseyn ra si pas bikim, ku di derheqê Mela Emer da hinêk agahdarî û meselên wî ji min ra kise kir.

Çawa tê gotin, Mela Emer, xelqê Hîzan e. Ji gundê Gulpik e. Kengê ji dayîk bûye, kengê çûye heqiya xwe ne diyar e. Her wek tê gotin kebra wî li gundê wî ye. Mamosta Feqî Huseyn dblêjê; dareke gilyazê jê ra hatiye weqfikirin, min ji wê dara gilyazê gilyazan xwari ye. Seyda yê wî Mela Isa yê Xorozî bû ye. Xuyaye ku seydayê wî jî pir zîrek bû ye. Eger zîrek nebûya şagirteke wuha nedigîhiştand.

Çend pêkenîn ji Mela Emer:

Rojek Mela Emer, bi seydayê xwe Mela Isa va tev hinek nas û dostan bi ciyêkî va diçin. Ji nişkava tareta Mela Isa tê. Mela Isa jî pir tekwa bûye, tekwa bûna wî li heremê deng daye. Ji Mela Emer ra dibêj;

- Mela Emer tareta min ya piçûk tê, vaye av tuneye ezê çava tareta xwe bigrim?

Mela Emer dibê;

- Seyda hesaye. Derkeve serê vê darê, li wê tareta xwe bigre, çiqlê darê bişkêne û xwe pê zuwa bike. Tareta piçûk e tiştêk nabî, heya em herine gund. Mela Isa dibê;

- Wille baş e.

Mela Isa derdikevê serê darê, tareta xwe eda dike. Mela Emer jî doxîna xwe vedike. Li dorme dorê darê mîz dike. Vêca Mela Isa li serê darê nikarê bê xwarê. Dike hawar û gazî. Eman-yeman... Dibê; -Kuro, Mela Emer, Feqe Emer te çikir? Te mala min xirakir. Ezê çawa bême xwarê?

Mela Emer ji kena xwe dev berna de û dibê;

- Wille Seyda tê tu yê li wê bimînî, işev. Ezê herim û wê gur bêne te bixwin. Xwedê jê razî ev ci tekwatiye, ci hale, ci ye , hewqas tekwaîti dibî? Qey te nikariya hama li vir tareta xwe bigirta. Filan, bêvan. Gelek lomana dike.

Mela Isa;

- Mela Emer Dev ji tinazan berde. Ji bo yî xwedê riyek ji min ra bibîne. Mela Emer;

- Seyda tê tu ci bidî min?

Mela Isa;

- Tu çî bixwazî ezê bidime te.

Mela Emer;

- Cotêk darê Gilyazê, li ber derê te hene. Vê cota darê Gilyazê tu yê li ser min û li ser neslê min weqif (ev dara Gilyazê ku min li jor anî ziman yek ji wana ye) bikî. Ezê riyek ji te ra bibînim, ku tu bikar bî bêyî xwarê. Mela Isa, di rewşike bêçareda ye. Sedem ku ji vê rewşê xilas bibî xwesteka Mela Emer qebul dike û dibê; belê, di riya xwedê da min wana ji bo te û malbata te weqif kir.

Numûneyeke balakêş di edebiyata Kurdî ya pêkenînê da:

Mela Emerê Gulpî

Her wek gelek caran tê gotin; edebiyata me, gelek dewlemend e. Lê li gel wê dewlemendiyê sed mixabin ku îro jî em nikarin bêjin, di konaxê edebiyata cîhanê da ye. Sedem pîrin. Lê bi gelempîr; wêrankirin û talankirina welat, çand û edebiyata me jî kambarê û tarûmar kiriye. Qedexe kirina salan mecal nedaye ku ziman û çand pêşva here û nûjen bibe. Li gel van kirinê qirêj û gemar, li piya mayina edebiyata me bi rastî jî gelek balakêş e. Berxwedana edebiyata me sedem vî tiştekê herê pîroze. Ku em van deh salên dawî lênekin, di warê nivîsî da kambaxbûn girantir e. Xezîne di devda maye, derbazê ser kaxiz nebüye. Sedem vî, gava dibêjin edebiyata kurdî; pêra edebiyata devikî tê bîra meriv. Di saya serê hinek dezgehêñ kevnar da edebiyata me ya devikî mecala jiyanê dîtiye. Sed mixabin ku bi salan, xwenden van û pêşverûyêñ kurdan dijê wan dezgehan derketine û rûmeta wan nezanîne. Ku meriv bi hêsayî bala xwe bide dîroka gelê me, tê meriv bikarbî rola axa, mîr, beg, şêx û mela yên me, di jiyan û parasitina edebiyata me da bibînê. Di vî warî da medrese rolê herê giring leyîstî ye. Rola medresan di edebiyata kurdan da hewce-

Kiras

*Ne hewcye vebêjî
Pejnên xwe yên bê kiras
Va belawela kir
Serhişkiya dilê tolaz
Bi bayê bênderên dilxwas
Li şevreşê pijiqîm.*

*Çarika xewê nixamtiye çavek min
Ê din bi wexma çemên çekûs
Hew dinase belalûka berdil
Şevgeşa bêhn lê çikiyayî.*

*Rasterast xwe xapandinek bû bibore
Pirtûkên pelges dil li min xewirand
Robarênu ku bazbenda sonda min bûn
Li newalên fetlonek qelibîn*

*Çendîn kezebşewatî pêhisîyam
Şîr dimijim ji çar kaniyên durî
dengbêjîn xembar bi pûxteya çûnbar
dirêsin dîroka vî bajarî.*

*Evîn û dem li hev şa bûn
Baranê ax hembêz kir bi evîndarî.*

De were lê...

Evdile Koçer

Havîn, ji payîza çavşîl re ramûsanek bi rê kir, lê pêjna ramûsanên te nehat...

Zivistan, li ber tîna payîzê dilê xwe germ kir, lê siya te xuya nekir...

Biharê, bi destê zivistanê girt, lê tu nehatî û te bi ser dilê min de biharek neanî...

De were lê...

Te xwe di nav kîjan demsalên jiyanê de veşartiye? Çend kulîlk li ber siya te şîn bûn?

Pirsên min bêbersiv man. Kulîlkên şevistana min çîlmisîn. Lê tu nehatî...

Bê te bûm gotinek bêmane. Bê te bûm gundek bêkanî. Lê tu nehatî...

Li ber deriyêñ bendewariyê, temenê min çok veda, ma li benda bişirîneke te. Teyrîn demsalî bi ser tenêtîya min de pûrtîn xwe weşandin, bê te nafirin. Lê tu nehatî...

Tûrikê çîrokên te, baqêñ hesreta te, min da milê xwe û wekî rêzikên nameyekê ketim ser riya te. Lê tu nehatî...

Nexşeya dilê min li ser rûyê riya te hate neqişandin. Bûm lêvokê rîwiyan; bûm kenê devêwan. Lê tu nehatî...

Qedemê min şkestin. Hestiyêñ çavêñ min bi ser bextreşıya min de heliyan. Lê tu nehatî...

Ji dengbêjekî re bûm kulam. Ji dayikekê re bûm rondik. Ji şâirekî re bûm helbest. Ji şivanekî re bûm dûrik. Lê tu nehatî...

Ketim ber pêla xeyalê te. Roj û şevêñ min bûn yek; ketim pey bêhna te. Lê tu nehatî...

Li ser riya te, bûm etarek dilonvan; bûm parsekek bêxwuda; bûm koçerek bêzozan. Lê tu nehatî... Ü te bi ser dilê min de zozanek neatî...

De were lê...

evdilekocer@yahoo.com

Fatma Bozarslan

Stranêñ tarîtiyê⁽¹⁾

Roj hat girtin dîsa li gelê Kurd
 Tarîti stranêñ hezîn dibêje
 Kulîyêñ berfê ji jor ve têñ xwarê
 û wek kefenê sipî dinuxêfin axê⁽²⁾

Ji wan mirovan ra bêçarî bûye çare
 Hêvî hatîye birrîn
 Li pêşîya wan gîhanek tune⁽³⁾

Dayik deng li axê dikan
 û dibêjin:

"Ey axa Kurdan, hembêza te gîhaneka
 me ya paşîn e
 Di hembêza xwe da şehîdên me binivîne
 Wan germ bigire, wan meyêşîne

Gul û kulîlkan sîn bike li ser gorêñ wan
 Bila reng bidin hev li ser wan çîyan
 Bila bibin kulîlkêñ nûrê li ser wan"

Nisan, 1991

Zarûkêñ Seddamxwarî⁽⁴⁾

Bi hezaran zarûkêñ Kurdan
 Seddamxwarî bûn bi wan çavêñ res
 Di buharê da nedîtin buhara umrê xwe
 Li ser çokêñ dayikan cemidîn,
 çavêñ wan hatin girtin
 Di dilêñ dayikan da hesret ma ku
 wan binivînin li cîyekî germ
 Ji ber zulma wî vampîrê hov, buhar
 li wan vegerîya û bû zivistan

Fêkîyêñ dara me ya jîyanê bûn
 ew zarûk
 Berî ku bigîjin, hemî weşîyan û
 ketin gorêñ biçûk

Xiyalêñ dayikan
 bûn xewn li serê çîyan
 Hembêzêñ wan vala man
 Wan masûmêñ bêzar û bêziman
 qet fam nekirin ku jibo ci dabin
 qurban
 Nisan, 1991

(1) Ev helbest û ya li pey wê, li ser rewşa Kurden başur hatin nivîsîn, ku ji ber êrişa buhara 1991'ê ya rejîma Îraqê revîyan û xwe avêtin çîyayêñ berfgirtî. Ev herdu helbest, ji kitêba Fatma Bozarslanê ya bi navê "DERDNAME" yê hatine girtin, ku di sala 1996'an da li Swêdê hatîye weşandin.

(2) Dinuxêfin: Dipoşin; wek perdeyek, wek çarşevek li ser wê têñ raxistin û wê di binê xwe da dipoşin, vedişêrin, winda dikan.

(3) Gîhanek: Cîyê ku mirov digîj'ê yan ji dema ku mirov digîj'ê.

(4) Wek ku tê zanîn, heywanêñ ku gur wan dixun, di zimanê Kurdi da jîbo wan tê gotin "gurxwarî bûn". Di vê helbestê da Seddam bi guran hatîye şibandin, zarûkêñ Kurdan ên ku di buhara 1991'ê da ji ber êrişa wî ya xwînî revîyan û li çîyayêñ Kurdistanê di nava berfê da mirin, ew zarûk ji bi berxêñ gurxwarî hatine şibandin.

gelek nivîskarêne me yên din jî weha di-
kin, lê belê hişê mirov nagihîjê bê çima
vî awayî hildibijêrin. Divê mirov biza-
ne: Di kurdî de gava mirov dîialog an jî
peyvîn hinan rave dike, mirov bêjeya
got datîne serê hevokê û gotinê kesên
din hê nû rave dike. Mînakênu li jêrê
ne, heke wek ku li jorê hatiye gotin bê-
ne xwendin, hingê dê bêne fahmkirin bê
xeletî di kû de ye. Ev awa ne bi kurdî ye
û bi tesîra zimanê din hatiye.

Wek mînak:

... ma tu jî li vî bajarî dimînî? got.
(r.10)

ev a ku min berî çend rojan li bajêr
dîtibû ye ji xwe re got. (r.28)

bi xwedê, heta hûn xwarinê nexwin,
hûn ji vê malê dernakevin Serdar got.
(r.62)

... hima radibin û direqisin tê gotin.
(r.81)

belkî ne tenê ye... di dilê xwe de di-
got. (r.128)

... Sarê jî hevaltiya min dike got û bi
serbilindî besîşî. (r.133)

te qala Sarê dikir yadê got û mijara
axavtinê guhert. (r.151)

te ci bihîst Gulê Seîd got. (r.188)

... ew jî guneh in, bila xêra miriyêne
me be Zahirê Hesen çawîş got. (r.213)

Ji bilî çend cihêne mîna dîaloga Sêvê
(r.51), dîaloga Qaso (r.60), ya Cindî
(r.61), dîalogên Seyfo û Biroyê çawîş
(r.168) pê ve mirov dikare bibêje ku he-
mû dîalogên vê romanê weha hatine ni-
vîsandin. Ne hewce ye ku mirov zêde li
ser vê mijarê bisechine. Ev kurmanciya
nivîskîr ya kubar û bedew divê bi vî
awayî nehataya xerakirin.

6.

Silêman Demîr, heta ku jê hatiye se-
rê xwe bi vê romanê re êşandiye û tê de
xebitiye. Di her qonaxa romanê de mirov
vê yekê û jidlbûna wî ya li hember rew-
şa evîna lehengên xwe bi rehetî dibîne.

Nemaze jî di besên behskirina têkîliya
Serdar û Gulê de û di ravekirina hisêne
wan û trajediya wan de biserketî ye. Zi-
manekî gelekî xurt, ji bilî çend hevokêne
ku me li jorê dan, kurdîyeke paqîj û delal
bi kar anîye. Bi vê hêla xwe ve, xwe
ji kîmaniyeke romanîvîsene me yên din
ya mezin xelas kiriye.

Sorê Gulê bi taybetiyeke xwe ya din
jî ji romanêne kurdî yên berî xwe ve diqe-
te. Di romanêne kurdî yên berî wê de, bi
piranî, yek kes an jî du kesen ku lehen-
gên sereke yên romanêne, ber bi çav di-
kevin; lê di Sorê Gulê de ji bilî Serdar û
Gulê, em Sêvê û Misto û Sarê û Seît jî bi
gelek hêlêne wan ve nas dikin. Ji bilî van
şes kesan, malbata Gulê, têkîliyên Ser-
dêr yên bi dêya xwe û xweha xwe re,
malbata Seît û têkîliyên wan yên bi hev
re, ji bo dayina rewşa civakî ya feodal ya
dema ku bûyerên romanê tê de derbas di-
bin wek referansên xurt xuya dibin. Kar-
rawestandina paleyan, tevgera xwendekaran
û têkîliyên wan yên bi sendîqayê
re û têkîliyên pale û axayan jî di romanê
de baş hatine avakirin û bi bûyerên din re
baş hatine girêdan. Sorê Gulê ji ber van
taybetîyên xwe û vê hewila xwe bi tenê
be jî, pesindayineke rasteqîn heq dike.

Bi vî avayî, digel hin qutbûyinêne di
nava romanê de, Sorê Gulê, bi mijara
xwe, bi lehengên xwe û naveroka têkîli-
yan û bi temsilkirina civaka xwe û ilhes
jî keda romanîvîsi ya berbiçav û zima-
nêne xwe yê herikbar û kurmanciya xwe ya
kubar û delal xwe ji gelek romanêne kurdî
yên din bi dûr datîne. Heke ew qutbûyin-
êne di nava romanê de, ku me li jorê
behsa wan kiribû, nebûna, dê romanekê
bêhempa derketaya pêşberî me. Lê ji
xwe, ji helwêsta Silêman Demîr ya ni-
vîskariyê û awayê wî yê romanîvîsan-
dinê gelekî baş diyar dibe ku hêza afiran-
dina romanêne hê biserketîtir jî li ba wî
heye.

pirtûka duyem nenivîsandiye.

4.

Nivîskar li ser kesên ku têkîliya wan û agahdariyê li ser wan bi romana Sorê Gulê re tuneye û xwendevan wan nas nakin zêde disekine û gelek navan dide ku ev ji bo vê romana xweş, wek kêmâniyan dixuyêñ. Di çiroka zewaca dê û bavê Serdêr û di şuna bavê wî de jî weha kiriye. Ji rûpela 106an û bi şûn de ev tebîet dîsa dest pê dike. Ji bili mîrê Sarê û kesên ku bi wan re dijîn, heta navê cîranêñ wan jî yek bi yek dide.

Dora wan bi xaniyan ave ye. Li ali-yê wan ê rojava, mala Birkê Newalî heye. Birkê jî bi eslê xwe serxetî ye. Zilfa jina wî dotmama wî ye û ew jî serxetî ye... ew jî hatibûn cîrantiya wan. Mirovén sernerm û gotinxwes in.

Li piştâ mala wan mala Çolo heye, du jinêñ wî hene. Newîla, a pêşî wek xe-zalekê bû, lê bi dû re çûbû Nofa revandibû... Piştî ku Xidirê Omerî di dîlaneke xwe de ...deman û melhem tune ne hew memikêñ Nofa derman in gotibû, Çolo xwe û dermanê xwe di kilamê de dîtibû û çûbû Nofa revandibû. Niha dê-ya du zarokan e. Lê ew û Newîla qet li hevdu nakin. (r.110 û 111)

Bi dû re di nav sohbeta Sarê û xwe-siya wê re, behsa hin kesên din jî dibe:

Birayekî wê li wir mabû, jê re Cimoyê Şêxo dihat gotin, ew jî berî bi çend salekî miribû. Laloyê birayê wê, di ci-waniya xwe de bi êşa zirav miribû. Çend zaroyêñ Cimo hebûn... (r.116)

Bi tenê carekê em li yekî ji van na-van rast têñ.

Pisîka mala Zilfa bêhna goşt kiribû. (r.132)

Dengê pevçûnê ji mala Çolo dihat. (r.152)

Ci karê van hemû kesan heye di vê romanê de, mirov fahm nake. Ji ber ku bi dû re behsa van kesan nabe û ew kes

hemû, weke gelek kesên din, ilhes jî yên beşa rawestina sendîqayê ya karî, çima hatine binavkirin, bersiva wê tu-neye, lê nivîskar bi dorfirêhî behsa wan dike û bi dû re dev ji wan berdide. Mirov ne mecbûr e ku behsa her tişti bike û elbet mirov ne mecbûr e ku herkesî bi nav bike an jî navan bide herkesî. Di romanen de bi tenê navên kesên sereke û aktîf giring in. Yêñ din hemû bênav bû-na û weha bi dorfirêhî behsa wan nebû-ya, belkî bêtir li hev bikiraya.

5.

Digel kurdîya Silêman Demîrî ya bedew, hin hevokêñ ku nayêñ fahmkîrin hene di vê romanê de:

Êdî di dilê wê de ku jîn sekînî-bû. (r.15)

Di xetera deshpêka dildariyê derxist. (r.29)

Di zikê dê û bavê wî de ku bêden-giya razanê bû. (r.180)

Ê cotekî ciwan ê pêşî bû. (r.180)

Hin hevokêñ ku li gora gramêra kurdî xelet hatine nivîsandin jî hene.

Wek mînak:

Ên berê, ên ku ev roj nedîtine, wê get nikarîbûna bawer bikin ku wilo bû-ye. (r.23)

Nikarîbûna û bawer bikin li pey hev nabe. Ev hevok, ji bo lihevkirina wexta lêkerêñ ku li pey hev têñ, mînakeke baş temsîl dike. Di her romana kurdî de ev xeletî, ne gelek be jî, tê dîtin. Divê weha bûya: ... (wan) ê get nikarîbûya ba-wer bikiraya ku wilo bûbû.

Hin hevokêñ ku belasebeb hatine di-rejkîrin hene. Gava behsa Nisêbinê û Qamîşlokê dike, weha dibêje:

Yek serxet e, yek binxet e. Nisêbînê li jor e, serxet e, Qamîşlokê jî li jêr ê, binxet e. (r.23)

Di dialogên romana Sorê Gulê de jî, çewtbikaranîneke peyva got heye, ku

kesan ya di nava bûyêrên romanê de mînaka herî xurt ev e. Bi vî awayî mirov êdî hatina biharê di guherînên lehengan de jî dibîne.

Gulê hema dîtbû ku êdî qîzeke gîhayî ye û sor û şêrîn dibe. Xweşiya ku buharê bi xwe re dianî û diyarî bedena wê dikir, di temamê bedena xwe de hîs dikir û tahmeke bêhempa jê digirt. Gava carê serê xwe dişuşt, tibabekî li xwe dinerî û xwe dipîva. Him serbilind dibû û him jî êşeke kamax dikişand. Pîrek-bûn, bi eş û jan evîndarî di bedena wê de ava û têkûz dibû. Êdî héza hezkirinê û daxwazên pîrekî, bedena wê dagir kîribûn... (r.70)

Dinya li dora Serdar jî, bi evîndariyê tije dilgeşî bûbû. Xweşîyeke nedîti xwe berdabû ser goşte bedena wî û dilewî. Hêviya wî bilind bû, sık û taswas ji dilewî wî derketibûn. Pêşeroj yekser ges û ewle bû... wek nepoxeke li ber bê bû. Wek ku difiriya lê dihat. (r.70)

Di rûpela 106an de em ji nişka ve li navekî din rast tê. Di gelek romanên kurdî de ev seqetî heye. Gava behsa daweta Sêvê û Xalîfî dibe, paragrafeke nû bi navekî ku mirov heta niha nebihîstîye, weha dest pê dike.

Sarê ji Qamîşlokê hat dawetê û dîsa vegeriya... (r.106) Di vê romanê de, ni-vîskar, hin kesan ji nişka ve derdixe pêşîya mirov û wek vegotina hevnaskirin û zewaca dê û bavê Serdêr hemû bûyer û kesên din bi xwendevanan dide jibîrkirin. Hatina Sarê jî wcha ye. Bi dû re em hîn dibin ku xwişka Gulê û Sêvê ya mezin e û li Qamîşloyê dimîne.

Sarê gava ji bo dawetê diçe Nisêbînê, çav li xwişka xwe Gulê dikeve û dibîne bê çawa kemîlî û gîhîşî ye. Ji ber vê hindê dixwaze wê ji tiyê xwe Seidî re bide xwestin. Berê ji xwesiya xwe re behs dike. Ji xwe malbata mîrê wê ji wê razî ne û gelekî jê hez dikin. Ji ber

ku Seid xortekî xwende ye û naxwaze beyî ku bibîne biryara zewacê bide. Bi vî awayî hemû malbat qane dibe ku Seidî bi mebesta dîtina Gulê bişînin Nisêbînê.

Seid, gava ku Serdar û hevalên xwe dibin pêşengê karrawestandin paleyan, çend rojan li Nisêbînê dimîne û Gulê dicibîne. Lê bala xwe jî bi awayekî baş dide agahiyêni li ser karrawestandinê û şerê di nav polîs û sendiqayiyan de û ji dil dixwaze ku Serdar û hevalên xwe bi ser bikevin. Lê belê nizane ku Gulê ji Serdêr hez dike. Gava ku malbata wî tê xwazgîniya Gulê jî hayê wî ji vê yekê tuneye. Her ci qas Xalîfî mîrê Sêvê bi nameyekê dixwaze vêya ji wî re binivîsîne jî, name dikeve destê Hecî Elîyê bavê Gulê û beyî ku bigihîje Seidî, tê şewitandin. Bi vî awayî em fahm dikin ku Gulê dê bi Seidî re bizewice. Elbet vê yekî bi zorê bi Gulê didin qebûlkirin û têkîliya wê û Serdêr bi vî awayê ku roman xwe bi xwendevanê xwe bide hezkirin bi dawî dibe.

3.

Belê, romana Sorê Gulê bi dayina Gulê xelas dibe. Ji ber ku di beşê serî de em dizanin ku pişî bîst salan dîsa digihîjin hevdu, mirov baş dizane ku roman hê neqediyaye. Em dizanin ku zewaca Gulê dê wan ji hev bi dûr bixîne, lê Serdêr ev yek çawa pejirandiye? Em nizanîn bê çîma û çawa hatine Stockholmê. Ji xwe em nizanîn bê ew zilamê serî jî Serdar e an na. Ev yek ne zelal e.

Romannivîskîr bi xwe jî di dawiya romana xwe de weha nivîsandiye.

Dawiya pirtûka yekem. (r.224)

Pişî vê romanê bi du salan, romana Silêman Demîrî ya bi navê Koç derket, lê baş diyar e ku Koç ne dewama romana Sorê Gulê ye. Pênc sal di ser çapkirina pirtûka yekem ya romana Sorê Gulê re derbas bûne jî Silêman Demîrî hê

jîm... ez ê hew a te bim û li bendî te bim, soz. (r.64)

Di ber têkîliya Serdêr ya bi Gulê re, nivîskar, carê behsa malbata Serdêr jî dike û em dêya wî jî, Gulçîna ku jineke wek her jina kurd e, dibînin. Hê di rûpela 61an de em hîn dibin ku bavê Serdêr heye ku navê wî Ûsiv e û ji bilî payizan tim li dûriyê, li Edenê dixebeit.

Serê biharê diçû Edenê û payizê vedigeriya. (r.93)

Heta vê rûpelê (r.61) hayê me ji bavê wî nîn e, lê di vira de navê wî dide û di rûpela 71ê de nivîskar ji nişka ve dikeve behsa bavê wî û gelekî bi kîtekît û berfirehiyê behsa hevnaskirina dê û bavê wî û zewaca wan dike. Ev vegotin heta rûpela 94an dewam dike. Di nav re hingî ew qasî behsa kesên herêmkî dike ku mirov lê ecêbmâyî dimîne û romanê û mijara wê ya esil ji bîr dike. Her ci qas hevnasîna dê û bavê Serdêr û zewaca wan bi serê xwe mijareke balkêş be jî, di vê romanê de, ji ber ku tu bandorê li bûyêrên din û kesen din û bi giştî jî li romanê nake, cîhê wê tuneye. Bi awayekî din mirov dikare bibêje ku heke behsa çîroka wan nehataya kirin jî dibû.

Di rûpela 94an de her ci qas destê Gulçîna dêya Serdêr ji Ûsiv nabe jî, Ûsiv diçe û li Gawirdaxê otobusa ku ew jî tê de ye, diqlipe. Bavê wî, Ûsiv, bi vî awayî dimire. Em hîn dibin ku Serdar ji bavê xwe hez dike û di romanê de jî dijberê vêya nayê gotin û di şûnê de jî em dibînin bê Serdar çawa li ber dikeve. Şûna bavê wî ya ku li malê hatiye danîn, ji bo dayina hin hûrgiliyênen kultura kurdan yên ku bi şûnê ve girêdayine jî nimûneyên gelekî xurt temsîl dike.

Lê belê di şûna bavê Serdêr de pirsêke din jî tê bîra mirov. Roman serê payizê dest pê dike. Ji ber ku Serdar û

Gulê bi vebûna dibistanê re hevdu dibînin. Zivistan di rûpela 69an de derbas dibe û dem bû bihar... dema serma zivistanê hêdî hêdî cîhê xwe da germa biharâ jîndar... Zivistanî diviya bavê Serdêr vege riyaya malê, lê di romanê de tiştekî weha nîn e. Bi tenê di rûpela 94an de em çûyina wî dibînin. Hingê mirov fahm nake bê nivîskar ji bo ci ji 61an heta 94an ew qasî bi dorfirehî li ser wî disekine û behsa çîroka wî dike. Tê wê mahneyê ku nivîskîr bi dû re xwastiye bavekî ji Serdêr re çêbike, lê ji bîr kiriye, an jî lê hay nebûye ku di serî de û di wexta hatina wî ya ji xerîbiyê de guh nedaye bêv û weke ku tune be tev geriyaye.

Di romana Sorê Gulê de, hatina biharê bi xwe jî bûye problemeke gelekî tevlihev. Ji ber ku:

Dem bû bihar... (r.69)

Rêzika çaran ya di bin vê hevokê de jî heman tişti dibêje.

Zivistan wilo çû û biharâ rengîn hat... Dinya dikemîlî, dil dikemîlîn, ges dibû, beden germ dibû. (r.69)

Şes rêzik di binî de dîsa bihar tê.

Dema serma zivistanê hêdî hêdî cîhê xwe dida germa buhara jîndar. (r.69)

Hivdeh rêzik di binî de hatina biharê hê dewam dike.

Wê salê buhar zû hatibû çiyan û dilan. Hilm û bêhneke bê dawî ji dînyê diçû... buhareke dîn û har bû. (r.70)

Hivdeh rêzikîn din jî diçin, lê hê ji vegotina biharê naqede.

Buhar demsaleke cuda ye. Xwediya taybetiyen cuda ye... (r.71)

Lê belê nivîskarê romanê guherîna kesan ya ku di bin bandora bûyeran de pêk tê, baş rave dike. Bandora hatina vê biharê ya li ser Gulê û Serdar û gihiştina wan jî gelekî baş hatiye vegotin. Ji xwe di Sorê Gulê de ji bo guherîna

çîrokê bike û ji ber wê ji gelek bûyer û gelek kes tev li romana xwe kirine û ji mijara xwe ya esil gelek caran bi dûr ketiye. Ji ber wê, mirov gelekî li ber vê romana delal dikeve.

2.

Di romana Sorê Gulê de kesên ku herî behtir ber bi çav dikevin, Serdar û Gulê û Sêvê-û Misto ye. Serdêr, ku ser-lehengê romanê ye, berî ku hevdu nas bikin bi çend rojan, Gulê li bajêr dîtiye û gava ku wê li dibistanê ji dibîne, dil didiyê. Nivîskar Serdêr beyî hûrgiliyê ku ji bo naskirina wî pêwîst in, weha di-de naskirin.

Serdar... hîna ciwan û nûhatî bû, xwendekarekî lîseya Nisêbînê bû. (r.27)

Rîh û simbêlén wî nuh derketibûn... dor metro û heftê û pêncan dirêj bû. Zirav û lihevhatî bû... gewr û porres bû. (r.49)

Gulê, çavên wê şîn, wek du stêrikên ku di nav rohniya hîva çardehan de bin, vedimirtin û dîsa pêdiketin. Diranên wê di nav lêvên wê yên sor de, wek libên birincê spî dikirin. (r.28)

Porê zer kiribû gulîkek û wek rîsi-yekî bi pişt xwe de berdabû... Wek sêve-ke xelatî bû, aliyek sor bû û yek spî bû. (r.30)

... piştî ne gelekî (dê) şazdeh temam bikirana û biketa huvdehan... Rengê xwêya pîrekî lê xuya dikir, hilîm û bêhn jê diçû. Bedena delal, xwestina dilan bi dîtina carekê tenê re di nav goşte nêr de dîn dikir. Êdî memikên wê nema wek berê bi şermokî hew serê xwe tenê di bin kirêş de hildabûn, êdî mezintir bûbûn û li ser sênga wê belav bûbûn, fesaleke pîrekî ya sipehî didan sênga wê. (r.65)

Misto, hevalekî Serdêr e, hevaltiya wan nû dest pê kiribû. (r.30). Xortikekî di çax û benga xwe de û bala wî her li ser keçikan e. Tiştekî ji xwe re na ke xem û tim li pişta Serdêr e.

Lê herî xweş behsa Sêvêya ku xwe-ha Gulê ya mezin e dibe. Gava Mistoyê hevalê Serdêr bala xwe dide wê, nivîskar bi şayeseke hostehî bedena Sêvê li ber çavan radixe ku mirov dibêje qey Misto wê bi tiliyan ve dipîve.

Sêvê hemû tiştên zaroktiyê bi dû xwe de hiştibûn û kemilbû. Mezinbûn û spe-hibûna xwe piçik piçik ava kiribû û êdî temam kiribû. Û tu tiştên xwe yên mî û pîrekî li ba dînyê nehiştibûn. Êdî xwedi-ya bedeneke gihîştî bû. Bejin avêtibû, kulîmek girover û sêng fireh bûbûn, lêv û hinark sor bûbûn û memik çar tiliyan di bin kirêş de kişiyyabûn. Li gor xwesti-na dilê mîran bi reng û xwê bûbû, diçi-risand û difâriya... Bedena wê tije pî-rekî bû. Hemû tişt di bin kirasekî de hilanbûn... Bedewbûna wê hemû di wî ki-rasê tenik re xuya dibû... Bejineke dirêj û bi sax û per bû. Pêşî li çavên reşbelek, li lêvên tenik dinerî. Bila ew tenê bibê-je ez wek qîz hatim dînyê, min bejin û bal avêt û xortan lê nerîn. (r.49 û 50)

Gava Serdar û Gulê dil didin hevdu, xweha mezin, Sêvê, alîkariya Gulê dike û rê bi ber wê dixe. Sêvê bi Xalitê ku Serdar ji wî nas dike re bidestgirtî ye û ew ê bi dû re bizewice. Heta piştî ku dizewice ji tim li kêleka Gulê ye û dibe hevala wê ya ku li evîna wê guhdañ bi-ke. Carê ji şiretan lê dike û wê diparêze. Rola xwe ya xwehtiyê baş dilîze.

Têkiliya Serdar û Gulê bi pêş dikeve û êdî dibin şîrîkên jîna hevdu a rojane... Piştî demekî ji, soza ku piştî dibistanê hevdu bikin dan hevdu. (r.38)

Lê belê nivîskar, weke çend cihêñ din, ji bîr dike ku behsa dayina vê sozê kiriye û piştî vê rûpelê bi bîst û şes rû-pelan dîsa soza zewacê bi wan dide da-yin. Serdar jê dipirse û dibêje ez dixwa-zim tu bibî şîrîka emrê min.

Gulê ji weha bersivê dide:

... ez ji dixwazim bi salan bi te re bi-

kin, lê bersîva vê miraqê jî di romanê de nîne. Weka Nameya Gulê, ev jî ji bo cil-dên din hatiye hiştin.

Gava ew herdu hezkirî pişti bîst salan dîsa ji hevdu ve diqetin, nivîskar di keve nirxandina evînê trajik, ku ji bo vê romanê zêdehî ye, û behsa çîroka Mem û Zîn, ya Siyamend û Xecê, ya Kalypsoyê û Odysseus, ya Helenaya spehî, ya Theîsa nigzîvîn û bi awayekî bikîtekît van çîrokan li pey hev rêz dike. (r.15 û r.16) Nivîskîr di vira de peyv gelekî dirêj kiriye û ji bûyera romanê bi dûr ketiye. Ji ber ku têkîliya van çîrok-kên ku tên behskirin bi romana wî re nîne û hewce tunebû ku xwe ji mijara xwe ya bingehîn bi dûr bixistaya.

Çîroka vê romanê bi awayekî gelekî balkêş dest pê dike. Bi dû re dîsa nivîskar radigihîne ku wan hezkiriyênu ku pişti bîst salan li hevdu rast hatibûn û dîsa ji hev ve qetiyabûn, pişti cara dawîn bi şes mehan digihîjin mirada xwe û hevdu direvînin.

Bi dû re em van rêzikan dixwînin:

Pişti revandinê bi mehekê jî, li jêra Norweçê, li kêleka Atlantîkê, di trimbê-lekê de hatin dîtin. Du namên kin di nav pasaporta jinikê de bûn. (r.17)

Hayê nivîskîr çawa ji wan nameyan çêbûye mirov nizane. Ji ber ku bi dû re behsa naveroka wan nameyan jî dike û dibêje bê ji kê re hatine nivîsandin. Lê behsa dawiya çîroka van herdu kesan nabe û weha têne hiştin. Hingê kê ew name dîtine û kê xwendine? Heke ew herdu kes miribûna, mirov dê bikariya fahm bikiraya bê çawa hayê wî ji wan nameyan çêbûye; lê belê, behsa tiştekî weha nebûye. Gelo mebesta bi hatin dîtin ew e ku bi mirov bi mirîşî hatin dîtin bide fahmkirin?

Ji wira û bi şûn de, dilê nivîskîr li ser vê bûyerê dişewite û ji lewra dixwaze li çîroka wan bikole. Ev yek jî di be

sedema nivîsandina romana Sorê Gulê.

Ez ji nû ve ketim dû bûyerê û min lê kola. Agahdariyêñ balkêş ketin destê min. Mêrik dixwest kilama du bajaran binivîsîne. Tîstê ku ez tê derdixim, pişti wê seva şahiya li Stockholmê dest pê kîribû. Li gor şema ku çêkiribû, wê çîrok romanek bûya. (r.17)

Pişti vê paragrafê, dibêje destpêka romana wî wilo bû û bi kompozisyonêke xweş û zimanekî şêrîn behsa Deşta Mêrdînê û Nisêbînê û Qamişlokê dike.

Hevokên dawîn yên romana mîrik ku bi dest nivîskîr ketibûn jî, li gora ku nivîskar dibêje, ev bûn.

Nisêbînê û Qamişlokê... warêñ êş û elema dilê min in, ên min û delala min in, evîna min li wir dest pê kir û li wir... (r.25)

Bi tenê ev bi destê nivîskîr ketine. Hingê nivîskar ji ku dizane ku wî mîrikî pişti şeva şahiya li Stockholmê dest bi vê romanê kiriye û şemaya wê ji ku dîtiye ku tê derxistiye ku çîrok dê bibûya romanek, mirov van tiştan nikare ji hev derxîne. Ji xwe hê beşek bi tenê nivîsiye û behsa du bajaran kiriye; bi paragrafekeke ku mirov dikare bibêje ku destpêka beşekî din e jî behsa evînekê kiriye û weke ku nivîskar dibêje: Ew qas tenê nivîsibû. (r.25)

Mirov di van agahiyâne de nikare şemaya romanekê bibîne.

Di rûpela 26an de, hê nû beşê yekem yê romana Sorê Gulê dest pê dike. Bi qasî ku nivîskar di rûpela 25an de dibêje, mirov fahm dike ku ew ê li gora agahiyêñ ku bi dest xistine çîroka wan herdu kesan ji serî heta dawiyê binivîsîne û dewama romana wî kesî binivîsîne.

Heta vira, fantaziyeke gelekî xweş bi dest ketiye û mirov dibêje qey ew ê behsa çîroka evînekê bibe, û dibe jî, lê nivîskîr xwastiye gelek tiştan tev li vê

aliyê naverok, ziman û teknîkên ro-mannivîsiyê jî ji Koçê baştir e, em ê jî di vê nivîsê de di çarçoweya wê romanê de bimînin.

1.

Romana Sorê Gulê bi hinek ji namaya Gulê dest pê dike:

Delalê mino / gava tu bi xêr bê / ez ê dernekevim ser xênî / û sê dengên bilind nelînîm / ez ê biçûk û mezinên taxê / bi hatina te nehisînim / lê ez sozê didim / heta ku tu bê / ez ê hemû maçen ji dev û lêvan / ên ji herdu hinarkan / ji te re hilînim. (r.5)

Hê ji rûpela serî de em li zimanekî xwes, kemilî û edebî rast tê. Mirov di vê nameyê re, weke her xwendevanî, bivê nevê li naveroka romanê difikire. Mirov têdighîje ku hezkiriyê kesa ku navê wê Gulê ye çûye deverike dûr û Gulê jî li hêviya hatina wî ye û carê namayan jî ji wî re dinivîsîne. Wekî din, mirov tavilê têdighîje ku vê bêrkirinê êdî kesereke kûr jî bera nava wê daye. Ji lewra, mirov hê di rûpela serî de xwe ji xwendina mijareke xwes û romanekê baş re amade dike. Lê di romanê de mijareke weha ku mirov li ser difikire nîne. Ji ber ku, ecêb e, tu têkiliya wan rêzan bi romanê re tuneye.

Rûpela pişti vê nameyê, bi destpêka besê yekem û vegotina êvareke payizê û şahîyeke li Stockholmê dewam dike. Pişti şayeseke gelekî pejilandî, ji cihê ku dîlan lê tê gerandin hebekî bi dûr, li salona kêlekê, em tên û zilamekî dibînin. Zilam, gava bîraya xwe vedixwe, ji nişka ve li hezkiriya xwe ya bîst sal berê rast tê. (r.10) Pişti ku hinekî şâş dibe û dirame, radibe diçe cem wê. Nivîskar jî weha dibêje û dewam dike:

Bi dilovanî dest bi axaftinê kir. Hevdû nas dikirin. Bê guman bû, naskirineke kevn bû. Min xwe nêzîkî wan kir û ez bûm guhdarê wan. (r.10)

Ji ber ku hayê me ji berê de ji Na-

meya Gulê heye û me fahm kiriye ku dê behsa evîna Gulê bibe, mirov bi vê hevokê re têdighîje ku têkiliya yê ku dibêje ez bi bûyeran re tuneye, lê ew ê bi xêra vê guhdarîkirinê hin hûrgiliyên bûyerê bide xwendevanê xwe.

Zilam li hember hezkiriya xwe ya ku ev bîst sal in nedîtiye, weha dest bi peyvê dike:

Êvara te bi xêr, tu çawa yî, ma tu min nas dikî û destê xwe dirêjî wê dike. (r.10)

Jinik bi destê wî digire û weha ber-siveke dûdirêj didiyê:

Ooo, spas, êvara te jî bi xêr; wey li vê ecêba nedîfî... hewarê xweda, ma ez çawa te nas nakim malava. Ev ci bextiyarî ye xwedêyo! Wey li vê ecêbê!... ez ê li vir li te rast bihatima! İro? Tu hew hinekî spî bûye, lê tu wek berê yî. Ma ez ê çawa te nas nekim malava! Min bi-hîstibû ku tu jî li vir î, ma tu jî li vî bajarî dimînî? (r.10)

Du hezkirî. Bîst sal di navê re derbas bûne û ji nû ve li hevdû rast tê; lê gava bi hev re dipeyivin, mirov dibêje qey li hember hevdû tiştekî hîs nakin û ev hevdîtina wan ya pişti bîst salan ne ew qasî xema wan e jî. Ji ber ku nivîskar behsa tevgerên wan û hîsên wan nake.


Hê bi dû van peyvan re hinekî be jî behsa hîsên jinikê dibe.

Jinikê wek ku bibêje ma ev jî dê bibuya, min ê tu ji nû ve bidîta serê xwe daxist ber xwe, bi jor û jêr de hêdîka hejand, bi dû re jî hinekî li dora nerî û bi şik qeliqî... dîsa awira xwe bir ser çavên mîrik. Ji nû ve hat bîra wê ku di-vê destê xwe ji nav destê wî derxe... bi pirsyardarî û hinekî jî bi bêzarî li mîrik nerî. Dû re ka ji min re bibêje ma te ci-ma wilo kir got. (r.11)

Ev pirs û bersiva mîrik ku dibêje ne min wilo kir... felek xayin bû... dibin sedema ku xwendevan bêtir miraq bi-

Romanekê nîvcomayî

“Sorê Gulê”



Ibrahim Seydo Aydogan

Di sala 1999an de romana Silêman Demîrî ya bi navê Koç hate çapkirin. Berî wê jî di 1997an de romanekê wî ya din, bi navê Sorê Gulê, di nav weşanên Nûdemê re derketibû, lê weke gelek nivîskarên kurd yên kû li Ewropayê dijîn, wî jî nikarîbû berhemên xwe bi rehetî bigîhandana xwendevanên kurdî yên li welêt. Bi sedan berhemên nivîskarên kurdî yên weha hene ku ji bo xwendina wan divê mirov carekê biçe Ewropayê.

Gava mirov herdu romanên wî ji alîyê çapê ve dide ber hev, cudayetiyeke ecêb derdikeve holê. Romana Koç, tu dibêjî qey beyî dilê weşangêr hatiye çapkirin. Heke mirov rastiyê bibêje, çapeke weha, ji bo nivîskarekî kurd û romanekê kurdî, neheqiyeye mezin e; heke sala çapkırına wan li ser wan nebe, mirov dê nizanibe ku Sorê Gulê berî Koçê çap bûye.

Ji ber ku Sorê Gulê, ji bilî çapa xwe, ji

JIBO NÛRETTÎN BASÛTÊ NEMIR “NÛR Û TÎN”

“TU NEMIRÎ”

Tu nemirî

*Nûra te di nav me da
Tîna nûra te dilê me germ dike
Dide jîn
Dide peroş*

Tu nemirî

*dijî di nav me da
Xebat û çalakiyên me da
Xwîn û lebatêن me da
Hêvî û evîna me da
Şîn, şahî û dîlaniyên me da*

Tu nemirî

*Em di govenda te da dileyîzin
Meydan û rêça te da
Amanc û doza te da
Dimeşin em
Dibezin em
Ber bi azadiyê
Ber bi demokrasiyê
Ber bi şikandina nîrê bindestiyê
Ber bi Kurdistanek azad
Ew welatê bav û kalan
Mîrata deh hezar salan*

Tu nemirî

*Ala doza te nakeve
Wê sagirtêن te hilbigirin
Rakin jor
Rakin jor
Bi nobet
Dor bi dor*

Tu nemirî .

*Tu çiyayê Agîr î
Sîpanê Xelat î
Berfa te sis û zîz e
Şwex dide Kurdistan
Tariya mejîyan
Kûrahiya dilan
Navê te di nav gel da
Dê hibe efsane
Çîrok û dastan*

Tu nemirî

*Giyana te dê bijî
Di nav kulîlkên çiyan
Û zozanêن Serhadê
Di nav bax û rez û bostan
Şîn bibe
Geş bibe
Jîn bide
Bîhn bide
Reng bide
Mîna ala rengîn*

Tu nemirî

*Razê di nav nûr da
Çavêن te payî neçin
Di riya te da bitekoşin
Hemû heval û hogirêن te
Tu di dilê Rizo da dijî
Rizoyê hevalê te*

Keko

*Bira
Di kûrahiya dilê keser da
Derketin ev ristêن min
Min tu jî bîranî
Ew qeza cinawir hat ber çavêن min
Şewitiyan dil û kezeb
Pişik û gurçik
Hemû lebatêن min*

Tu nemirî

*Ji bîrnabî
Tu nûr î
Nûra Roja Zer î
Tu tîn î
Tîna agirê dilan
Qama pîroz î
Carek dî dibêjîm
Razê di nav nûr da.*

18-3-2002 SYDNEY

Bizin şîr bide.

Şîr pîr bide.

Pîr jî dûvkalanê rovî bide

Kaniyê got,

- Baş e. Here bêje keçen gund,
bila bêni li ser min lot bidin, da ku
ez av bidim. Rovî çû cem keçan. Ji
keçan ra got,

**Keçno! Werin li ser kanî lot
bidin, bila kanî av bide.**

Av dar bide.

Dar çilo bide.

Çilo bizin bide.

Bizin şîr bide.

Şîr pîr bide.

Pîr jî dûvkalanê mamê rovî bide.

Keçan got,

- Baş e. Lê em bê sol in. Here
cem solker, bila sol bide. Rovî çû
cem solker û got,

Solker, solker sol bide.

Sola keç bide.

Keç li ser kaniyê lot bide.

Kanî av bide.

Av dar bide.

Dar çilo bide.

Çilo bizin bide.

Bizin şîr bide.

Şîr pîr bide.

**Pîr jî dûvkalanê mamê rovî bi-
de.**

Solker got,

- Baş e. Hemû tişt bi heq e. Tu
tişt bê heq çê nabe. Here cem mirîş-
kan, hîk bîne.

Rovî got,

- Wey, malikê tu li min xirabî. Li
ser darê dinyayê min dizanî ku
hemû tişt dikare bê serê min, lê min
nedizanî ezê bibim mihtacê mirîş-

kan. Rovî çû ber qinika mirîşkanû
got,

Mirîşkno! Ez ketime bextê we.

We divê min xelat ke.

We navê min celat ke.

Hûn hêk bidin.

Hêka solker bidin.

Bila solker sol bidin.

Sola keç bidin.

Keç li ser kaniyê lot bidin.

Kanî av bide.

Av dar bide.

Dar çilo bide.

Çilo bizin bide.

Bizin şîr bide.

Şîr pîr bide.

**Pîr jî dûvkalanê mamê rovî
bide.**

Mirîşk li hev şêwirîn û gotin,

- Erê, em dizanin ku rovî dij-
minê me mirîşkan e. Lê iro hatiye
qinika me, xwe avetiye bextê me
mirîşkan. Em mirîşk xwedî soz û
bext in. Welle ev dijminê bay û ka-
lan be jî, lê gerek carekî em rovî
bibexşînin.

Mirîşkan hêk dan rovî.

Rovî bi eşq hêk anîn da solker.

Solker sol çekir, da rovî.

Rovî sol da keçikan.

**Keçik hatin ser kaniyê lot dan
xwe.**

Kaniyê av da.

Av dar da.

Darê jî çilo da.

Çilo bizin da.

Bizin jî şîr da.

Şîr jî pîr da.

Pirê jî dûovkalanê mamê rovî da.

ez jî dûvê te bidim te.”

Rovî çû cem bizinê û got,

Bizin, bixin şîr bide.

Ezê şîr pîr bide.

Pîr jî bila dûv kalanê mamê rovî bide.

Bizinê got,

- Baş e, lê gerek ez têr çiloyê şîn bixum.

Rovî çû cem darê û got,

Darê, darê çilo bide.

Çilo bixin bide.

Bizin şîr bide.

Şîr pîr bide.

Pîr jî dûv kalanê mamê rovî bide.

Darê got,

- Baş e, lê gerek ez bême avdan.

Têr av vexwim.

Rovî çû cem kaniyê û got,

Kanî, kanî av bide.

Av dar bide.

Dar çilo bide.

Çilo bixin bide.



şev tedbîrekî bibînim. Pîrê bîryar da ku bi şev li himberî vî dizî nobedariyê bike. Pîrê wek hemî êvaran şîrê xwe keland û mehand. Li kulînê ji bona meyandinê xemîland. Xwe di nava cilikan da ker kir û dasekî tûj jî di destê xwe da girt û çavê wê ma li derî. Ma benda dizê xwe. Şev pêşva çû pîrê pêjnekî sah kir. Silîkî, got eva dizê mastê min hat. Dît ku roviyek kete hundir. Rovî wekî hemû caran di cî da ber bi bayê kulînê meşîya. Ü devê xwe xist qûşxana mast. Pîrê jî bi dilekî şewat dasa di destê xwe da ber bi rovî weşand. Qîje-qîj bi rovî ket û bi wê şewatê ji mal derket, berê xwe da qula xwe. Pîrê jî temaşe kir, dasa ku weşandibû dûvê rovî di binî da qut kiribû. Bû sibe rovî li hevdu civiyan û hev ni-hîrîn. Dîtin ku roviyê fêl î mastê pîrê ne di nava wan da ye. Çûn ber qula wî, gazî kirin,

- Mal xirab derkeve, ji qulê, ma wexta razanê ye! Dem dema geştê ye. Roviye diz bi şerm û şerm ji qulê derket. Roviyeñ hevalên wî temaşe kirin ku roviyê diz bê terî ye. Temama wan ji hev ra kenîyan, henek û tevzêñ xwe pê kirin. Teva ji hevdu ra gotin,

- Quto-muto deştê da, dûv kalan ber piştê ra!.

Roviyan ji rûviyê diz ra gotin,

- Her heywanek bi delaliyekî tê naskirin. Delaliya roviyan jî dûvê wan e. Tê wusa bê dûv jiyana xwe

çava bidomîne!"

Roviye diz di ser xwe da çû, merhaze kir û pir jî xemgîn bû, ka wê çawa vê kêmasiya xwe bîne cî. Bîryar da û ji xwe bi xwe re got, eger ku bê dûv ez nikaribim bijîm ezê biçim cem pîrê, xwe bavêjîm tor û bextê wê, ezê bejîm min bibexşîne, ad di canê min ketibe carek din êdî ez tu zerarê nedim benderuha. Belkî vê gavê merhamet li di dilê pîrê bigere, dûvî min î ku qut kirî li min vegeŕine. Bi vê tifakorê rovî melûl melûl ber bi mala pîrê çû. Li ber derî sekinî, serê xwe danî ser şîpana derî û ma wusa. Dît ku pîrê hat. Pîrê got,

- Roviye gerofenê diz, tu dîsa hatîye mastê min?

Rovî got,

- Na. Pîrê ez ketime bextê te. Tu jî bikeye bextê Xwedê. Ji şerma ez nikarim bêdûv di nava roviyeñ hevalên xwe da bijîm. Lewra henek û yariyeñ xwe li min dikin. Dibêjin,

- Quto-muto deştê da, dûv kalan ber piştê da.

Ji bona vî tu dûvî min li min vegeŕine. Pîrê temaşe kir bi rastî rovî bê dûv pir sik in. Dilê wê li halê rovî şewitî. Got,

- Belê, ezê dûvî te bidim te. Lî gereke tu jî xusara min bînî cî.

Rovî şâ bû û got,

- Pîrê ka bêje xisara te ci ye?

Pîrê got,

- Xusara min quşxanekî mast e.

Here ji min ra quşxanekî şîr bîne,

Gulistana Zarîkan



Pîrê û Rovî

Hebû tunebû, di gundekî da pîre-ke jar û feqîr hebû. Bêkes û bêkus bû. Debara wê li ser zekata gundiyan bû. Jiyana xwe bi vî awayî derbas dikir.

Pîrê şîrê ku di nava gund da dici-vand ji xwe ra dikir mast. Lê rovi-yekî diz hebû, bûbû bela serê pîrê. Her êvar dema ku dinya ar dibû, pîrê radiket rovî jî dihat diket kulîna pîrê. Carekê du car pîre got weha nabe êdî. Gerek ez ji bona vî dizî

Amedekar: Isa Eskin

vêñ min di nav xwîna sor de mabû. Dilê wî rehet nebûbû, gezika di destê Remezan Efendî de kişkişandibû û darê wê ya dirêj di serê min de şikan-dibû. Pîrika min Şefîqe li ber serê min, bi qasî hefteyekê di nav nivînan de mam. Min sûcekî gelek giran kiri-bû û 12 rojan jî ji dibistanê hatibûm dûrxistin.

Spas û mala te ava Şivan Perwer...!

Rehma Rebbil-Alemîn li te be û dengê te yê zêrîn her li dinê be!

Sedema vê karesata ku bi ser min de hat, peydakirina kaseta te û ev kilama jorîn bû.

Mala te ava, ji ber tu bûyî sedem ku ez bi ser xwe ve hatim. Min qalikêñ xwe yên gemar bi saya serê te şikandibûn. Êdî min ji ziman, cil û berg û sola piyê dayîka xwe Fatîmeyê şerm ne dikir. Ji wê rojê ta îro min deng û awaza te ya zêrîn ji guhêñ xwe, kaset û sêlik ên (CD) te jî ji çentezenda xwe kêm nekirin. Soz ezê kêm jî nekim.

Min berê jî bihîstibû ku ji ber peydakirina kaseta te, Metînê kurê şifîrê Qaymeqamê Misircê (Qurtalan) laqeyî işkenceyên giran hatibû û 6 meh jî di Hepsa Sêrtê de razabû. Lê wê gavê min oxweşikên xwe pê anîbû.

Piştî lêdana mamoste, min fêhm kiribû ku gohdarîkirina li Şivan Perwer xwedî berdêleke giran e û bi dayîna vê berdêlê bi hezaran kesên we-kî min ji kurdîbûn û şexsiyeta xwe haydar bûne. Şivan Perwer yek ji qa-

sidêñ hişyariyê ye li welatê me. Şivan Perwer qêfîna bindestiyê, awaza xeml û coşa welatê bab û bapîran e.

Ji ber vê yekê ez ji awaza Şivan Perwer hez dikim.

Şivan Perwer harmoniya dengbêjiya klasîk û stranbêjiya nûjen a muzîka kurdî ye.

Li welatê me kêm stranbêj hene ku vê harmoniyê wisa bi hostane bi kar bînin.

Şivan di goranîbêjiya kurdî de ekoleke nûjen e. Ji bo min ‘xozan da-xê’ û ‘Dêrsim e xweş Dêrsîm e’ ya Evdalê Zeynikê ci be, ‘Ferman e’ û ‘Zembîlfiroş’ a ku Şivan bi Gulistanê re dibêje jî ew e. ‘Lawikê Metînî’ û ‘Silêmanê Mistê’ ya Garabetê Xaço ci be, ‘Bavê Fexriya’ û ‘Bilbilê Şeyda’ ya Şivan Perwer jî ew e.

Min aleqa ji kesayetî û siyaseta Şivan Perwer nîn im. Piştî ku ne neyarê tevgera kurd be, hurmeta min ji dîtin û ramanê wî re heye. Meseleya min bi muzîka wî ya qerase û den-gê wî yê kafirstanî! heye.

Min ne bawer e ku li çarmedorê welatê me û Qeqasyayê kurdekî ku nav û dengê Şivan Perwer seh neki-ribe, hebe. Wekî rojnamegerekî kurd, bêyî mûbalexâ dikarim bibêjim ku di çend salêñ dawîn de rastî bi hezaran gotinêñ bi rengê: "Yek ji sedemêñ xwenaskirina min, Şivan Perwer e" hatime.

Spas Şivan Perwer spas....

Deng li dinê be.....

û qîzan dihatim. Ji xwe çend kêsên wekî 'Kerem Çîftçî' ne tê de, rewşa tevahiya sinifa me wiha bû. Kerem car caran bi hinek gotinêñ felsefik behsa bindestiya kurdan dikir. Piştre minbihîst ku hatiye girtin û demeke ne kin jî di girtîgehê de maye. Carcaran em li hal û wextê hev dipirsin. Ew jî evîndar û bengiyê Ahmet Kaya û Şivan Perwer bû.

Êdî wisa bûbû ku min ji kurdîya dayîka xwe, sola piyê dayîka xwe û fistanê wê şerm dikir. Yekem car di wan salan de bêjeyêñ wekî 'serxwebûn', 'berxwedan', 'şoreş', 'şoreşger' û 'têkoşîn' ketin nav lîteratûra min.

Ne tenê 'kurdçî' û 'welatperwer' her wiha 'beredahî' û 'sûtalîn' me jî behsa karesata 1988'an dikirin. Çivîkêñ hesinî jehrêñ 'xerdel' û 'sarînê' li ser deşt û newalêñ Helebçeyê reşandibûn. Wê êdî bi dehsalan kesî behsa heşînahiyê li Helebçe û derdora wê ne-kira. Kilama Şivan Perwer a bi navê 'Helebçe – Ferman e' bûbû benîşt û ketibû devê her kesî:

.....

*Ax de wey lo lo de wey lo lo
Dîsa bombe û baran e
Her derî girtî mij û dûman e
Dîsa nale nala birîndaran e
Dengê dayîkan tê li ser
lorikêñ wan e
Bavik bi keder xwe davêj e
ser zarokan e
Lê zarok mane bênefes
bêrih û bêcan e
.....*



Şivan Perwer

Mamosteyê zikmeşk û serkeçel heta jê hatibû sîleyeke têrteqil û kafirane di rûyê min de teqandibû. Yekser bûbû herikîna xwînê û ser û çâ-

gogê, diketin pey nêçîra keçikên delal! Pişti dema dibistanê heger bikeribûna biçülla ‘Sînemaya Mehtabê’, ji bo wan kêt, ‘kêfa gurê pîr bû’.

Tegmen Demîr du sal li pey me dixwend. Bi bejn û bala xwe ji me girtir û qelewtir bû. Bi pozê tivingê li min dînihêrî. Yek ji şagirtê ‘kurdçı’ bû. Li Qantîna Remezanê Boz ku li hemberî hewşa dibistanê bû, min Eminê xerzî, Qudbedînê Ezexanecî û Mihemedê xalîcî zorê dabû cixareya dûviksor û guhê me jî li dengê İbrahim Tatlıses bû:

Bîr kûlûnû çok sevdîm / O benî hîç sevmiyor / Kalbîmî ona verdîm / Artık gerî vermiyor..... (Min ji evdekkî te gelek hez kir / Ew qet ji min hez nake / Min dilê xwe daye wê / Édî bi paş de nade min...)

Tegmen ket hundir bêyî ku silavê bide, ber bi teyîba qirêj ve çû û qase-ta Tatlıses ji teybê derxist avêt çopê. Bandeke nû ji berîka xwe derxist, xiste teybê û pê li pişkova ‘playê’ kir:

Hey felekê xayinê te çîma li me wiha kir / Te konê me ji nava konan rakir / Te mala mî xera kir / Te dilê dostan şikand / Dilê dijminan bi me şâ kir / Felekê yeman xayinê yeman bêbextê yeman....

Belê ev deng, dengê Şivan Perwer bû. Bêyî ku em tiştekî bibêjin me serîn xwe berjêr kir û me jî guh da vê kilama kezebşewat.

Çendek berê li Batmanê nêçîra mirovan dest pê kiribû. Roj tunebû kû 3-4 kes li kuçe û kolanan neyên kuştin. Wê rojê dîsa bi bêbextî ciwa-


nek bi guleyên qirêj hatibû kuştin. Ev ci zebanî bû? Çîma herikîna xwînê ewqas erzan bû? Çend roj berê jî li pêşıya deriyê mala mamê min Silêman ku nêzîkî Aşê Zekî bû, 3 hevalêن dibistanê bi hev re hatibûn kuştin. Jinikeke ji hewşa Hacî Bacet serê xwe di derî re derxistibû û ji wan re gotibû: "Wele we dîsa mala çend dayîkan mîrat kir...Şahê Nexeşbend jî mala we mîrat bike!" Bi van pirs û xeyalan ez jî ber bi cende-kê ku jin li serî kom bûne ve meşiyam. Çentê di destan de ji destan pekiyabû, ligel defterên dibistanê û çend rojname kaseteke ku li ser ‘Şivan Perwer – Konser’ hatibû nivîsîn, kezeba min anî ber devê min. Min cara yekem ji şexsiyeta xwe û rewşa ku ez tê de bûm, şerm dikir... Ciwanê rûken û bejinbilind ne xerîb bû. Ez ne şaş bim daweta xwe jî nû kiri-bû. Ew Tegmenê me bû, Tegmen Demîr....

Ez bi xwe yek ji wan şagirtan bûm ku min hay ji ‘kurdîftî’ û ‘kurdewarîbûnê’ nîn bûm. Dev ji van bê-jeyen pîroz berdin, îmana min ji van gotinan diçû û min xwe yek ji endamên sadiq a bîrdoza fermî ya tirk di-dît. Ez yek ji wan beredahîyan bûm ku min ji bo xwesteka rakirina ala tirk serê hevalê xwe şikandibû û çend sal berê jî helbesta min a bi navê ‘Çanakkale Şehîtlerî’ (Şehîdên Çanakaleyê) di pêşbaziya helbestan a roja mamosteyan de bûbû helbesta yekemîn. Lê dîsa jî ez yek ji bêsiûdan bûm ku ne leystika gogê dibû para min ne jî ez bi kêrî gera pey keç

*Harmoniya dengbêjiya
klasîk û stranbêjiya nûjen:*

ŞIVAN PERWER

Kirîvê vê sibehê wezê bi Çiyayê Şengalê
Gola Simoqiya diketim iro gelî di gelî de
Kirîvê vê sibehê xwe berdabû
Derê Gola Simoqiya mîna kevoka şînwerdeka
Cemê Xebûrê di binî de
Ax kirîvê lê lê lê...



Salihê KEVIRBIRÎ

Dawiya salên 1980yî ye. Li Batma-na kambax em li liseya bî navê ‘Yahya Kemal Beyatliyê’ dixwînin. Li gel ku ciwanêن ‘kurdçî’ û ‘welatparêz’ hene; her wisa jî xortêن ‘sûtal’ û ‘beredahî’ ku ji çand, ziman, hebûn, nasname û şexsi-yeteke pak bêpar in, ne kêm in. Aliyek ji van koman kovar û rojnameyêن wekî ‘Halk Gerçegî’, ‘Serxwebûn’ û ‘Berx-wedan’ tînin, bi dizî be jî dixwînin û di-din xwendin; carinan jî bi Salihê Reşî ku şîrîkê qantîna dibistanê ye şewr û müşawirêن giran pêk tînin. Aliyek din ji ciwanan jî, di dersan de şelafiya ma-mosteyan dikirin di tenefusan de jî di nava toz û telazê de bi gogê (fûtbol) di-leystin. Piraniya wan, ji dêrî leyistina

ya şên û çeleng jî ji nişkan ve bû goristan. Û navê Helebçe çend rojan hêstirêن jan û bêçarebûnê ji çavên kurdan rijandin, lê çi xema cîhanê ye, çerxa felekê ranaweste... Û partî û rêxistinan navêن xwe li ser û binêن belavokan mor kirin. Û helbestvanan helbest nivîsandin; û di kovareke kurdekan de hat nivîsandin: JI PRAG TA WAŞINTON BÛYERA HALABÇE HAT PROTESTO KIRIN!!! Erê, ji Prag?! Û li vir û wir çend hukûmetan şermok û nîvveşartî bikarhanîna çekêن kîmawî bi şewe-yeke diplomatî istinkar kirin. Bikarhanîna çekêن qedexe istinkar kirin, ne kujtina kurdan! Erê, gotina rast divêt bête kirin. Li Şûnekê, yan du-duyan, pencerene balyozxaneya Ira-qi jî hatin şikandin. Lê, hawar, ey kurdekan, hawar! Kî dikare çiroka wî mirovê bênav û keça wî ya sê sa-lîn, hema çirokekê ji yên bi hezaran, weke ku cîh girtibû bi peyvan vejîne? Kî dizane çi raman di mîjiyê cangoran re derbas bûn, kî dikare xwe berde nav deryaya hest û jana dilên wan, kî dizane di wan çend sa-niyyêñ ber mirinê de çi û çi di mîjiyêñ yên ketinî de derbas bûn?! Kesek nikare! Çi kes çi caran nikare ne nerxê wan bide û ne jî daxwaza dilên yên hatinî kujtin bi cîh bike. Kesek

nikare jiyanâ hatî qurçifandin ya zaro-kêñ Helebçe careke din vejîne û dilên xort û keçen evîndar bi evînê bixemilîne; û kesek nikare dest û giyanêñ jin û mîrêñ hev û din têr nedî-tibûn nêzikî hev bike, hesreta di dilên pîr û kalêñ di nav deqeyekê de mirinî honik bike; û ji dest kesekî na-hîte der ku kesen li ber dilên hinêñ ku zindî manî weqa şêrîn û giran bûn car din li wan vegerîne: û gündêñ hilweşîyanî, ocaxêñ kor bûnî, kulîl-kêñ çilmisînî, û çivîkêñ ji ser çeme-lêñ daran ketinî!

Bêtarêñ di van salan de li Kurdistanê cîh girtinî ne destpêk û ne jî da-wiya bêtarêñ têyên serê neteweya Kurd in. Heye ku rojekê peymanê bratiyê jî car din bêhêñ îmzekirin, heye ku ji cangoran re heykelekî bîr-hanînê jî li meydana bajarekî çêbi-kin, lê canêñ şehîdêñ neteweya me aşti û aramiyê nabînin ta ku kurd di-gihêñ wê qonaxa dîrokî ku tê de kuj-tina mirov û lawiran, tunekirina dar û dehlan û şewitandina gund û bajara-n nema êdî dikare li Kurdistanê cîh bigire.

* Berhem di sala 1988an de
hatiye nivîsandin.
(Lênerîn û guhertina çend
peyvan: 2002)

***Suwarê hespê xelqê hergav peya ye.
Gotina Peşîyan***

dadê jî hîn ji dilên xelkê dernekitibû.

Keça sê salîn bi mehan bavê xwe nedîtibû, lê di sê rojan de dîsan fêrî bavbûna wî bûbû û nuha ber bi wî diçû. Xwerist ji bêtar û cengan mezinir e. Tevî şerê Îran û Îraqê yê heyşt salîn, ew cenga ku her weha li ser xakê Kurdistanê agir û şewat belav dikirin û meriv ji erdê bapîran hildikişandin; li gel çemên hêstir û xwînê ku ji aliyê kurdan de bi salan di nav têkoşîneke mîrxas de rîçikên xwe li her derê hîstibûn; - ew têkoşîna ku li dijî polêt û bombeyên cîhanê hîn jî berdewam bû - tevî hemî hovitiya mirovan; erê, tevî her tiştî jî xweristê Kurdistan dîsa bi hatina bîharê re dixemiland, Kurdistanâ hatî cirrandin.

Ji nişkan ve dengê firrokan hat. Gelo Mîraj bûn, Mîg bûn, Fantom bûn; gelo ji balafirgehêن kîjan alî rabûbûn, bombeyên kîjan welatî di bin zikîn xwe de hilgirtibûn; gelo pîloten wan ji çi neteweyê bûn: Faris bûn, Erebêن Îraqî bûn, yên misrê bûn, Iê gelo ji wenatekî din bûn? Li dû hatina dengê firrokan bi kurtedemekê zîqezîqa çivîkan bi carekê ve hat birrîn, orînî bi çelekê ket û kûzinî bi segî. Dûyekî gewr xwe Ii wan doraliyan belav dikir. Dirêj nekir dema keçik ket xarê û kuxiya. Bavê wê rabû, ber bi wê reviya, lê ling Ii ber hev geriyan, ew jî ket, kuxiya, lê dîsa hêze xwe kir, rabû û reva xwe domand. Nefes li wî çik bûbû, gewriya wî dişewitî û sîngê wî teng bûbû. Ji hêstirêñ bi şewat çâ-

vêñ wî bi dijwarî ber xwe didîtin, lê kezeb şêrîn e, wî xwe gîhand dota xwe û xwe avêt ser wê.

Çivîk ji ser çemelêñ darê ketibûn xarê, seg li ser erdê vedigevizî, çèlekê li ser kêleka xwe can dida û ji asîmanî nema dihat dengê firrokan. Her du çavêñ keçikê yêñ bi hêstiran dagirtî bel bûbûn û hindik mabûn ji kortikêñ xwe derkevin, zimanê wê yê biçûk ber bi der kişiyyabû, rûyê wê qermîcîbû û ji devê bavê wê gilêzêke gewravîn bi ser porê wê de dirijiya. Bavê can dabû, lê hîn jî mîjîyê wî hemî wezîfeyêñ xwe ranewestandibûn, hîn jî wî dixwazt keça xwe biparêze, lê ji dest nedihat û ji ber ku ji dest nedihat, dixwazt biqîre, lê nikaribû, dixwazt hezar naleyan Ii cîhanê bihîne, lê ziman nedifertîlî, dixwazt tufe rûyêñ karbidestan ke, dixwazt careke din li doraliyêñ xwe binihêre û çavêñ xwe ji dîmenêñ wellatê xwe tiji bike, dixwazt Ii nifşê nû şîretan bike, dixwazt û dixwazt û dixwazt, lê dil rawestiyabû, nema oksicêñ digihîand mîjîyê wî. Hêdî-hêdî wî xwe wenda kir, û berî xwe bi tevahî wenda bike spasiya xwedê kir, bêyî ku bizanibe çîma: Dem nebû ji xwe bipirse. Ew pirsa yeke kûr bû, dûr û dirêj bû...

* * *

Bi hezaran mirov di rojêñ salêñ 1987an û 1988an de Ii gund û bajârên başûrê Kurdistanê wek vî mirovê bênav ketin, bi hezaran wenda bûn û giyanêñ wan nema hatin dîtin; û di 16/17ê tebaxa 88an de Helebçe-

Çivîk ji ser daran ketin *



Şahinê Bekirê Soreklî

Ciyikan li ser çemelên darekê dixwendin û dengekî weke mûzîkeke xweş li doraliyên darê belav dikirin. Mangeyek ji darê wê de li ser gîhayê nû diçêriya, segekî ciwan ji mangeyê wê de dida lotikan û li her derê kulîkên bi rengên cuda di destpêka biharê de serên xwe şermok ber bi jor hildidan. Keçekê sê salinîne nû bi ser lingan ketî ji deriyê xaniyekî li aliyê gund dihat der û ber bi bavê xwe diçû, ewê ku di navbera darê û çêlekê de daniştibû û bi ser xwe de diponijî. Gund ketibû destên pêşmergeyan, lê serkeftina wan û rizgarkirina herêmê di bin potînên pasdarân de brîn bûbûn, serkeftin û azadiyekê bêyî dilşadî bû. Tîrsa ji hêzên Bex-

*Êdî şah û padîşah, mîrê mîran
û siltan, serwerê şerabîstan
Ez im ez mîrê kelam,
Pir li jor im, zef li jor
Meyger dagire bi dor,
piçek din bifrim berjor.*

*Meyger, tuyê lez ke bilezîne
Kûpê şerabê ji min re bîne
Ezê vexwim şeveroj, heta sibê
van çaxa
Da ku hemû derd û kulan
ji ser dil hilîne*

*Hêdî hêdî me bi ser me de
bîne*

*Cîran li min dikin gazin
Dibêñ tu hergav şerxweş î
Bala xwe bidin ruyê mele
Kes nabê çi cirnexweş î.*

*Serab dermanê dilan e
Serab şahî û dîlan e
Her kî dûr e ji Şerabê
Ew bê dîn û bê ìman e*



A.Sevînc

Şerabistanê ji bo hemwelatiyêñ hin welatan bi vîze ye. Êdî hemwelatiyêñ van welatan bila dest û milê xwe nehejînin û nekevin Şerabistanê. Çimkî Şerabistan, ne talana wan û bavê wan e. Bê vîze û destûra Şerabî, ew nikarin bivekin Şerabistanê. Vê gotinê ji gohê xwe re bikin guhar, ne dîn bin, ne jî har.

Mîrê Şerabistanê Şerabî, ji bo welatên Îran, Iraq, Suriye û Tirkiyeyê vîze daniye. Kesên ku ji van welatan werin Şerabistanê, divê vîzeya Şerabistanê bistînin û şertan bînin cih. Yê kubihîst, bila ji yê ku nebistiye re bêje. Cezayê bi firarî ketina Şerabistanê giran e, bila her kes vê bizane.

Mîrê mîran, padîşahê Şerabistan, ji bo demekê, ango heta emirnameya duwemîn li Şerabistanê peyîvîna zimanêñ Tirkî, Erebî û Farisî qedexe kiriye. Loma kesên ku vîza Şerabistanê girtine û ji wan welatan têñ, beriya ku li Şerabistanê bigerin, divê pêşî di qurseke Kurdî re derbas bibin û bi kêmanî bikaribin derdê xwe bi Kurdî bêjin. Yê ku li Şerabistanê bi Kurdî nepeyive, wê ji tu derdekî xwe re derman nebîne.

*Ger te divê qanûn ci ye,
Tu bipirse li Hamûrabî,*

*Ger te divê felsefe û zanîn
Here ba Eflatûn, Arîsto,
Ferabî,
Ger te divê mey û evîn,
Tu were ba mamê xwe Şerabî.

Meyer, zû dagire qedeha
şerabê
Îşev ez xeyîdîme ji yarê,
Loma min daye navê
Tî me ez, kezebperritî,
Dîno! mede min avê
Tu deyne ber min şerbikê
şerabê

*Tu min ji şeraba zemzem dûr
nekî Rebî
Bê wê ez dîn û har im tu hay
jê hebî


*Şerabî vexwar şerabê
Meyer, tu dişewişî
Hiş û aqil li te nîne
Çima wusa bêhiş i?

*Malîno werin hawarê
Dîsa Şerabî serxweş e
Daye pey qîza mele
Xwarovîço dimeşe

*Nadim bi gesra siltanan
piyanek şeraba sor
Piştî piyana sisiyan
wek şêran digerim li dor*

Şerabistan

Şerabî



Vîza Şerabistanê

Şerabî, hozanê hozanan, pa-
dışahê padışahan, mîrê Şerabis-
tan, derxistiye çend emirname

û ferman, baş goh bidnê gelî
qûl û hemwelatiyan! Li gor qa-
nûna Şerabî ya nû, êdî ketina

xemgîntir kir.

Min ji wî bi wê de pîrejinek dît. Melkes di dest de ber deriyekî dimalt û pê re dinihurand. Navên şes keçan bi "yadê rebenê" û yên heft lawan ji bi "wey li min pepûkê û wey li min hêşîrê" rêz dibûn. Ez şibandum neviyekî xwe û bi hesreta çar salan ve ez himbêz kirim û maçî kirim. Li dorâ min çû û hat. Destên xwe li hevdu xistin û xwe her hilor kir û li erdê xist. Ji kêfa tu nemabû bifiriyaya. Heta ko kaloyê li ser tutikan rûniştibû hat û ew xist hindur ji wê hey bi dilovanî li min dinihêrî.

Min bûkek dît. Min li serpêhatiya nazdarekê guhdarî kir. Dîsa çar sal berê bû. Wê rojê, xatir ji zavayê hefteyekê xwastibû; wê rojê delaliyê ber dilê xwe li dû xwe hiştibû û bi kêfeke bûkanî çûbû zê. Roja pişti wê, bi xebereke nexêrê dinya li serê wê geriyabû û kêfa wê ya bûkanî bi temamî lê şikestibû. Navê simbêlso-rê xwe li lawê xwe yê sêsalî kiribû. Gava serpêhatiya wê, bû gotin û xwe di nav lêvên wê yên lerzokî re bi zorê gîhand min, ew di ber paqikirina hêşiran de negîhaşt û çav li serê xwe kirin ecêb. Hejiya, destekî xwe da dî-wêr û xwe hêdîka bera xwarê da. La-wê xwe xist himbêza xwe, ew bi he-

mû hesret û hezkirina xwe ve guvaşt û di nav kul û derdan de wendabû.

Ez li taxeke şînê geriyam, min li bajarekî şînê, di bin ewrêne jahrî de, şopa mirina malikşewitî ajot.

Min bajarek dît, seranser goristan... Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şop pêneketî... Bi şevê zûrezûra guran û bi rojê ji xîşexişa maran... Ji heyaman vir de ye ko weha tê gotin ev destan...

Mirovahiyê li Guernicayê kir ha-ho. Hawara wê di felekan re derket. Li Hîroşîma û Nagazakiyê bi tepan çû serê xwe. Hêsis mîna baranê barandin. Li hembera xwezayê situx-war ma; ji ber hemcinsên xwe fedî kir. Mirovahiya ko di destê tarîtiya ko gefen qirkirinê lê dixwarin de dikir nal nal, li Helebçeyê jahrdadayî bû. Di her bêhnstendinekê de di cîh de hişk bû. Xweza bi xayîntiya heñî dijwar re rû bi rû bû. Ezmanê ko ji jorê de li toza mirina ko bi ser xwezayê de dihat werkîrin temaşe dikir, debar nekir û şîrqîniyeke weha mezin jê hat ko tu nemabû, bi ser bajarekî jidesthilanînketî de biketaya.

Guernica bû dîrok. Hîroşîma û Nagazakî ji bi dû de... Lê Helebçe?

maydogan@nefel.com

Sererastkirin

Di hejmara çûyî de, di îlana ku di rûpelê 58an de hatiye weşandin, di cihê telefona Mujde Yayinevî de bi şaşî nûmara telefona Mujde FMê hatiye dayîn. Em vê şaşiyê sererast dîkin û ji xwendevanê xwe lêborînê dixwazin.

warekî hilweşiyayî, heryek li serê kaniyekê heram bû. Bêyî ko pê re bigîştaya ko ji şêniyan xatir bixwastaya, hemûyan çavên xwe li dinyaya gewrik girtin. Û stranek nîvco ma.

Heta ko ez gîhaştim di nav kuçeyên taxeke jahrdadayî de bimeşim, çar sal bi-hurîn. Min xwe li serê kuçeyekê, hişkbûyî his kir. Ez bi vexwârina ava kaniyekê jahrdadayî bûm. Min li hêwanekê, rihê xwe bi carekê sipart. Ez li rastikekê bi zarokekî pêçekê re fetisîm û em herdu bi hevdu re li erdê dirêj-kirî man.

Piştî çar salan, min li kuçeyeke wî bajarî, kalek dît. Kalekî jar î stuxwar... Kalekî be-jindirêj î piştxûz... Li ber xaniyekî xerabe, li şûna warekî wêran, li ser tutikan rûniştibû. Gava çav li min ket, kelogirî bû, lê ji kaniya hêsisran a miciqî, tu hêsis nehatin, qiraxênu tu çavan ji xwe re nekirin cuhok û tê de neherikîn. Her qermîço keke eniyê, xeteke dîrokê, her awireke wî miş hesret, ji serî heta binî, kul û derd... Ez çawa çav lê ketim, ez jî kelogirî bûm. Agir bi kezeba min ket. Sînga min li ser

hev bilind bû û daket. Bêhna min bi zorê derket. Min xwast ez xwe bigirim û êşa ji ber birînên xwe eşkere nekim. Lê hêsisren heta ser lêva min a jorê gindirîn, kêl li birînên min bis-kivandin û di navbera min û kâloyî de girêdanekê xurt çêkir.

Me herduran bi dilovanî û bi melûlî li hevdu nihêrî.

Min bi nerîna xwe ya ko ez didam dest, jê pirsî. Wî desten xwe ber bi Xwedê ve bilind kirin û geh li jorê û geh jî li min nihêrî. Berê li sînga xwe û bi dû re jî li çongên xwe xist, serê xwe bi nalîn bi vir de û wê de kil kir û agirê bi kezeba min xistibû, gûrtir kir. Li vî darê din-yayê, du neviyên wî bi tenê mabûn. Wê rojê, li deve-reke din bûn. Li deve-reke ji jahrê-pa-ratzî... Wê rojê, gava jahrê xwiş û birayên herduran di himbêza dê û bavê wan de hişk kiri-bûn; wê rojê gava mirinê destê xwe xistibû qirika dê û

bavê wan û ew bi derbekê re feti-sandibûn, wan li gundê xalan, bi zarokin din re li xirbeyekî bi malokan dileyist. Gava herduran ji hindur baz da û di ber me re derbas bûn, kul û derd dîsa tev de rabûn û dengê iske-işka kaloyê dilhilûk taxa xemgîn

*Min bûkek dît.
Min li serpêhatiya
nazdarekê guhdarî kir.
Dîsa çar sal berê bû.
Wê rojê, xatir ji zavayê
hefteyekê xwastibû; wê rojê
delaliyê ber dilê xwe li dû xwe
hiştibû û bi kefeke bûkanî çûbû zê.
Roja piştî wê, bi xebereke
nexîrê dinya li serê wê geriyabû
û këfa wê ya bûkanî bi temamî lê
şikestibû. Navê simbêlsorê xwe li
lawê xwe yê sêsalî kiribû. Gava
serpêhatiya wê, bû gotin û xwe di
nav lêvên wê yênerlerzokî re bi
zorê gîhand min, ew di ber
paqîjkirina hêsisran de negîhaşt
û çav li serê xwe kirin ecêb.
Hejiya, destekî xwe da dîwêr û
xwe hêdîka bera xwarê da.
Lawê xwe xist himbêza xwe,
ew bi hemû hesret û hezkiri-
na xwe ve guvaşt û di nav
kul û derdan de
wendabû.*

xemgînî di nav re derbas bûn û xwe gîhand min. Ji min re hêdî hêdî got "Divê erd û ezman bigihêjin hevdu, ax û av li hevdu rûnin, ba û baran bi hevdu re bêñ, teyr û tilûr bi hevdu re bibêjin, deşt û zozan, gelî û çiya bi ziman bibin û heryek ji aliyelekî ve bibêje, da dîmenê xezebeke dîrokî bê ber çavan. "Deverek di agirekî de şewitî. Dûmana li ser serê şûnewarekî, jiyan kir toz û ji erdê hilanî. Qêrîna ji dilekî piçpiçî, di nav rivînan de ber bi ezmîn ve hilkişıya. Zar û zêç, keç û xort, kal û pîr, jin û mîr, netewe-yekî bi temamî li serê çiyayan, xwe ji ber xezeba mirinekê da alî. Yêñ ko zarokên xwe di newalan de, di palan de, di zaboqên asê de veşartin, firsend nedît ko têra xwe bigirîn. Devêñ xwe xistin birînêñ xwe û xwe avêt bextê bilindahîyan. Çavnebaran tehamulî bereketa erdekî bîhesret nekir û bi xezebeke nedîtî êrîşî belgeyêñ ji kûrahiya dîrokê kir. Kundan li dewsa bi hezaran gundan xwend. Bi sedhezaran ciwanmîrêñ avîçûyî, bi deh hezaran jînêñ çavlîrê û zaroyêñ sêwîmayî xemgîn û situxwar...

Gava Biharê bi hemû henûniya xwe ve destê xwe di serê xwezayê de dida; gava tîrêjîn rojê bi hemû hêza xwe ya germahiyê ve bi xwezayê re hêdî hêdî dibîşirîn û çiyayêñ biheybet disincirandin; gava berfa ko dihiliya, ne li palan, ne jî li qûn-

*Rihstîn li gelîyan
feqa xwe veda.
Ji co û cobaran mirin
herikî. Bêhna jiyanê li
deverekê bi temamî
çikiya û bi dû re, pênc
hezar dil bi
carekê rawestîyan.
Pênc hezar beden
di hindurê çend
deqîqeyan de di cîhê
xwe de hişk bûn.
Bajarek bi
temamî fetisî.*

taran ho vedida; gava dengê guşeguşa avê, tevî dengê civîkan dibû; gava kevokêñ cûn ji borengeyan ber bi jorê ve difiriyan; gava tuxetuxa ke-wêñ sipî ji hezazan dihat; gava leg-legê hêlîna xwe li ser dara herî bilind xweş dikir û gava li qotê çiyayekî bilind haziriya agirekî bi hûrbijarî dihat kirin, min di bin çiveçiva guleyan de berê xwe da rojhilat. Ji wî agirî re ko dê rona-hiya xwe ji dilêñ me bîdaya nava du çeman, pênc roj mabûn. Berê dengê gîrgirekê hat. Dû re, dinya ji nişka ve reş û şîn bû. Berê ji ezmîn barana mirinê bariya. Rihstîn li gelîyan feqa xwe veda. Ji co û cobaran mirin herikî. Bêhna jiyanê li deverekê bi temamî çikiya û bi dû re, pênc hezar dil bi carekê rawestîyan. Pênc hezar beden di hindurê çend deqîqeyan de di cîhê xwe de hişk bûn. Bajarek bi temamî fetisî. Devereke şen ji nişka ve xalî bû; pîrebokan lê da çirevîtan.

Gaziya kevnewarekî dîlkêş gîhaşt Xwedaya bereketê û pê re hemû xwedayêñ din. Ne Xwedaya xweşik-bûnê, ne ya evînê, ne ya aştiyê û ne jî yê êgir xwe li ber girt. Hemû xwe-da şaş man û wê gavê hêşirêñ xwedayî ji kortikêñ çavan bi ser hinari-kêñ rûyan de gindirîn. Xwezayeke bêserî û bêbinî kezeb li xwe peritand û ciwaniya xwe li ser wê kir. Destêñ civîkan ji warekî nas nebûn. Heryek ji wan li ser darekê, heryek li ser dî-

Warek wêran bû - mîrovahî jahrdadayî bû

Min bajarek dît, seranser goristan...

Min bi hezaran gor dîtin, bi salan şop pêneketî.

Dengbêjekî kal û rîhsipî xwe li kêleka min bera xwarê da. Min bi meraq li çavên wî yên melûl nihêrî. De ka ji kerema xwe re, destê xwe bide ber guhê xwe û qet nebe, bi meqamekî dilşewat bibêje. Serê xwe kil kir, bi dilovanî li min nihêrî û bi stuxwarî got ko tu meqamên dilşewat nikare vê êşê bîne zimên. Le çîroka wê? Çîroka wê, berê ne li tu deveran hatiye gotin û ne jî bi-hîstîn. Ji xwe, ev serpêhatî di sînorênu tu çîrokan de hilnayê jî.

Bilûrvanekî jîxwebawer, xwe li ber bilûra xwe xwes kir û çend caran ceriband. Qırçînî ji dilê min hat. Bayekî xemgîn xwe li min girt. Lê bilûrvêne devê xwe ji bilûrê derxist, di ber xwe de kir niç û bi awayekî bêhêvî berê xwe da min. Wî jî dît ko ne tu gotin têrê dikir û ne jî tu serawa. Û bê dilî xwe, da ser rêya dengbêjekî kal û dilbikovan; dilbirînekî dewsa waran. Keserek kişand, çıxareyek dirêjî min kir û yek jî ji xwe re pê xist. Rûyê wî di nav dûmanê de wenda bû. Lê pêlên dengêن wî yên lerzokî xwe li dûmanê qeliband, bi

neyêن Avesta, Kelepîr û Dilanê "Dersên zimanê kurdî" pîrik girtine, lê Cezmî Ersöz gelek xweş diherin. Lê ne sucê wan e, ji mezinê xwe wusa dîtine.

Kurdên li bajaran rûdinin û dixwînin heta dest bi axaftin û xwendîna kurdî nekin, bawer im ev problemen me çareser nabin û kurdî pêş nakeve. Ev kar ji rêxistin û sazûmanênen kurdan xera bû, divê ku ew li vî karî xwedî derkevin û serrast bikin. Berî her tiştî, kesên daw û doza aza-diya kurdan dikin, divê kurdi bixa-xivin û binivîsinin. Ji bo xeletiyê baş bînim ber çavan ez ê mînaka Birêz Yilmaz Çamlibel bidim. Wekî ku ew jî di pirtûka xwe ya bi navê "Kervan Yürüyor" de dibêje, bi salan emrê xwe daye vê rîyê, lê keça xwe kurdî hîn ne kiriye u keça wî jê re gotiye "ez te nabexşînim." Ji ber ku Birez Çamlibel xwerexnekir, min mînaka wî da, lê belê rewşa kesên rêxistin û sazûmanênen kurdan bi pirranî ev e. Kesên di rêxistin û sazûmanan de cî girtine di nav xwe de bi zimanê xwe ne axivîne û ne nivîsandine. Asîmîlasyona xwe wan bi destê xwe kirine. Him doza ziman kirie, him jî di jiyanê de zimanê xwe îñkar kirine û bi zimanê zaliman axivîne ku wan dixwest bi zorê bi me bidin qebûl kirin. Bi dilê xwe me zimanê wan qebûl kiriye ku ji bo vî tiştî îro henekên xwe bi me dikin û dibêjin eger zimanekî we hebûya we di nav xwe de bi zimanê me xeber ne dida.

Xeletîkî 'din ya mezin heye ku gotina wî jî pîr şerm e. Mirov hene

ji bo welat fedekariyê gelek mezin dikin heta karin canê xwe jî bidin. Di zîndanan de 7-8 sal dimînin, lê gava derdi Kevin dizewicin di malen wan de kurdî nayê axavtin. Mirov fedî dike jê re bêje ku tu ji bo ci ew-qas sal di hefsa de mayî. Werê xwanê ye ku ji hineka xwestin ji me re rehet tê. Wekî çêlikên hechecikan em devê xwe vedikin dibêjin bila ziman bidin me. Tiştîn ez zanim kes ziman nadî mirov, kesê bixwaze kare bi elime û bi axive. Keseckî ku dibêje ez kurd im, piçekî xîreta wî hebe divê zimanekî biyanî ne axive. Dibe ku dema kar dike mecbur be tirkî bi axive, lê di nav malê de şermek mezine û mazereta wî jî tune ye. Gava ew jî zimanê xwe biaxivin, ew ê bibînin ku jiyan bi kurdî hîna xweş, hîna bi rûmet e.

Hevalê hêja,

Ji bo em zimanê xwe xelas bikin çareyek tenê heye, divê her kurd ji xwe de dest pê bike. Pêşîn xwe hîn bike, dû re dest bi mala xwe bike û dora xwe fireh bike. Dibe ku rejîmê ev heq da me, gava kes ne axive wê ew heq ji ci re bibe. Kurd bi zimanê xwe kurd e.

Kesên li zimanê xwe xwedî der-nakevin, bila forta nedîn xwe û bila nebêjin em kurd in, daw û doza wan a kurdîtiyê jî belasebe ye û xapandin e. Ez bawer im ew ê hawara we bi gihîje guhêne hinek kesan û wê xîret were wan. Ji bo ev xebata bi rûmet we piroz dikim û eger, kesên dibêñ em kurd in, zimanê xwe têxin nava jiyana xwe em ê tev de dilxweş bibin.

Jiyan Bi Kurdi Xweş e!

Recep Dildar

Hêja Dr. Abdullah Kurdî,

Min Kovara Gulistan xwend û hawara webihist, hawar ji kezebê dihat û rastiya me kurda bû. Nivîsa we rewşa me dida ber çavan. Kurd wekî çivîkekî bask şikesti ku li ber devê pisîka ne, ew nekin hawar kiyê bikin hawar. Bi rastî, kesê mîna we difikirin gelek kêm bûne, ne bi mûmê, di bin şoqa rojê de digerin ancax wan dibînin. Nivîsa we ji serî heta binî rastiya me ye û ev rastî dilê me gelek dişewitîne. Dibe ku piştî nivîsê du dilop hêşir jî hatibin xwarê û dibe ku ev name bi hisen dilperitî hatibin nivîsandin. Em ê tev bi hev re bikin qêrîn û hawar, dengê hawarê hinekî jî gurr bikin, dibe ku hinek li xwe varqilin û xîret we re wan.

Hevalê Hêja,

Berî her tiştî divê em bi xwe re durust bin, em xwe ne xapînin, yan em nizanin çi dixwazin, yan jî em

durûtiyan dikin. Em dinerin xwendevan ji bo ziman bi hezaran daxwazname didin, rojên Newrozan bi deh hezaran kurd azadî dixwazin, lê gava rojname an kovarekî kurdî derdikeve, li ciyekî wekî Diyarbekir 50-100 heb têne xwendin. Em dibêjin "hûn çîma naxwînin", bersîv amade ye "ez nizanim kurdî bixwînin." Ka îcar em ê xulî li serê kê bikin. Xwendewanekî li dibîstana bilind dixwîne û dibê ez kurd im, di nava kurdan de dijî û dibê "ez nizanim kurdî" Wê çawa be? Gel wê ji ciyê wî bawer bike? Gava bibêje "ez kurd im", ma ew ê pê nekenin? Û bi ci heqî kare bibêje "ez kurd im." Ji bo kurdî ne elimin kes bi destê wan nagire û bi çoyan li serê wan naxin. Li mala xwe biaxive an here Mêrgehemmedê tiştekî bazar bike, kes jê re nabêje çîma tu kurdî diaxivî. Nikare bibêje çavkanî jî tunene, li pirtûkxa-

dihatin kuştin. Paşê jî kesên qatîl dihatin li ber çavên me dikeniyân. Xelk zef tırsiya bû, nikaribû tiştekî jî bike. Di van salan de nêzî 500 kesan hatin kuştin. Dewlet, polês û leşker di nav van kuştinan de bûn. Di dâwiye de piraniya Silîvayê bar kir çû Ankarê, Stenbolê û deverên mayî.« Van gotinênen vê jina Sîlîva, careke din navê Silîvayê yê dewra imparatoriya Romayê anî bîra min: Bajarê Şehîdan (Martyropolis). Di zimanê grekî de martyr tê maneya şehîd, polîs jî tê maneya bajar. Belê piştî hezaran salan dîsa mirov li vî bajarî dihatin kuştin. Nêzîkî 500 kesan şehîd ketibûn, can dabûn. Dewrên berî hezar salan û rojên iro li Silîvayê, de ma vê seredana min de, gazî hev dikirin. Gelek tişt dianîn bîra mirovan. Ji ber van danberhevan û rûberîhev-kirinan mirov gelek diêşîya û bînteng dibû. Bi kurtî gotinênen jorî yên vê xanîma kurd li Silîvayê ez gelek hejandim. Çawa dibe di nav çar salan de cîhekî waha piçûk de 500 kes bêiz û bêşop dihatin kuştin? Silîva vala bibû. Silîva bûbû bajarê êş û ke-

derê. Bi kurtî em dikarin bêjin ko Silîva bûbû wek bajarekî dewra imparatoriya Romayê û navê xwe yê antîk dîsa li xwe kiribû: Bajarê Şehîdan (Martyropolis)...

Lê belê divê ez vê yekê jî bêjim ko di vê gera sala 2001-ê de min li Silîvayê menzereke xweş jî dît. Qaweyên internetê vebûbûn. Xort bêtirs dihatin-diçûn. Hejmarê wan kêm bin jî, li bal hin mirovan hêviyên paşerojê bejn didan. Piştî ewqas eziyet û lêdan, piştî kuştina 500 kesan, mirov dîsa bi şermoke, dikaribûn bikenîyan. Hejmara wan ne zêde bû. Em rastî çend mirovên beşerxwes û rûken dihatin. Mirov dikare bêje ko Silîva ji bûyîna Bajarê Şehîdan (Martyropolis) derdiket, hêdî hêdî dîsa dibû Silîva. Meha guilanê bû. Bahar hatibû Silîvayê. Bi rastî Silîva dikeniya!

ralakom@yahoo.com

* *Ev nivîs ji malpera NEFELê
hatiye sitandin.*

*Ev ne emrê xudê ye bavo, ne heq e, ne karê dosta ye
Halê me yê perîşan di rûbarî xwînxwar û zordesta ye
Wan danî ev dar û dezge, dîrok û çîrok wan nivîsandin
Rabe, bendê xwe bişkîn, rizgarî di saya his û destâ ye*

Kemal BURKAY

gelek cîh dîtin. Sûka bajêr, sûr û kaniyên di nav sûrê de, malêñ kevn, koşka Mala Ezîzoxliyan û Koşka Mala Beg ez dibirim sedsalêñ kevn. Çûme Şeytan Pazarî (Çarsiya Şeytîn) û çûme **Çarşıya Silîva** ko bûye navê romanekê Mehdî Zana. Çûme tax û kuça mala Mehdî Zana, mala dê û bavê wî. Min Kela Zembîlfiroş dît. Em çûne hin mal û cîhkarêñ Sîlîvayê.

Gelek malêñ xweş yên kevn bi keviran ve çêkiribûn. Dîrok, tebiyet û mirovên rind! xemlek dabûn vî bajarê dîrokî. Destanêñ Zemfîlfiroş û Hecê-Siyabend careke din li vê deverê li ber çavêñ min re derbas dibûn. Paşê em ji Silîvayê derketin û ber bi deverêñ dorberê bajêr çûn. Min cara pêşîn gundekî ji aliyê leskeran de valakirî li kêleka rê bi çavêñ xwe dît. Çawa tê zanîn gelek gundêñ Kurdistanê, ji ber "tedbîrên emniyetê"! ji aliyê hikmeta Tirkîyê de hatibûn vala kirin û xirab kirin. Paşê ez fêr bûm ko navê vî gundî Gundê Xirabguriya ye. Carina jê re dibêjin Xirba. Ji navê vî gundî ji tê xuyan ko qedera vî gundî ji zû da kivş bûye, belkî ji berî sed salan. Valakirin, wêrankirin û xirabkirina gundan berê min di medyayê de xwendibû ûbihistibû. Lê belê waha nêzîk ve min gundekî wêrankirî û valakirî tu wext nedîtibû. Gund kavîl û xopan bûbû. Vî gundî bîna mirovan teng dikir. Em ji wir dûr ketin. Em çûn li derdorê pira Mala Badê. Li wir menzereke gelek xweş hebû. Bîna me hinekî fireh dibû.

Di vê sefer û gerê de bi taybetî Nedret Biliciyê gelek alikariya min

kir. Ji ber ko ev navça, devera cîhê zaroktiya wê bû. Li vir hatibû dinê. Nedret Bîlîciyê çend kûçe û malêñ hin hevalan nîşanî min da ko niha li Swêdê dijîn. Nedret Bîlîcî bi xwe ji Silîvayê ye û niha jî li Swêdê dijî. Çawa tê zanîn iro kolonîke kurdêñ Silîvayê li Stockholmê heye. Hejmara wan gihiştiye hezaran. Di salêñ 1970-yî de hatine û heta niha jî koçberiya wan berdewam e. Yek ji wan kesen ko cara pêşîn ji Silîva hatiye Swêdê, Zekî Tekeş e... Di salêñ 1970-yî de hatiye. Belê di sedsala 10 û 11-an de vîking çûbûne Rohilatê û niha jî piştî hezar salan vê carê kurd hatine welatê wan!

Di vê gera xwe de em demekê li Silîvayê bûne mîvanê xanimeke kurd - Ato Xanim. Salêñ wê dora şêstî bûn. Li mala wê de jineke din jî hebû. Nan dipehtin. Tavilê Nedret nas kirin. Gelek kêfxweş bûn. Nanê germ, penêrê sipî û rûn ve tevayî hevrîşik ikramî me kirin. Nanpehtina diya min hate bîra min. Min cara pêşîn li Silîvayê, xwe li Kurdistanê his kir.

Lê belê çend gotinêñ vê xanîma kurd ez gelek êşandim û xofeke mezin xiste dilê min. Ev bajarê xweşik carekê de ji min reş vehat. Gelek bi dilkovan û dilşkestî bû. Bi dilekî ke-ser vê xanîmê wusan vedigot: »Di destpêka 1990-an de Silîva bûbû bajarekî mirî û bêdeng. Ez serê we sond dixwim birano! pişti nîvro, se-at dibû çar, herkes diçû mala xwe û dernediket. Dengê dîk-mirîşkan, se-kuçikan û tu mexlûqetî nedihat. Xelk ditirsîya. Belake nedîtî û giran bû. Herroj yek-du kes di orta royê de

Kurê wî Ronay li Amerîkayê, keça wî Rûken nigekî wê li Ankarê, nîkekî wê li Fransayê ye. Malbateke perçekirî... Malbateke wêrankirî... Tam babetâ romanekê. Mehdî Zana ev du sal in bi xwe li Swêdê tevî koçberên kurd bûye. Li geliyêne nefiyê de rojêne xwe derbas dike. Lê belê Mehdî Zana tiji enerjî ye. Vala namîne. Ew hêviyan dêhêrîne. Di nav van du salen Swêdê de di pirtûkên xweşik bi zimanê kurdî amade kir û da weşandin: **Me Helal Bikin û Çarşıya Silîva.** Bîranîn û hafiza xwe ya derbarê vî bajarî de rokiriye ser kaxizê. Xwezila her kes wek Mehdî Zana bibûya heyranê devera xwe, dîrok, folklor û zimanê xwe. Wê çaxê gelek bedewî, dewlemendî, rengînî û tonêن kultura kurdan wê derketa holê. Karêن dîrokzanan û lêkolînvanan jî gelek hêsa dibû. Divê mirov bi babetên piçûk ve dest pê bike. Ji ber ko herkes devera xwe baştı̄r nas dike, her mirovek hosta, zana, pispor û aşiqê devera xwe ye. Wek Mehdî Zana divê her kes li koka xwe vege-re û koka bigere.

Mehdî Zana bi weşandina van herdu pirtûkan edebiyat û bîbliyografiyaya li ser Silîvayê dewlemend kir. Bala xwendevanan careke din kişande ser vî bajarê kevn û xweşik. Ji bo naskirina bajarê Silîva berhemên Mehdî Zana fîrsend û îmkanekе baş dide mirovan. Çawa me li jor jî dît ko Ferhenga Silîva ji aliyê dîrokî, siyasî û kulturî de gelek balkêş e. Çend pevv jorîn û jêrîn ko di vê ferhengê de cîh girtine her yek bi serê xwe gelek tiştan ifade dike: Bîzans, Roma Reş, Martyropolîs, Mayafari-

qîn, Silîva, Merwanî, Vîking, Swêd, Gotland, Kela Zembîlfiroş, Pazara Şeytîn, Camiya Selahattîn, Pira Ma-la Badê, Siyabendê Silîvê, Xeca Bextreş, Şêx Seîd, Îdam, Sergum, Mehdî Zana, Leyla Zana, Niyazî Hosta, Kuştin, Lêxistin, Fail-i Meç-hul, Ezîyet, Îşkence, Nefikirin (Sergum).. Bi sedan babet.

Tenê kemasîke van herdu pirtûkan ya piçûk heye divê ez li vir diyar bikim. Ew baş nehatine redakte û kontrol kirin. Wek mîsal di çend cîhan de peyva Şêx, wek ?êx derketiye. Demekê min li Stockholmê ji ni-vîskar Mehdî Zana pîrsî, çîma ew wusan bûye? Wî got ko: »Tê wê manayê ko hin heval hene ji şêxan hez nakin!«. Xwast bêje ko kemasîne ya wî ye. Belkî ya çapxanê, belkî ya redaktoran e, belkî ya nivîskar e... Belkî jî ya hersêyan bi tevahî be! Nizanîm. Lê belê kemasîk heye ko mirov zane kemasîya weşanxanê ye. Ew jî bîrkirina terîxa çapa herdu pirtûkan e. Ji aliyê dîrokê de kemasîke mezin e. Pişti salan divê bêzanîn ko ev berheman kîjan salê der çûne. Ji bo xwendevanen meraqdar qet nebe li vir be jî ez divê bidim diyar kirin ko ev herdu pirtûk jî di sala 2001-ê de li Swêdê çap bûne!

✓ Rojek li Silîvayê

Bihara sala 2001-ê, meha gulanê, ez çûm û li çend bajarêne Kurdistanê geriyam, wek Diyarbekir, Mêrdîn û Riha. Rojekê çûme Silîvayê jî û min ev bajarê qedîm bi çavêن xwe dît. Cara pêşin bû ko ez li vê deverê di-geriyam. Çend sûret kişandin.

Dema ez çûme Silîva li vir min

Hemû kesên ko li derdorê Silîva têngirtin û li Diyarbekirê têngirtin bêrev kirin. Paşê hinek ji wan têngirtin idam kirin. Hinek ji wan nefiyê Manîsa, Bursa û İzmirê dibin. Hersê peyvîn navê romanê: **Me Helal Bikin** cara pêşîn ji devê girtiyêngir Diyarbekirê derdikeve, yêng ko wê di nav çend seetan de bêngidam kirin. Ev peyvîn xatirxwastinê wusan jî paşê dema nefikirinê (sergumê) dema ko refêngafîlyen kurdan li Manîsayê ji hev têngirtin, ji devê wan derdikeve û careke din têngirtin tekrar kirin. Nefîbûn (sergum) bi van gotinan ve wek idamê tê zimên. Xelqê nefîbûn wek mirinê dîtiye. Riya hat û nehatê ye. Filozofiya xelqê derbarê xerîbî, nefikirin û tengezariyê de bi kurtî wusan hatiye zimên: **Me Helal Bikin!** Navê romanê navekî gelek bi îsabet e. Romana **Me Helal Bikin** pirtûka eş û kederê ye. Pirtûka hesretê ye. Çav hertim li rîne! Di van salan de çawa têzanîn bi hezaran mirovîn reben û bêguneh nefiyê Anadoliya Navîn û Anadoliya Rojava bûne. Ev pirtûka Mehdî Zana derbarê nefîbûnê de berhemeye gelek balkêş e.

Lê belê pirtûka duwemîn ya bi navê Çarşıya Silîva zêdetir dişibile pirtûkeke bîranînan. Mirov dema vê pirtûkê dixwîne kêfa mirovan tê. Bîna mirovan fireh dibe. Mirov derbarê Silîva de gelek tiştan fêr dibe. Berhemeye hînkâr e. Çawa di destpêka pirtûkê de nivîskar dide diyar kirin, bi nivîsa vê pirtûkê ew dixwaze herdu zarokên xwe, desten wan bigre û gelek zarokên mayîn yêng kurd li Silîva bigerîne. Ne tenê zarok, nivîskar me salbihuriyan jî dibe

Silîva. Ci gereke xweş. Nivîskar bi xwe jî careke din dixwaze bi alikariya bedewiya peyvan here bajarê zaroktiya xwe. Mehdî Zana wek dilsazekî, doxtorekî dixwaze wan birîn, eş û kederê ko di pirtûka **Me Helal Bikin** de derbas dibin, bi alikariya pirtûka duwemîn **Çarşıya Silîva**, bipêce û xweş bike.

Nivîskar di **Çarşıya Silîva** de me kuçe - kuçe, quncik - quncik li Silîva digerîne. Ji salên 1950'yi vir de gelek şexsiyet, bûyer û dorberên Silîva li me dide nasandin. Xorten ko xwîna wan hevraz davêje di van salan de dixwazin dinyayê biguhirînin, sero-bino bikin. Qedera dinyayê, qedera Tirkîye û qedera Kurdistanê di van salan de çawa em dibînin di dikan, qawexane, çayxane û karcîhê Silîva de hatine tayîn kirin. Sohbet û giftûgoyê van salan karibûne qedera dinyayê jî tespit bikin. Em di vê berhemê de rastî nifşeye romantik tê. Di vê çarçevê de Niyazî Hosta - hevkarê nivîskar xemlekê dide pirtûkê. Him uslupa Mehdî Zana û him jî mîzahkariya Niyazî Hosta - yek ji qehremanê pirtûkê - kalîta pirtûkê mirov dikare bêje ko zêde dike.

Nivîskarê pirtûkê Mehdî Zana bi xwe ji Silîvayê ye. Bi salan di zîndan û girtîgehan de jiyanâ xwe derbas kiriye û işkence dîtiye. Di salonên dadgehan de hatiye û çûye, bi zimanê kurdi ifadeyên xwe dane. Rûmeta kurdi cara pêşîn li Tirkîye di wan salan de zêdetir bilind bûye. Mehdî Zana di vê merhalê de roleke mezin lîstiye. Xanîma wî ev çend salin çawa têzanîn li paytextê Tirkîye, di zîndanê de ye. Salen xwe dipê.

derketine holê. Bi sedan sîkkeyên (pere) merwaniyan li Swêdê hatine dîtin ko di sedsala dehan de hatine Swêdê.

Çawa em dibînin di van salan de dewletok û medeniyetên giring yên kurdan pêk hatine. Piştî van gerên dîrokî bi rastî derbarê Silîva de ev çend sal in heyranîk li bal min pêk hatiye. Ez bawer dikim ko piştî pêwendiyêن kurdan û vîkîngan derketin holê, Silîva zêdetir bala min kişand û silîvaheziya min zêdetir bû. Ji ber ko gelek sîkkeyên ji dewra merwaniyan li Swêdê hatibûn dîtin. Bi taybetî jî li girava Gotlandê. Mirov dikare bêje ko Gotland û Silîva angorî min bibûn du dever û du navçeyên dostanetyî û biratiyê. Di dema amadekirina vê xebatê de min mîze kir ko navê Silîva (Majafariqîn) di çend çavkaniyêن kevn yên swêdî de derbas dibe. Silîva li Swêdê ji zû da hatibû nasîn. Derbarê Silîva, merwaniyan û vîkîngan de zêdetir zaniyarî di lêkolîneke min de cih girtine. (Binêre: Rohat Alakom, Svensk-Kurdiska kontakter under tusen år - Pêwendiyêن kurdan û swêdiyan di nav hezar salî de, APEC, Stockholm, 2000).

✓ Literatûra Silîvayê dewlemend dibe

Di sala 2001-ê de li Stockholmê du pirtûkên Mehdî Zana derbarê Silîva, di nav weşanên APECê de derketin. Navê ya yekemîn **Me Helal Bikin** û navê ya din Çarşıya Silîva ye. Pirtûka **Me Helal Bikin** bûyerên piştî salên serhildana Şêx Seîd tîne zimên. Lê belê Çarşıya Silîva zêde-


tir pirtûkeke otobiyograffîk e. Bi stîleke têkil, bi stîla roman, bîranîn û dîrokî ve hatiye nivîsîn. Pirtûk me dibe salên piştî 1950'yi. Salên zaroktî û xortaniya nivîskar ko li Silîva derbas bûne. Herdu pirtûk jî him ji aliyê kronolojîk de, him ji aliyê temayê de mirov dikare bêje ko hev temam dikan. Ji ber ko tema herdu berheman jî Silîva ye.

Pirtûka yekemîn **Me Helal Bikin** bi hecm û firehbûna xwe ve pirtûkeke ne zêde fireh e. Min carekê de xwend. Mirov naxwaze dewama wê bîmîne rojeke din, eger di nav wê rojê de tiştekî giring neqewime! Di vê romanê de girtin, dardakirin û nefikirin heye. Sal sala 1926-an e. Serhildana Şêx Seîd têk çûye. Hikmeta Tirkîyê dixwaze koka kurdan bîne. Facîa, afat, qeza û belayê mezin di van salan de li dorberê Diyarbekirê têr serê kurdan. Nivîskar di vê romana xwe de me dibe devera Silîva. Vê eniya serhildanê li me dide nasîn. Şêx û begêن kurdan dor bi dor têr girtin. Yek ji wan jî Şêx Ezîz e. Dema leşker têr û dora gund digrin, Şêx Ezîz zû da ji gund derketiye û çûye xwe veşartiye. Piştî gelek tirsfirandin û tehdîtan, qomandarê leşkeran bîryara girtina du zarokên Şêx Ezîz dide. Ev zarokên piçûk, yek heftsalî ye, yê din dehsalî ye. Lîstik kivş e: Heta bavê wan teslîm nebe, ev zarok jî nayêن berdan. Zarok bi peyatî, pêxas didin pêsiya leşkeran, bi seetan rê diçin û di dawiyê de têr navça Silîva. Hikmeta Tirkîyê wan digre û davêje girtîgehê.

Ev romana dîrokî bi serpêhatiya van herdu zarokan ve dest pê dike.

Silîva dikeniya

bajarê ko bûye şahidê dîrokê



Rohat Alakom

Bajarê Silîva (Martyropolîs, Mayafarîqîn, Fariqîn, Sîlvan) bajarekî gelek kevn e. Niha bi Diyarbekirê ve girêdaye. Li bakura Diyarbekirê dikeve. Dema yek ji dûr ve li Silîvayê mîze bike wê tavilê fam bike ko çima Silîvayê di dîrokê de roleke wusan mezin lîstiye. Bajêrê Silîvayê, ev çiyayên asê ji xwe re kiriye sîper. Mirov dikare bêje ko van çiyan girin-giya bajêr zêde kiriye. Silîva di dema imparatoriya Romayê de wek cepexanekê dihate hesibîn. Dema min dest pê kir kontaktên kurdan û vîkingan lêkoland, ji nişkê va bajarê Silîva derkete pêşberî min. Bi sedan sîkkeyên ko berî hezar salan ji Silîva hatibûn Swêdê ji aliyê arkeologan de dihatine dîtin. Silîva kîder? Swêd û Bakûr kîder? Silîva paytextê Mîrîtiya Merwaniyan bû. Vê mîrîtiya kurdan di navbera salên 983-1085-an de berdewam kiribû û li vê deverê hukimdarên kurdan yên navdar gîhiştibûn. Qeyserê Bîzansî Basilieos II li dora salên 1000'-î bi parêzkarên xwe - bi vîkingên bakûrî - ve di van salan de dema ji seferekê vedi-gere, Merwaniyan ziyaret dike. Delîlên van minasebetên kevn li ser axa Swêdê

BI HISTIRÊN ÇAVAN TÊN NIVISANDIN HELBESTÊN ME

*Lı girtixanan
li girtixanê reng û tari
li pey der û pêçikên hesini
li pişta diwarênil bîlind
di nava kêzik û müşkan da
tê çandin rovê edebiyata me
û dikemile diroka me*

*Bî histiran
bi histirêن çavan
bi histirêن çavêن zarûkan
ku dirijin li riya bavan
li riya bavên li girtixanan
tên nivisin helbestêن me
û dikemile diroka me*

*Bî axinan
bi axinê Jinêni ciwan
bi axinê bûkêni ter û teze
ku tên kuşandîn ji kûraviya dilan
li riya malxoyan
li riya malxoyêni li girtixanan
tên raçandîn çirokêni me
û dikemile diroka me*

*Bî xwinê
bi xwina keçen xama û xortan
bi xwina pêşmergeyêni qehreman
ku tê rêtîn li serêni çiyan
li serêni çiyayêni Kurdistan
tên afirandin marş û stranêni me
û dikemile diroka me*

*Îlhama me
ne ji lêvên sor e
ne ji çavêni kiydayi ye
ne ji ji demêni guli ye
Histirêni çavan e
axinêni dilan e
xwina keç û xortan e
kana ilhama me
sira li me
û periya dilê me*

11-09-1971
Girtixana Eskeriyê li Amedê

pir dihat hez kirin, ji her aliyê Ewropayê ji wî re name dihatin; ji kitêbên wî weha dihat hez kirin ku, piştî weşandina wan a hefteyekê a li Parîsê, kopyayêن wan ên korsan li Brukselê derdiketin.

Bi baran pere qezenc dikir, bi baran pere xerc dikir.

Rojekê, ji jinikek esîlzade ya Polonî* nameyek stend. Di bandora jinika esîlzade de ma û bê ku wê bibîne aşiqî wê bû, da ser rê, çû ku jinikê bibîne.

Jinik bi mêt bû, belê Balzac ne yê ku guh bida tiştên wilo.

Wî, tu xerabî di destxistina jin û pereyêن xelkê de nedidît.

Bi dû domandina têkiliyên ji dûr ve yên bi nameyan, pişti mirina mêtirkê jinikê, ji nêzîkvetir û pirtir hevdû didîtin. Belê jinikê ne ji mirovê qelew ê şanîdar ê rengo mengo yên ji gunditîyi xelas nebûye, ji Balzac ê navdar hez dikir.

Wî mirovê ku ewqasî mirov qenc nas dikir û li ser wan vedigot, her hal haya wî ji vê rewşa jinikê ji hebû. Belê zanînê di nivîsînê de carinan têra zanîna jiyanê nedikir.

Ew xebata bi lezeke tirsehêz, pêncî qedehêن qahweyê ku bi şev dihat vexwarin; laşê wî û dilê wî westandibû. Erê, êdî Balzac westiyabû. Belê ne xema jina ku wî jê hez dikir bû. Beriya mirina wî bi du salan jinikê ew derxistibû ser rêuîtîyeke dirêj; dixwest şanîdariyê bike, dixwest tama jinbûna Balzac bistîne.

Ji bo şanîdariyê Balzac emrek xerc kiribû, jina ku wî jê hez dikir ji bo şanîdariyê jiyana wî ya mayî xerc dikir.

Bedenekê têra du musrifêñ hezkiriyê şanîdariyê nekir.

Westiyayî û nexweş bû.

Akademiya Fransayê jî endamtiya vî hosteyê bê emsal ê edebiyata dinyayê qebûl nekir, rûmeta ku wî pir dixwest nedanê, tenê Victor Hugo, bi helwesteke ku bi wî diket, endamtiya Balzac diparast.

Hugo, qîmeta wî zanîbû, bêşik ên din jî dizanîbûn, belê ew ne bi qasî ku karibin qîmetê nas bikin, bi hêz bûn.

Dema nexweşîya wî zêde bûbû, bi jinika ku wî jê hez dikir re zewicî.

Dema nexweşî lê giran bû, yên ku hatibû serlêdana wî, dîsa Hugo bû.

Çû odaya ku tenê mûmek lê pêketî bû, li ber serê Balzac rûnişt û bi destê wî girt, ji ber ku Balzac nikarî bipeyiviya qet tiştekî nepeyivîn. Carrêkê tenê çavê xwe vekir û li Hugo nêri.

Pişti du rojan ew mir.

Pêncî û yek salî bû.

Heftê û çar cild roman nivîsî bû.

Li ser tirbê, axaftina "Birêkirina Bêdawîtiyê ya Dehayekî" Hugo kir.

Ji ber ku, mîna xwedê henekekê bike, ev mejiyê ku di nav mejiyê herî mezin ên dîroka mirovahiyê de bû, di bedeneke şaş de hatibû afirandin, Balzac, bedela vê henekê şûna jiyanekê şad û dirêj, bi jiyanekê kurt û pir xemgîn da.

Di tevahiya jiyana xwe de xwestibû; dewlemend, esîlzade û bi rûmet be.

Tu jî, bi dest neket.

Bû nivîskarekî mezin.

* Kontes Eveleyn Hanska

derheqê madenan de tu agahiyêne wî tunebû dîsa jî, ci pereyêne ku wî hehta wê rojê kar kiribû, xist wê madena zîvan. Belê ew mirovê ku wî ji mecbûrî ocaxa madenê firotê, bû xwediyê malhebûneke mezin.

Tebietê nivîsandina vî mirovê ku ber bi sîh saliya xwe ve, êdî biryara bûyina nivîskarekî cidî dabû, nedîşibiya ya tu kesan. Nivîskariya wî, berevajî jiyana wî ya nexwes a şanedar, lixwekirina rengo mengo ya bêzewq bû.

Mala wî ya xemilandî bi alavênu buha mişt bû, belê odeya wî ya xebatê hema bêje vingîvala bû. Maseka wî ya biçük, a ku bawer dikir jê re şensê tîne û bi ku de diçû bi xwe re dibir; kaxezên wî yê her dem ji heman celebî; mîna kaxezên wî, pênnûsên her dem ji heman celebî u ocaxa qahveyê ku li gor vegotinan di şevê de pêncî tas vedixwar, bêtir tu tişt tunebû.

Bi wê ingirokiya xwe ya nakeve aqilan, ji sê taxên Parîsê, ji sê dikannê cûda, ji sê celeban qahwe dikirî û bi pîvaneke ku tenê wî pê dizanî tevlihev dikir û weha dikeland û vedixwar. Ji xêndî wê, tu qehwe venedixwar û destûr nedida ku tu kes qahweya wî çêbike.

Û li quncikeke odê peykerekî Napolyon ê cilsî hebû.

Heyranê Napolyon bû, digot, "Tiştê ku Napolyon bi şûrê xwe destpêkiriye, ezê bi pênuşa xwe bi-qedînim."

Saet tam di duwazdehê şevê de dest bi nivîsinê dikir û derveyî bêhnvedanê çêkirina qahveyê, bê navber heta heyştê sibê dema ku navmaliya wî dihat, dixebeitî; saet di

heyştan de taştêyeke sivik dixwar, rûpelên ku ji weşanxaneyê dihat di ber çavan re derbas dikir, karêne xwe yê rojane diqedand, nameyêne xwe dinivîsî, ji bo giranî negre ser laşê wî, nîvro firavîneke sivik dixwar û heta saet pêncê evarî nivîsên ku roja berê nivîsibû sererast dikir. Ji bo Balzac, sererastkirina nivîsan, ji nivîsê bêtir biêş derbas dibû. Carinan rûpelekî nivîsê bîst caran sererast dikir.

Di heyştê şevê de radiza û ji bo ji nû ve bixebite di duwazdehê şevê de radibû.

Heta kitêba xwe diqedand; bi mehan, bi vî awayî, bê ku bi tu kesî re biaxife û bê ku carekê jî di şibakê de li derive binêre, bê navber dixebeitî.

Piştî ku kitêb diqediyâ; demeke dirêj, rojê hîjdeh saetan radiza, xwarinêne giran ên bi wî laşê wî yê qelew diket, dixwar; bi jinêne ku heyrana kitêbên wî û aqilê wî bûn re radiza.

Digot "ez," divê, "ez ji mirovên din bilezir bijîm."

Di vê gotina wî de rastî hebû. Çimkî ew, ji mirovên din bêtir û mîna hovan dixebeitî û ji bo navbera xwe û yê din bigre, diviya di jiyanê de jî, ji yê din bi leztir, bibeziya.

Di vê jiyana xwe ya kurt de, bi vê tempo ya xwe ya nayê gotin û bi qasî ku tê zanîn heftê û çar roman nivîsî.

Heftê û çar cildên ku pirtirêwan di nava dîroka edebiyatê de, yêner herî rewnaq bûn.

Navekî pir mezin bi dû wî ket; bi taybetî ji aliyê xwendevanêne jin ve

"ew mir."

Alîkarê wî, ji ber vê xebera mirinê xemgîn dibe, vê carê pirsa ku kî mîriye dike.

Tê fêhmkirin ku yê mirî, gernasê romana Balzac a dawîn e.

"Mîrza Balzac, ma ne we bi xwe, ew nivîsibû."

"Çi ferq dike, ew mir."

Ew mirovê herî muhteşem ê dîroka ser rûyê erdê, ku bi mirina gernasê ku wî bi xwe afirandiye digiriya, mîna xwedê henekeke biêş kiribe û bi qasî ku mirov dikare bibêje derî adetî hatiye çêkirin, xwediyê hêzêke mezin a afirandinê bû. jiyana wî di nava nakokiyân de diçû û dihat.

Ji ber ku kurê gundiye kî ku paşê dewlemend bûbû, ji ber xwe şerm dikir, şerma wî lê bûbû mîna nexweşyeke derûnî. Bawer kiribû ku, wê bikaribe raboriya xwe, mîna jiyana gernasen romanen xwe, ji nû ve vejîne. Ji xwe re raboriyeke derewîn afirandibû, mîna esîlzadeyan li navê xwe pêveka "de" zêde kiribû. Ji bo gundîtiya xwe veşere, bişkokên zêrin li kincen xwe yên rengo mengo yên herî buha yên dinyayê dixist û li xwe dikir, go-palên destik zîvîn bikar dianî, erebe-yên herî buha yên dinyayê dida çêkirin. Bi her hewldanen xwe yên ji bo xwe esîlzade bixuyîne ku dilê mirov pê dişewitî, dibû pêkonokê ber devê esîlzadeyan û hemkarên xwe.

Ew nivîskarê bêheval; bi rûyê xwe yê werimî, bi bedena xwe ya qelew û bêfesal ku dirûvê muxtarê gundekî pê diket, gava çirûskên wî mejiyê bêhempa yê di wê bedena xerîb de, li ser rûpelan dibiriqû, qerfîn ku li wî dihat kirin û zikreşiyen dilnexwazan pirtir dibûn.

Çi ecêb e ku vî nivîskarê bêfasal ê ku sertara ciyayê dinyaya nivîskariyê bû, di seranserê xortaniya xwe de karê nivîskariyê biçûk dîtibû.

Dixwest, ew; esîlzade be, dewlemend û birûmet be.

Mixabin wî, di tevahiya jiyana xwe de her sê tişt jî bi dest nexistin.

Di xortaniya xwe de; hêza afirandina ku di dilê wî de dikeliya, bi nivîsîna romanen erzan ku îro jî tu kes pê nizane, bi ber bê de berda.

Qîmet dida nivîsên xwe, hewl dida ku pera qezenc bike.

Ji bo wî, ji nivîskariyê bêtir, bazirganî balkêş bû. Wê ji xwe re bi peryen ku qezenc kiriye, nasnameyeke maqûlan bikiriya û wê ji raboriya xwe ya ku wî jê şerm dikir, azad bi-bûya.

Tıştekî xerîb e ku, ew aqilê wî yê muthîş di keşifkirina karênu ku pere tê de heye jî derdiket holê. Karênu ji bo qezenckirina pera ku wî hildibijart, hercar rast derdiket. Belê qabîliyeta wî ya qezenckirina pera tunebû.

Weşanxaneyek vekir.

Ji girtina qeyd û quydan aciz bû, belawela bû. Di demeke kurt de, di bin deynan de ma, top avêt. Di wê demê de, vekirina weşanxaneyê fikrek di cih de bû. Mirovê ku weşanxaneyâ wî jê kirî, di demeke kurt de dewlemend bû.

Pâşê kovarek derxist. Helbet di kovarê de jî top avêt, belê derxistina kovarê jî hilbijartineke rast bû, yên piştî wî kovar derxistin gelek pere kar Kirin.

Carekê ev dînîtiya xwe pêşdetir bir, ji mirovekî ku di rîwîtiyekê de ew nas kiribû, ocaxeke madena zîvan kiribû û dabû pê çûbû Îtalyayê. Di

xwe ya kesyetî, di jiyana xwe ya edebî de jî, bi hêrs û bi daxwazeke bilind tevdigeriya. Balzac dixwest, ji destpêkê heta wê rojê, dîroka Fransayê mîna rêzeromanekê û bi zimane-kî destanî binivîsiya. Dît ku ev karekî gelekî zehmet e. Biryara xwe guhert. Wê dîroka 60 salên dawî binivîsiya, ji şoreşa Fransayê heta wê rojê. Û nivîsî. Romanên wê demê bi navê "Pêkenîna Mirovatiyê" kom kir ser hevdu. Nivîsên Bal-

Dante. Dante, di

"Pêkenîna Xwedayî" de bûyerên dinya-ya wî alî nivîsîbû. Balzac, bûyerên vê dinyayê, yên vî alî dinivîsî.

Romanên Pêkenîna Mirovatiyê ji sê bêşan pêk dihat. Beşa yekemîn li ser dîmenan bû. Dîmen-

nîn; jiyana taybet, jiyana derveyî bajaran, jiyana gundan, jiyana Parîsê, jiyana siyasetê û jiyana leşkerî. Beşê duyemîn li ser lêhûrbûnên felsefeyê bû. Beşê sêyemîn jî li ser lêhûrbûnên derûnî bû.

Pêkenîna Mirovatiyê ji 137 berheman pêk dihat. Balzac, ji sala 1829 an heta sala 1848 an, di bîst salan de 95 kitêb qedandibû. Di romanên xwe de 2500 kesyetî afirandibû.

Rojekê Balzac, pêñûsa di destê xwe de davêje û ji ser maseya xwe ya xebatê radibe û dibêje, "Gelî dostan, min silav bikin. Ez dahî me." Wî,

Rojekê Balzac,
pêñûsa di destê xwe
de davêje û ji ser maseya
xwe ya xebatê radibe û dibêje,
"Gelî dostan, min silav bikin.
Ez dahî me." Wî, *teşeyeke (form)*
romanê ya nû keşif kiribû.
Kes an kesên ku di romanekê de
biruh bûbû, wê di romanekê
din de jiyana xwe
bidomanda. Bi vî awayî
wê romanên wî, di
çarçoveyeke firehtir de
jiyana rastîn derxista
ber çavan.

teşeyeke (form) romanê ya nû keşif kiribû. Kes an kesên ku di romanekê de biruh bûbû, wê di romanekê din de jiyana xwe bidomanda. Bi vî awayî wê romanen wî, di çarçoveyeke firehtir de jiyana rastîn derxista ber çavan.

Wext hat. De êdî werin em guh bidden Ahmet Altan ku bê ew Balzac, bi ci çavî dibîne û bi ci awayî vedibêje;

Ji bo wî tê gotin ku, "ew xwediyê qudreteke weha ye ku, yê piştî

xwedî, li ser rûyê erdê, he-
rî pirtir mirov afirandi-
ye." Bi rastî jî mirovên ku wî di romanen xwe de nivîsiye, bi mirovên; fedekar, ên nankor, ên hêrsoyî, ên bihesab, ên aşiq; bi mirovên; bazirgan, ên gundî, ên bajarî; bi jin û mîr, bi jinêntol, ku werin ser hevdu û li cîhekî kom bibin, wê bi qasî ku navçeyeke bi navê wî bê bîranîn dagirin.

Wî, mirovên xwe bi dildari-yekekê, bi pirxwazekê, heta mîna xwe-kujuyekê diafirand. Û her ku mirovên ku wî diafirand, qerebalix dibûn, tiştek ji wî kêm dibû. Wî, ji wan hez dikir. Her ku romanek dinivîsî, bi tevahî ji dinyaya rastîn diqetiya, ew di romanen xwe de dijiya. Bawer dikir ku romanen wî, ji heyatê rastîr e. Carekê, gava alîkarê wî dikeve odehya wî, dibîne ku ew, digrî. Li gor vegotinan, alîkarê wî jê dipirse,

"Mîrza Balzac, hûn çîma digrî?"

Balzac, bi niqîrîskên girî dibersivîne,

ser hevdu, mirov careke din bi kûrbûna wî dihese û mirov têdigihîje ku ew ji nivîskarekî wêdetir, filozofekî hemdem e.

Ahmet Altan di vê kitêbê de, bi navê "Mutsuz Dev" Balzac nivîsiye. Bi carekê niqutî dilê min ku ez vê nivîsê bi xwendevanê Gulistanê re par bikim. Belê dixwazim beriya vê nivîsê, piçekî behsa Balzac bikim û wî bi we bidim naskirin an bînim bîra we.

Honore de Balzac, di 20 ê Gulana 1799 an de, li bakurê rojavayê Fransa yê, li bajarê Toursê hatiye dînayayê. Bavê wî yê Bernard François Balzac, ji malbateke gundî bû. Di dema Louis ê XVI. û di dema Napolyon de 43 salan karmendiya dewletê kiriye. Diya wî ya Laure Sallambier, Parîsî bû û mîrê xwe yî gundi biçük dîdît. Li hember zarokên xwe jî pir zivir û hişk bû.

Diya wî, ji bo xwendinê Honore yî biçük bi çiktenê dişîne bajarekî gelekkî dûr. Di nava şes salan de Honore, carekê jî naçe malê. Diya wî jî tenê carekê diçe serlêdana wî. Bi vî awayî Balzac, bê hezkirina dê mezin bû. Bavê wî ji xwendinê zehf hez dikir û ev yek sedema ku Balzac jî ji xwendinê hez bike. Zaroktî û xortaniya wî, salên wî yên herî biş e. Ji dê û bavê xwe, ji xuşk û birayên xwe bi dûr, bê ku jiyanâ malbatî nas bike mezin bû. Balzac, tenêbûna xwe bi xwendinê tije dikir. Li ber bavê xwe digeriya ku wî bibe malê. Paşê dilê bavê wî hew deyax kir û ew hewand malê. Balzac çû Toursê, mala bavê xwe. Dû re, bi malbatî çûn li Parîsê bi cîh bûn. Balzac li Zanîngeha Sorbonê dest bi xwendina hiqûqê kir.

Bavê wî dixwest ew bibe hiqûqnase-kî çê. Belê dilê wî di huner de hebû, çavê wî li edebiyatê bû.


Dawiya salên biş û elem nedihat. Bavê wî zor dîdayê ku ew ders û kitêbên hiqûqê bixwîne. Wî jî bi dizî, kitêbên edebiyat û felsefeyê dixwend. Tew qehra diya wî nedihat kişandin. Diya wî di her fersendê de henekê xwe pê dikir, ew biçük dixist. Di sala 1821 an de tayîna bavê wî derket bajarekî din. Balzac li hember malbatê serî hilda û bi wan re neçû, ma li Parîsê. Dibe ku li Parîsê bê pe-re û birçî bima. Belê wê biketa nav jiyanâ edebiyatê.

Balzac li Parîsê, li taxek feqîr, di nava tunebûnê de, bi 120 Frank ê ku bavê wî jê re dişand debara xwe dikir. Ango rojê çar Frank, ku heqê du nanan bû. Dest bi nivîsînê kîribû. Hêj berhemên edebî nenivîsî bû. Ji bo debara xwe, bi navekî din kitêbên polîsî û romanên erzan dinivîsî. Ji bo, ji vê jiyanâ edebî ya bêwate derkeve û romana xwe ya yekemîn a bi rastî edebî binivîsiya hêj şes sal jê re divuya.

Romana yekemîn a bi navê "Chouan ên Dawîn" di sala 1827 an de nivîsî. Pişti şoreşa mezin a Fransayê, ji kesên ku li herêma Bretanya yê hevalbendiya Qrêl dikirin û li hember sistema nû ya komarê serî hildabûn re digotin Chouan. Balzac di vê romanê de, di çarçoveya bûyerîn wê rojê yên dîrokî de çîrokek evînê nivîsî bû. Ev roman bi navî wî yê rastîn hatibû nivîsîn û bûbû bingeha hunermendiya wî, ya ku bi çavdêriyeke kûr û bi hêza xeyalan neqîşandî.

Nivîskarê mezin, bi qasî jiyanâ

Balzac



Osman Ozcelik

E Ez dixwazim ji we re tiştekî iti-raf bikim. Dixwazim li xwe mi-kur bêm. Ez nebêjim bi hezaran belê, min bi sedan kitêbên edebî xwendine. Nizanim ji bo çi, min heta niha ji **Honoré de Balzac** tu tişt nexwendibû. Min di jiyana xwe ya edebî de gelek kêmâni didît. Tu nabê yek ji wan kêmâniyan jî nexwendina Balzac, nenaskirina vî nivîskarê mezin ê ku ronahiya xwe daye hemî nivîskarê dinyayê bû.

Mîna gelek kesan ez jî, carinan du sê kitêban bi hev re dixwînim. Ku ji yekê aciz dibim, dest davêjim yeka din. Dîsa weha bû. Xwendina min a romana "**Goriot Baba**" ya Balzac û kitêba **Ahmet Altan** a bi navê "**Kristal Denizaltı**" ku ji 32 nivîsên ceribandinê edebî pêk hatiye, ket heman demê.

Ahmet Altan, bi romanên xwe û bi nivîsên xwe yên ceribandinê edebî xwendevanan dîl digre. Ku carekê tu ket nav lepêن wî, nema tu dikarî pêşîra xwe ji destê wî xelas bikî. Ew xwe berdide kûraniya dilê mirov; hestêن mirov ên ne-nas, ên jibîrbûyî tevdide, hestan ji hevdu dineqîne, zelal dike. Mirov bi xwendina wî; aliye xwe yê qeşagirtî, binaxkirî, jê-şermkirî dibîne û mirov bi kesayetiyêن xwe yên din re, rû bi rû dibe. Bi ceri-bandinê wî yên ku di vê kitêbê de hatine

eleqe bibim û nanêk, tiştêk bidim wan û bizanin ku min ji wan ra gotiye aferim. Ez gava guh nadim wan, melûl dibin, hist e pist bi wan dikeve, dûvê xwe dikin nav ranêن xwe û medê xwe dikin tût didin dierinin. Lê zû ji bîr dikin. Kû ji bîr nekin, tû bawer bikî, ew carêk din naçin bi pey gur û dizan nakevin û bi eşq û şewq vî pezî naparêzin. Tiştekê xerîbe, kû ez wan teqdîr û perû bikim nekim; min hê nedîtiye kû xwe ji işê xwe bidin paş, sisît û xiyanetê bikin. Ew jî eynî mîna min in, sadiqin û diristin..”

Min bizinstewrê anî gund, Mamê Seîd wê şerjê kir, Dadê Gulê xwarînêن xweş çêkir, me Ebdilbaqî, Hessen Çinar û Veysî Oran mîhvankir.

Min di wan dem û zemanañ da tiştêk ji Emê fam nedikira. Kesî min jî teqdîr nekiribû. Min jî kesî şehnaz nedikira. Kesî ji kesî ra nedigo, mala te ava. Teqdîr tine bû, xizmet jî pir kêm bû di wan wext û zemanañ da.

Jin mîrê, bab kurê, bira keçê herkesî hevdû tenkîd dikira, tenkîd na, teqbîh dikiran. Bira bi çavên xizmetkaran li xwişkên xwe dinêriyan. Bab ji kurêن xwe ra hiç tiştekê xweş nedigotan. “Tû nabî merî, ji filanches şerm bike, tû weka kûçikan jî nabî, çakûçê te pîse, şîrê te herame” û wek van bi hezaran tenkîdêن baban li ser kuran bû. Em dirêj nekin.

Ji rehmetiyê Mela Mistefa yê nemir yek dipirse ka Serek Komarê Fransa Degol lîderek alemî ye an na? Mela Mistefa dibê, “Xwezil Degolbihata şes heyvan mezintayî li Kurdan bikira; wî yê wê gavê bidîta ka alemî ye an na..” Ev çîroka “Emê Şivan” e, lê ev çîrok pir tê dirêj kîrin. Ev gazin û gilî wisa henin, wisa henin kû di kitêbanda nahewin.

Gelo kû Emê li gundekî Parîsê 30 salan şivantî bikira wê bibiwa şivanekî alemî an na? Ez dibêm bi hindikayî wê heykelê Emê biketa nav rêza Şivanêن navdarêن vî welatî.

Ferhengok:

Dúajo: Cigirê şivan. Pez ji paşva diparêze.

Babosî: Dikeve navbera Xerzan û Zirkan û Bayikan. Comanî merkeza vê eşîr û here-mê ye û niha Belde ye.

Eymaro: Li ser riya Diyarbekir û Bedlisê ya kevin li ber Kozlokê.

Girê Meyiran: Çiyayêن navbera Kozlok û Ferqînê. Roja Minar di ser vî çiyayî da di-çe ava.

Gurdilan: Çiyayê pişta Kurtelan û navê mintiqê ye. Mirekiyeke me ya qedîm e.

Kevir, Heste, Pûşî: Agirjene, berê di şûna çeqmaq û niftikêda bû.

Kisik, Qewlik: Ev çentikênen kitan û qumasen berê, kildank..

Qaqjîk: Guleke wek Lale ye û sor e, ji xwînê sortir e.

Reman û Meymûni: Çiyayêن navbera Bişeri û Hesenkêfê ne. Remî li vir dijîn. Ciye neftî ye.

Siloqan: Eştreke niha bi Sêrtê va girêdayi ye. Li Zirkan binecî ne.

Sisêr: Ev sî milin, gazin, girin an çiyanin li Zirkan. Yek ya Minar e.

Zengan: Çiyayek büyük e, li navbera Xerzan û Qûbînê (Beşîrî) ye.

Teqbîh: Şikêndandin, biçûkxistin, pîskirin.

Şahnaz: Teqdîr (onurlandırma) pesindan.

li Minar bin; babê min kete karê wan û min şande çiyê kû bizinstewrêk bînim bo mîhvanan şerjê bikim.

Min kapikêk hilanî û ez li hêstira xwe siwarbûm min berê xwe da çiyê. Gava ez gihatime pez, çaxê dana bû, tav germ bûbû û li ser Kaniya Şorikê ketibû mexel. Emê Şivan li binê darekê mazî a mezin rûniştiyê, qerewile. Gava min nêzîkayî li pez kir, Devreş û Sêrop li xwe dan êrîşî min kirin lê Emê fersendê neda wan, ji wan ra işaret da, van herdû seyên qirase û bi xof, dûvên xwe xistine nav lingên xwe û xwe ji Emê ra xwar kirin û zîvirîne ciyên xwe tûtik dan.

Ez peya bûm min silav kir û Bizinstewrê ji Emê xwest, Emê rabû hêstirê min bi deviyêk va girê da, ço Bizinstewrê girt anî, kapik kire ber çoqilên wê û wê jî girê da û go “De ka rûnê bêna xwe bide; ezê ji te ra tasêk şîr bidoşim, şîrê xwe vexwe û oxira te ya xêrê bî. “Min midexele kir lê Emê guhdariya min nekir; ço tasêk şîr ê bi kefik tijîkir anî da min. Min tasê ji destê Emê girt û go: “Eva 25 salin kû ez şivanê vî gundî me, min hewçend şîr dotive û îkram kiriye, ez teze rastî vê pirsê hatim. Kû meriv şivanê pez bi, wê bivê nevê şîrê wî pezî vexwe û tilyên xwe biallêse. “Emê tasa şîr da destê min, ez rûniştîm, min firêk li wî şîrê şîregerm û têrlezet da, min xwest kû ji min ra li bilûrê bixe, Emê teke meke nekir, bilûra xwe ya kû bi darêva dalqandî bû anî û kilama Filîtê Quto û Mamê Emê ya Qîrê Bişeriye lê da û piştî meqamekê govendê ya “Girê-sîra bi şîr e” lê da û bilûra xwe dîsa

danî ciyê wê, rabû, bizinê bi kurtanê hêstirê va girê da û bi serê hêstirê girt û go: “De kerem ke were te si-warkim.” Min beriya xatirxwestinê ji Xalê Emê rehmetî spas kir û jê ra go: “Bi Xwedê Xalo, tû kêt dikî. Li van ciyan, li van keresiyan, vî şîrê teze û vê bilûra xweşavaz û tû pênc ferz nimêja xwe dikî, ev seyên gur-xenêq jî nahêlin diz û gur nêzîkî li pezên te bikin, ma idî tû ci divê yî?”

Emê bi qasî çend saniyan li min mîzê kir, serê xwe hejand û itirazê li min kir: “Ji te wisa dixwî ye. Dengê defê ji dûrva xweş tê. Yê kû ne'l malêk e, ne'l halê ke. De ka were ji min bipirse. Ez bi salan û salane li vî gundî şivanim. Tû dibînî ku ez pîrbûme. Eva çô nêzî sî salin ku şivanê Minariya me. Ez pezê wan xwedî dikim, ji dizan, ji guran û ji hemî astengiyan terşen wan diparêzim. Pezêk nexweş bikeve, an di rozdeyêk da bikeve, seqet bibî, ez wana weka weledekê ezîz derman dikim û hekîmiyê li wan dikim. Ev emegê kû min ji Minariyan ra heyâ iro daye, ku min ji Xwedê ra bida wê Rebbê Alemê min bi kincikên min va bavêta cinetê. Lê birazî, li vî gundî, ji bo xwedê min nedî kû rojêk bi xeletî yekî go mala te ava be an neava. Ji xwe nizanin ka ez merivim an, dûrî hizûra te, ez kûçikim. Meriv qedrê kûçikên xwe jî digire. Yeqîniya te bi Xwedê be, ev herdû heramên ku aniha li vir guhêñ xwe xistine cot û li min û te mîzê dikin; gava kû bi pey gurêk, rawilêk, dizêk an pêşnêk di-kevin û dadigerine cem min; dûvên xwe dihejînin û çavêñ xwe dixine nav çavêñ min heyâ kû ez bi wan ra

na Keviran”, wî, her şev li jinan belav dikira. Ev hene bi kêrî pizik û xişrûkên zarokan dihata û ne xelet-bim pişa wan qaîm dikira.

Mala şivan, nêzîkê Derêxanê, li pişt mala me bû. Emê çewan diçû malê, li devê eywanê, li ser dikê rû-dinişta, jina wî Eyşê û keça wî Emîne, nan û avê didanê, wî jî mijêñ kur li qelina xwe dixist û dîsa bersîva pirsên gundiyan dida. Heya nîvê şevê. Car caran kû fîrsat didîta bi qasî nîv sietan hûr û kûr li bilûrê dixista, dengê bilûra Emê bi ser gund diketa. Guhdarkirina bilûrê sinet bû; lewra Hz. Muhemed guhdariya dengê bilûrê kiribû.

Emê, hersal, bi serê biharê va heqê xwe yê salewext kifş dikira. Wî zemanî eflasyon tine bû. Ji ber vê salewexta wî zêde firq nedikira. Li gor jimara pez heq didanê. Jimara pez jî li xar û jor li dora 500-600an bûn. Malêk dû mal li gund pezê wan zêdebûn, şivanê wan jî ji malê bûn, wekî din hemî pez para Emê ketibûn. Emê kulav hilnegirta, zivistana me dijwar bû. Pez zivistanan nedîço çiyê; di bihar û payizan da jî Emê dewle li serê dar û beran xwe ji şiliyê diparasta. Eba û kumê wî yê tiftîk wî qenc diparastan. Rakima gundê me 1200-1300 e.. Li gundê me hinar çêdibin, lê hinêk salan sir li hêjîr û hinaran dide, hişk dike.

Emê, ne ji gund bû, digotan “Fetikî” ye. Fetikan, babekê Siloqan e. Babekê feqîr e, belakir nîne û cîranê gundê me ye. Navê gund Dêreban e. Dêraban e. Jina Emê jî Etmankî bû. Eyşê, jinekê jin bû. Minariyan hemî jê hez dikiran û qedrê wê digirtan.

Di warê hekîmtiyê da Eyşê jî alîkarê Emê bû. Eniya zarokan reş dikira, benikan dixista destê wan, zarokan ji nezerê xilas dikira.

Dû keçen Emê hebûn, lê kurên wî tinebûn. Ji ber bê kurbûnê, daweta xwe kir. Ji xwe ra ji Etmankan jî-nêk anî. Navê vê jinê Sito bû. Sito, keça Osmanê Emê yê Kîkanî bû. Ji Çaqê hatibû berdan. Çaqê pêra sere-der nekiribû wê berda bû. Welatê me jî, hemîşkan bi Çaqê ra sere-der nedikiran. Çaqê, merivêk nerehet bû. Lê bi Sito nikariya. Sito delal bû, lê dîn bû. Ziman dirêj bû. Ne ji kesî ditirsi-ya û ne ji kesî şerm dikira. Keçikekê Sito, ji Çaqê, pêra bû; kom û kulfet li emê giran bû; dengê wî û Sito bi şev derdiketa; Emê vê paşiyê neqe-dand Sito berda û ji peyî xeyala ku-ran fetîlî dîsa bi halê xwe yê berê razî bû.

Babê min; di navbera 1944 û 1954an da 10 salan mixtariyê li Minar û çar gund mezrayê wê kir. Wî zemanî kesî bi tirkî û xwendin-niv-sandinê nizaniyan, ji ber vê gundê dora me mixtariya xwe dabûne babê min. 1950an da hûn dizanin kû Demokrat Partî (DP) hate ser hikim. Li Tîrkiyê idî Reîsê Beledî û nûnerên parleman xelkê bijart. Hewceyiya partiya bi gundiyan çêbû û rojêk tê bîra min kû dû Mebûsên Sêrtê û serok Belediyê Bayikan hatin gund, şevêk li mala me mîhvân man. Mebûs yek Ebdîlbakî Erdem bû û ne xeletbim yek Weysi Oran bû. Serokê Belediyê Hesen Çınar bû. Serê sibê ji Bayikan telefon hat, xeber dane me kû ji Bayikan bi sivariya heywa-nan derketin tên Minar û ew şev wê

û fîzîkên wî nasdikiran. Ew alema pez, heya kû Emê negota "Hêêêê", ji derêxanê xwe tev nedidan û nediketan rê. Gava kû Emê işaretê dida wan, pez berê xwe dida warêñ çêreyê û li pey hev bi nîzamî rêz dibûwan. Ji Derêxanê heya kû diçûne Girê Mişmişê, Qerqeta an Wedîhesen bi qasî kilometrêk diherikiyan û piştî kû ji rê derdiketan li nava dar û ber û newal û berwaran belav dibûwan.

Emê ne tenê şivan, lê qralê pez bû. Pez jî bi îrada xwe qiraltiya Emê nas kiribûn. Her gav dû seyên wî hebûn, serê biharan, wextê zanê bi gelemerî dûajoyê wî jî hebû. Dûajo, ti li pey pez dima û heba tral û seqet kû bi paşva diman, wan dajota dighanda kerî. Di nîrê pez zanê da jî li karikan dibûya xweyî, derdiketa serê girêk li xweyê van karikan bang dikira ku bêñ karikên xwe bibin. Çend deriyêñ kû pez tê da herin çiyê li Minar hebûn; weka: Newala Digebalê, Newala Dêrê, Raspoqan û Riya Kîkan, lê hingî tê bîra min, pez di Derêxanê da diço û dîsa di vê riyê da dadigeriya gund. Emê, pezê xwe li hemî aqarê gund digeranda, lê her newal û zerîb û çiya û berwarêk; li gor isûl û qaîdeyêk hatibûn honandin û gava sibê pez ji rê xalî dibû diketa aqaran, wî pezî dizaniya ka iro berê wan li kû ye.

Emê, tim û daîm bi eba û sako û şal û êlek û cil bergên mezbût bû. Ji bo baran û tavê kumêk dida serê xwe kû ev kum bi çend awan bi kêrî wî dihata. Piştikekê hirî li piştê û egalek di ber sitwê wî de pêçayî bû. Qayısekê fireh li ser piştika wî girê-

dayî û bi vê qayışêva ne xeletbim çend heb kîsik û qewlik daleqandîbûn. Ewî titûn û qelûn û heste û ihtiyyaciyyen xwe yên wek xwê, kêr, derman, hena keviran, pûşî, dasik û tiştîn din di van kîsikan da bûn. Bilûra xwe dixista ber piştika xwe û çentikê wî yê nan û tasa wî ya kû şîr di-dote li pişta wî bû.

Êvaran, li roavayê, pez di Derêxanê da diketa gund. Gundiyêñ ku şolê wan bi Emê hebûn, ew di hatin Derêxanê. Lê wek din, ev pez bi carêk li taxa jorî û ya jêrî hemî bi serê xwe diketin kuçe û kolanan û diçoan qonaxên xwe. Heryekî riya mala xweyê xwe nas dikiran. Kû Xwedê neke yek ji vî pezî daqîqa dereng ket, hema yek ji malê baz dide derê Emê û dipirse "ka gişka beş li kû ma?" Carna Emê mecbûr dibû bi şev derdiketa diçû li peza windabûyî digeriya. Lê heya kû devê gur girê nedan û gumana wan qut nabûya nedîçûn çiyê.

Emê, êvaran kû pez taniya gund; bi gelemerî her şev nexwesêñ wî hebûn. Zarokên kû pizik di rûyêñ wan da derdiket an bi hîvê diketan an ditırsan dibirin pêsiyê; Emê ji alêk va rê dida ber pez, dîsiplîna pez diparasta û ji alêkva ji ji wan kîsikan, pûşî û kevir-heste dertaniya, agirê pûşî bi serserê zarokan va gurr dikira, ji alêkva destê xwe dixista ber zikê wanê biçûk bi demarêk digirta dişidanda heya vaqîn ji zarokan dihata û ji alêkva ji kêfa xwe ji van zarokan ra taniya, wan dikenanda û berdida. Emê her şev Hena Kevira, yanê ew heneya kû li çiyê bi beranova (Tetanva) çedîbî û em dibêñ "He-

ew milkê kû weqfa mela ne. Mela bi malîti tê gund, ew jî weka gundiye k bostanê xwe çêdike û li mala xwe ya taybet rûdine.

Xaniyê Emê Şivan ji mizgevt û hemû xaniyê gundiyan kevintir û qedîmtir bû. Mezinan digo "Minar, heft car xira bûye, hemî xanî kavil bûne, lê ev xaniyê kû şivan lê ye tişt pê nehatiye". Ji ber wê bû kû dîwarê pêsiya xanî sor dikira bibû wek qa-qîjok. Ew zangên mezin li ber tavê pijiya bûn. Nîvro tav dida vî dîwarê ber roava heyâ kû roj di ser Girê Meyîran da diçû ava. Gundê me berpare, di qontorê Çiyayê Sîserê da ye û pêsiya gund vekirî ye. Ev gundê kû niha nawenda Zirkan e, berî bi Navça Şêrwan va girêdayî bû, pişî kû Bayikan (1949) bû Qeza (Qeyme-qamî) vî gundi bi herêma wê va dane ser Bayikan, niha bê nehye Midûrî, li ser Bayikan a bi Sêrtê va gi-rêdayî ye.

Ji gundê me Kurtelan û Bêkend û çiyayê Gurdilan, Xerzan û Babosî û Hezzo (Kozluk) û Melefân, Weysilqeran û Çiyayê Mereto û bi rêxê Bedlîs va Çiyayê Qelemis weka ey-nik dixwiyên. Aqarê gund, Dodan, Weyselqeran, Kox û Mizê û Babosî weka kû perçeyêk ji gund bin em dibînin. Gava bi şev kamyonêk di Ey-maro da dertê an li serê Çiyayê Zengän, li Qîrê Bişêriyê û li Girê Mey-mûniyê ronahiya şantiyê, sondaj û qulyeyên Pêtrolan bi şev me yek bi yek dizanî ke evder û ber kûdê ne. Ji ber vê ye kû pişî ro di ser Sîserê da dide Minar û bi çend siet şûnda, rojê bi hindikayî 8 siet roj li hafa Minar e û dîwarê Minar bi tava xwe ya

germ disoje.

Kaziba sibê, beriya herkesî Emê diçû li meydana Derêxanê li ciyek bilind ciyê xwe digirta. Gundian mal û dû derê pagan an hefsîyan ve-dikirin û pezên xwe dajotin taniyane vê derê, teslîmî şivan dikirin. Gava vî gundê nêzî sed malan pez tanıyan Derêxanê û heyâ Emê işaret bida pez û bi rê biketa berê xwe bida çol û ciyê, dengê gundiyan û Emê bi ser gund diketa, ji ber kû mala me li ber Derêxanê bû, ew deng û ew niqaş û pirs û ken û girin hêja jî ji guhê min derneketine. Lê min tûcar, pez nebir û ez sibehan ranebûm neketim nava vê heytehata fecara sibeyê. Ev mera-sim weka sietêk dom dikir û etlebûn bi zimanê gundiyan nediketa. Ewê kû ji mala xwe xeyidibûn an bêna wan teng bibûn ya hêrsa xwe di serê Emê da, yan di serê yekê ji xwe qelstir da dertanîn.

Yekî digo "bizna kol nexwes e", yekî digo "tiştîra bel", yekî digo "gîskê hîlî", yê mayî digo "hevûriyê virnî", yek digo "bizinstewr", yê din digo "bizina dûqor" û dest bi pirsan dikiran. Emê hekîm bû, weterînêr bû, pispor bû û tenê ewî derd û êş û problema wan heywanan dizaniya. Bi rastî hêja xwedîyê pez devê xwe venedikiran Emê dizaniya ka tê çi bêjin, emê ji wan çêtir pirsên heywa-na dizaniyan û baş dizaniya ka kîja pez dikulê, kîja bê made, kîja nex-wes e.

Emê, hemî pezî bi nav nîşan nas dikira û her yek navekê xwe hebû. 500-600 pez, bi hûr û gir, bi nêr û mî, hemîşkan Emê nasdikiran, dengê wî, dengê bilûra wî, pêşna wî

Emê Şivan

Hingî kû ez fêmayî xwe bûm û heya 20 salî çome esker, Şivanê gundê me Emê bû. Li gund bîra kesî nedihata ka Emê ji kengê va şivanê gundê Minar e. Hûr û gir, jin û mîr; mal û dû hemî kesî bi vî navî lê taniya ziman. “Emê Şivan”; Xaniyê Emê Şivan, jin, keç, der û ban û bilûra “Emê Şivan”. Tu kesek navê dêwbabê wî, navnîşan û malbata wî nizaniya. Emê, bi nav nîşan “Emê Şivan bû.”

Gundiya kû rû be rû pêra xeber didan biçûkan “xal”, jinan “kirîv” û mezinan ji jêra bi tenê “Emê” digotin.

Mala Emê Şivan, xaniyêk kevn û qedîm û taybetmend bû. Xaniyekê dû tebeq, berê kulek û eywana xanî li Roava, tebeqa jêrî li kolana jêr û ya jor li kolana jor; eywanêk fireh û ber vekirî û çar ode, xaniyêk bi keys û têkûs bû û li ber derî ciyê hefşiyê pez û dêza çilo jî hebû.

Ev xanî, xaniyê şivan bû. Kî şivan bû ya xanî yê wî bû. Li gundan bi gelempêrî “Xaniyên şivanan, yên melan û yên gavanan” henin. Li gundê me-kû ev gund qedîm û nehiye ye- “Melayî” hebû. Melayî,

kin, ava dikan.

Lê heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkiroxan bikî hingê bi ên çêkirî şâ û kêfxwêş bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona miletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne.

Xorto! Te dît ko bazekî kevroskek girtiye. Mebêje, ma girtina kevroşkê jî tiştek e. Lê bêje te xezalek girtiye. Ji bona ko baz li xezalê bigere û bide pey wê. Xorto! Min got heke tu nikarî çêkî, lê bawer bike, ewle be ko te dil hebe tuyê bikarî jî. Herçî ko dixwaze dikare jî.

Wekî tu dixebeitî dexesker ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinên wan damêne ber dilê xwe.

Heke di riya xebata xwe de şemi-tî û ketî, tu zanî ew ê çi bikin. Mebêje ko ew ê bêñ bi destê te bigirin, birînên te derman bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî neşiki-yaye.

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatparêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Yêñ de-xisok tu zanî dê çi bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa wan nahêle. Ew ê bêjin: Ma evî çi kiriye, ji bona xwe xebitiye û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev jî tiştek e.

Xorto! Herçî ko bi te berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji xwe di dewra gelekî de stirî bi hezarî ne.

Ew di nav xwe de nexweş bibin, pev biçin jî, li te dixin yek, destêñ xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmtil in. Kêmâniya wan wan digihîne hev.

Ji xwe di tebîtetê de jî welê ye. Tişten qenc û hêja hindik in, nehêja û

bêkêr zahf in.

Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespêñ kihêl hebin, di garana wî de bi sedan ga û çêlek û dewarêñ reş hene. Li nik xelkê gundi ne piraniya garanê, lê hindikaiya hespêñ kihêl bi qedir û hêja ye.

Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko eleyhâriya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayêñ nekêrhatî û mivro ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û kutkuta wan e.

Xorto! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê tête vemi-randin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pifkirinê natirse ew ê her bilindtir, çira te ko bi pêjnê na-lerize ew ê her geşir bibe.

Keçê! Di van gotinan de para te ne hindik e. Keçê! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, diya wî xortî yî ko min şîret lê kir û kar û xebata wî şanî wî da. Belê keçê, ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew lorand. Di dawetê de te jê re tilîland. Di roja qewmandinê de te nav di wî da. Ji xwe tu berekê wî yî.

Keçê! Min ji te divêt, tu xortê min welê bixwedî bikî û bigihînî ko li pesn û şabaşan sezâ bit û lome jê mebit. Keçê! Tu di her kar û deravî de arîkara xortê min î. Tu ê pê re bijî, pê re jî bimîrî.

*Celadet Alî Bedir-Xan,
"Hawar", hjm. 18, 1932*

mirandî, belaviyê tu kevandî. Hin hene dixwazin bixebeitin, lê tu kes naxwaze li ber destê yekî din de bixebeit. Dil û çavê herkesî di serdestiyê de ye. Herkes dixwaze bibe axa, lê çavê tu kesî di peyatiyê de nîne. Ji lewra di nav me de axa nînin û herkes axa ye. Lê tu ê holê nekî. Tu bi awakî din bixwedî bûyî û hatî gehandin. Belê tu jî [dê] li mezinahiyê bîgerî. Tu jî dê bixwazî bibî axa. Lê ne bi vî rengî.

Xorto! Guh bidê. Rind bala xwe bide. Berê pêşîn tu ê bêxî serê xwe ko tu xulamê milet û paleyê wematê xwe yî tu ê xizmeta wî bikî û ji bona wî bixebeitî. Dîsan tu ê bizanî ko axayên rastîn ew in ko xulamiya miletê xwe dikin, ên din tevda axayên derewîn in.

Dema ko tu dixebitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebitin an ne. Herçî ko dixebite karê xwe pêk dişîne û karê tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Herdar bi pelên xwe sayedar e, ne bi pelên darêñ dorê.

Tu ne bi tenê yî. Di dora te de hinêñ din jî hene ko dixebitin. Heke te

tiştek pêk anî li dora xwe fedikire, li tiştekî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûz bîbit. Hon hemî ji bona avahi-yekekî dixebitin. Her kî ji we hîmê wî daniye Xwedê jê razî bit. Pesn jê re

bit, heqê wî ye.

Hon jî herin dar û qırş, herî û kevirî peyda bikin. Dîwar an banekî wî çêkin. Navdidaniyê bidin. Lê ne ko bidexisin. Tu ketiyî cînariya yekî ko avahiyek bi du mezelan anîye pê. Tu di xwe re wê xurtiyê dibînî ko bikarî avahiyeye çend tayîn û mezelîn berpê bikî. Li avakirina mala mezin bi xerabkirina a kiçik dest pê meke. Belê Xorto! Di dewra xwe de kêm û zêde, kiçik û mezin, civat, kom, ci-vanokan dê bibînî. Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bît. Di hertiştî de, nemaze di karêñ nû destpêkirî de, pirê caran, kîmanî he-

ye. Heke te ew kîmanî dîtin, hima dirêjî wan meke. Lê bixebeit ko tu bikevî nav wan, arîkariya danîyan bikî û wan kîmaniyan biedilînî.

Hilweşandina sitûnekê hêsanî niye. Hiner di rastkirina sitûna xwêl de ye.

Xorto! Holê bixebeit, an bixwe çêke an arîkariya ewan bike ko çedi-

*Di hertiştî de,
nemaze di
karêñ nû destpêkirî de,
pirê caran, kîmanî heye.
Heke te ew kîmanî dîtin,
hima dirêjî wan meke.
Lê bixebeit ko tu bikevî nav
wan, arîkariya danîyan
bikî û wan kîmaniyan
biedilînî.
Hilweşandina sitûnekê
hêsanî niye. Hiner di
rastkirina sitûna xwêl de ye.
Xorto! Holê bixebeit,
an bixwe çêke an arîkariya
ewan bike ko çedikin,
ava dikin.
Lê heger tu nikarî bi xwe
çêkî, ne jî arîkariya
çêkiroxan bikî hingê bi ên
çêkirî şâ û kêfxwes bibe.
Ji ber ko ew ji bona te,
ji bona miletê te hatine
çêkirin. Nav di wan bide,
wan bipesinîne.*

Mezin zexm û xurturbûna wan nemaye. Her weko tu zêde bikî ewê kêm bikin. Gava pelên direxkan şîn dîbin, yên darêن kevnare diweşin. Digel xurtiyêن xwe ditirsin. Ji ber ko xurtiya wan derewkî ye. Bi top û tivingan e. Lê bi xwe bi laş û canêن xwe kal û komik in.

Belê xorto ew dixwazin ko tu ji wan re bibî xoşikî. Kirine serê xwe te daxewin. Zimanê te jêkin û yên xwe bi devê te ve bikin. Da ko tu nekarî kurdaniya xwe bi lêv bikî. Lê tu metirse. Ew nizanin ko avên erdê bi ziwakirina pingavêن rûyê erdê naçi-ke.

Dîsan nizanin ko kurd ne avzem in, kanî ne. Bi dagirtina çem û robar bête girtin jî serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber bendan de dipingire, rojekê li wan tête hev di ser wan re diherike û wan di bin pêlên xwe de hil-diweşîne.

Xorto! Tu ji bona hişyariyê dixebitî. Milet nivistiye. Di xew de ye. Ji lewra tête kuştin. Yên te di xewê de bûn. Ewan bi ser yên te de girtine. Ma mirovêن hişyar ko di xwe dikin der têne kuştin.

Xorto! Reya te dirêj, armanca te hêj dûr e. Lê tû bi rê ketiyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe jî. Armanca te aramanca çend nifşan e. Ne tenê armanca te û nifşa te. Gelek rêwiyêن din dê bêñ û bidin ser şopa te. Her rêu riya armancê kurt dikit. Yê nu ji wê dest pê dikit ko pêsiyê wî li wê hiştiye. Rêya te ji ya nifşen din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketine. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji pola bit, destê te hesin.

Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji derve dijmin dirêjî me kiriye. Ji her milî erîş. Di hundurê kelê de şerrekî din, bê eman û ji ê pêşîn mezin û dijwartir heye. Şerê me bi hev du re ye. Di mal de jî dijmin.

Herê Xorto! Birîna me a mezin û xedar dexs e, berberî ye, jana dexsê ye. Em sîngjar in. Ji derve serma li me dixe. Li hundur em bi janê dikevin. Di nav xwe de em çend ber in. Berekî kiçik serê xwe daniye li ser sînga milet, li hilavêtina dilê wî guh-dar bûye û ji xwe re bê den...?

Berekî din heye, li wan temâse dike. Peyayêن vî berî dibînin ko wan tiştek anije pê û hero ditînin. Li wan didexisin. Hingê ew jî dil dikin tiştekî bikin. Lê mîna tiştê çêkirî an jî çêtir nikarin bînin pê. Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkiroxan bikin û ê çêkirî pêşve bibin û bi ser xin. Lê dexsa wan nahêle. Ax ew jana xedar bi pêşîra wan girtiye, wan diêşîne, dikuje.

Ji ber ko çenekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên din jî çêkin. çîko ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çenabe. Yê holê çavê xwe di-din xirabiyê. Ji nekêrhatiya xwe bi tevr û bivir li ser avahiyê ko hinekî din lêkirine, radibin. Li wan dikevin, lê bivir û tevrêن wan ne li avahiyân lê li ling û ejnûyêن wan dikevin.

Tuzanî Xorto ew wek çî û kî ne?

Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stoyê xwe re tewandiye û li sînga ezmanê zelal tif dike. Tu bi xwe bîr dibî ne, ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyêن wan. Ji xwe rêvîn bûn, yekcar dibin seg. Belê xor-to! Dexisiyê tu kuştî, berberiyê tu

di wan kaşan de rênin nû vedikin şopa xuşînok û dewlikan dihêlin û pêş de diçin.

Di paş me de karwanekî dirêj, rêwiyên bê hejmar hene ko di wan neqeban re dê biborin.

Herçend hildikişî û ji deştê dûr dikevî, diwestî, lê ew çend zexm û xurt dibî. Hawîr diguhire, tiştinin welê dibînî ko bi te nenas in. Ji dûr ve leyланan de, dinyake nû, ji bo te nû bi xwe kevn lê jibîkirî, dibînî.

Ew der gulistan, gulgeştek

e. Tê de avêن zelal diheri-kin, mîrgêن rengereng wek keskesorêن ezmanî diçirisin. Darên wê tev kesk û bişkivî ne, xelkê wê delal, ciwan û xurt, herçî mîr zava herçî jin hêj nû bûk in. Ew dinya tu bi xwe yî, ew kurdanî ye.

Carinan lingêن te dişemitin, dikevî xwîşeyan, di şawan re diçî, di ber zandoran re disekinî, li kûriya wan dinihêrî, çavêن te şvereş têن, xilmaşî dibî, dilê te jibîr ve diçe, pêlekê li wê dimînî. Erd qelaç e, şînahî ne diyar in. Di dora te de tenê çend pel tihnav hene. Bibihna wan di xwe dikî der, hişyar dibî û didî rê.

Korto! Te berê xwe daye mizgef-teke welê ko ji awîze û fanosên wê tenê rohniya xweşiyê diherike. Tu tê de di rohnî û tariyên wê de bi xwe bihesî bîr bibî, bîrewerî heyina xwe

bibî. Tu ê bizanî ko heta niho neyînê de bûyî.

Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekinî ye. Di şeklê mirovekî de ye. Tu lê dinihêrî, ecêbmâyî dimînî.

Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, parûhan hertiştên wî he-ne. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berpaş diçit. Laş di cihê

xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş. Ji ber ko ji aliye kî pêş ve, ji aliye din paş ve tête kişan-din.

*Xorto! Reya te
dirêj, armanca te hêj
dûr e. Lê tû bi rê ketiyî.
Hercî ko bi rê
dikeve digihe jî. Armanca te
aramanca çend nifşan e.
Ne tenê armanca te û nifşa te.
Gelek rîwiyêن din dê bêñ û bidin
ser şopa te. Her rîwî riya
armancê kurt dikit. Yê nu ji
wê dest pê dikit ko pêşiyê wî
li wê hiştiye. Rêya te ji ya nifşen
din asêtir e. Ji ber ko gîsinê
xwe dikî erdekî welê ko hêj
tu gîsin lê neketine.
Zeviya te beyar e. Divêt
gîsinê te ji pola bit,
destê te hesin.*

hêñ xwe bel kirine li te fedikirin. Lê ne ji bona
qencyê. Hersê jî dijminên te ne.

Tu îro di bin nîrê wan de yî. Te dişidînin. Bi xwe ditirsin. Ditirsin ko serê xwe rakî. Ji xewa xwe a giran û kevn hişyar bibî û hertiştî bîr bibî.

Belê tu hêj ciwan î, zaro yî, nezan î, hov î. Lê bi xurtiya milêñ xwe bi wan dikarî. Ew gihaşti ne, pîr in.

Qenc bixwîne, rind bala xwe bide, hin berên wê jiber bike. Paş ko te ev xwend û seh kir, nas û hevalên xwe re bide xwendin û ji nexwendîyan re bi xwe bixwîne û bide zanîn.

Heke te holê kir, bi gotin û pendêن min ve çûyî, tu xortê min û, xortê miletê xwe yî, sezayê şabaş û pesn û. An ne... ji xwe destêن min ji te dibin.

✓ Pendêن Ayîna kurdaniyê

Korto! Jîna te, jîna miletê me bi her awayî rojeke qewimandinê ye. Lê ev roj ne mîna rojê din e. Saetêن wê ne bîst û çar lê bêhejmar in, roj tê de bi carêن bêpîvan diçit ava û hiltêt.

Tu di roja qewimandinê de zayî, tê de dijî, heye ko di wê rojê de bimirî jî. Ji xwe tu ji jînê bêtir ji bona mirinê hatî dinyayê.

Ev jîn ji me re gerek e ji bona ko em di dema xwe de wê bidin ber çavê xwe û bimirin.

Korto! Tu çêliyê miletekî kevn, nijadekî mezin û. Pêsiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne. Tu kurê kurdan, neviyê medan, dahatiyê ariyan û. Lê iro ne tu yî, dîl û, reben û belengaz, jar û qels, dewletek û bindest û.

Lê te sond xwariye, li ser bext û xencerâ xwe. Sibe tu yê aza serefraz, bextiyar, kamiran, serdest û bi serxwe bî. Te ev rê ji xwe re bijartîye û tê re diçî. Hêj gelek neçûyî. Tenê çend sal in ko tu tê de yî. Carinan diçî, carinan disekinî şaş dibî, ecêbmayî dimînî, li dora xwe dînihêrî, xwe bi tenê dibinî, didî nependiyan.

Ev pêlek e em tev de bi riya çiya-kî asê ve diçin. Herçend em ji cihê xwe ê pêşîn dûr dikevin hawîr, çarnikar fire dibin, ba tê de xurt e, pêşîya me pê da bandev û bahos.

Xorto! Tu çêliyê miletekî kevn, nijadekî mezin û. Pêsiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne. Tu kurê kurdan, neviyê medan, dahatiyê ariyan û. Lê iro ne tu yî, dîl û, reben û belengaz, jar û qels, dewletek û bindest û.

Belê rê, rêke asê, bi kevir, pêşıya me lat û ferşinin zinar, kop û gaz in. Lingêن me de ne sol, ne pêlav dimînin. Carin hene, em kirâsên xwe dicirînî û ji lingêن xwe ên birîndar re pê reşkan çêdikin.

Bi destêن me re çîmêن hesinîn hene. Serêن wan dikevin kuç û berên rê. Ew wan dialêsin, bi rê va û pê ew kurt dibin, em di ser wan re ditewihin, pişta me duta dabit. Lê herçend çîmêن me kin, piştêن me duta dibin reya me jî ewçend kurt dabit.

Rojin hene li me tarî ye, roja me girtiye. Lê em bi rohnahiya dilêن xwe hawirdora xwe dibînîn.

Şevin hene xew li me diçit, lê em di hişyarî û di ramana armanca xwe de canêن xwe divesihînîn.

Korto! Te ji dîroka miletê xwe, karek li ser xwe girtiye. Ew barekî giran e. Ji xwe barên giran para mîran, para mîran barê giran in. Te ew li pişta xwe kiriye û daye kaşa çiya-yêñ ko bi rê ve bilindtir û asêtir dibin.

Di wan de, ne bervarine şeverê, ne jî şop û rêça pêşîyan diyar in. Em bi xwe, bi ling, dest û neynokêن xwe

Xwe binas

Belê xorto xwe binas, lê ne ser pelekî, xwe qenc, bi dehkere û bingeh binas.

Xorto! Heke te hejmara Hawarê a pêşîn xwendiye, divêt bizanî û bête bîra te ko min ji Hawarê re bi vî deng û awayî dest pê kir û di xêza wê a pêşîn de gotibû:


“Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwenasîn e. Herkesê ko xwe nas dike dikare xwe bide nas kirin (“Hawar”, sal 1, hejmar 1, rûpel 1, yeksemb, 10-ê gulana 1932-yê).”

Îro ez vedigerim ser vê gotinê. Tu îro ji berê ji wê çaxa ko ev xêzên ha hatine çap kirin xwendatir û zanatir ï. Belê ezê îro van gotinan ji te re rave kim, ji hev derêxînim û mana wan bidim zanîn û te ji te re bidim nas kirin. Da ko tu, hon bi tevayî, bikarin xwe ji biyaniyan re, ji cîhanê re bidin nas kirin.

Heyina te, heyina miletê te, tenê bi hattinasînê tête pê. Hetanî ko tu meyî nas kirin, xwe medî nasîn, di nav koma miletan de cihê te nîne.

Ev kitêboka ha ji bona vê yekê hatiye nivîsandin. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dan nas kirin.

Tu kî yî? Ji kîjan milet û nijadî yî? Zimanê te çi ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di çi halî de yî? Jê çawan dikarî bifeilit?



Celadet Ali Bedir-Xan

Bêşansî

Çi bê şans in, Îlahî!

Çi bê şans in, kerê me

Ne dikarin di meclîsek de li çepika xin

Ne li ser kursiyê gotarê li meydana

Bizirin bi dilê xwe

Ma çiyê wan kêm e, ji yên dî

Pîr?

Marîfet?

Zîrekî?

Çi bê şans in Xwedao!

Çi bê şans in, kerên me

ku Sosyalîzm bipelişe Mewlûda Mele Ehmedê Batê weşand. Gelo van “ronakbîrên” me vê yekê çawa dinîrxînin?

Em vana hemûyan deynin aliye-kî, di rojnamêyên Tirkan ên wekî Cumhurîyet, Hurrîyet, İmîllîyet û Sabahê de, hergav ûlanêñ kitêbêñ dînî yên li ser Xiristiyaniyê têñ da-yin û heta îro tu ronakbîrekî Tirkan, di vê yekê de tiştekî negotiye, gotibe jî min nebihîstiye. Gelo ev “ronakbîrên” me doza çi dikan?

Sed hezar kes ji tiştekî şas re bê-jin rast e, dîsa jî ew tişteş şas rast nabe. Vê nêrîna ku ji ûlanake weha re tehamûl nake, wê bi kîjan mîjî-yî ji zimanê Kurdî re xizmet bike? Ez bi xwe meraq dikim, ev yên ku van rexneyan tînin, heta niha çend kovar kirîn, çend kovar dan xwendin? Eşkere ye ku ev kovar bi ri-hetî dernakeve, ma gelo ev ronakbîrên me nafikirin ku bi dayina çend ûlanan barê weşandina kovarê sivik bikin? Emê ji bo vê hejmarê, dayina vê ûlanê rawestînin, belê em li benda alîkarî û ûlanêñ van “ronakbîrên” me ne.

Helbet mesele ne ev ûlan e. Mesele nêrîn û mentalîteyek şas e. Xwezî me jî wek xelqê karibûya di şivakek fireh de li dînyayê biniharata û pêşıya xwe bidîta.

Rexne

Dera ku rexne û xwerexnekirin lê hebe, li wê derê pêşveçûn heye. Belê riya rexnekirinê heye, pîvanêñ rexnekirinê hene. Ez ji we

xwendevan û nivîskarêñ Gulistanê rica dikim, heke rexneyek we heye, heke pêşniyariyek we heye, heke fikrek we heye, rahêjin qelema xwe binivîsin. Ez soz didim ku emê van rexneyêñ we di Gulistanê de çap bikin. Bi devkî, li vir û li wir, filan û bêvan tişti nebêjin. Ji me re binivîsin; çimkî pevy difire nivîs dimîne. Gava ku hûn binivîsin, hingê wê bi hezaran kes ji bîr û rayêñ we, ku hebe ji rexneyêñ we istifade bikin. Ji bîr nekin ku nivîsin, şîura dîrokî diafirîne.

Nivîsîn

Gelî nivîskarêñ Kurd, rûpelêñ Gulistanê ji bo we vekirî ne. Kêrem kin, binivîsin. Li zimanê xwe, li çanda xwe, li dîroka xwe xwedî derkevin. Xelq, rojê bi sedan rojnameyî derdixin, belê halê me kifş e. Mixabin ku hê em nikarin çend weşanêñ peryodîk derxin. Bawer bin bi vê çûyinê, em nagihîjin hevalêñ xwe. Me divê ku em xwe piçekî bîşidînin û xîret bikin. Wek ku me berê jî got, Gulistan ne ya tu der û dorekê ye; ya gelê Kurd e, di xizmeta ziman û kultura Kurdî dê ye. Werin em bi hev re baxçê edebiya-ta Kurdî geş bikin, dilê dost û dîlxwazan xweş bikin. Ji zarûkêñ xwe re mîraseke payedar bihêlin. Zimanê xwe, ku mîrasa me ya herî mezin e, biparêzin.

Heta hejmareke din di xweşiyê de bimînin.

Dr. Abdullah KIRAN

-Biratiyê nakim bêsewdara,
 Ezim xweyê fend û fêla,
 Mewcût serê kemala,
 Ezim sermiyanê aqila,
 Nêçîrvan ber min tîtikin,
 Dîk û mirîşk rindikin,
 Şîr-katixê pîrikê,
 Dadbelînim dequekê,
 Kîne şêr, gurê nas,
 Ezim nav wan mîrxas,
 Belengazin xwe pêxas.
 Xêleke şevê derbazbû,
 Sibe li wan safîbû,
 Rûviyê post zêrîn,
 Hejand dêla pîjîn,
 Qure, kubar, wir rê ket,
 Ne talaşbû, ne minet,
 Lê yê mayîn xwe tada,
 Tirsa nêçîrvan dilda.
 Şeva, şevekê li devê rêkê
 Rûviyê zerîn li wir dî,
 Wê rûviyê fitilbaz
 Dike axîn, kaze-kaz,
 Herdu linga ketiye telê,

 Dike, nake jê dernayê,
 Dikir hewar û zûkîn,
 Dilda tij înk û kîn.
 -Çi bûye, apê me yî zane,
 De bike tu fêl, fene,
 Ne wextê giriyanê.
 -Ber çavê min bûye dûman
 Wele tune qe guman,
 Rûviyê min dêl zêrîn,
 Neke tu min înk û kîn.
 Çarekê tu vir bike,
 Pismamê xwe xilazke.

-De te kirye qurbanî,
 Lê ez nakim namerdî,
 Aqil tacê zêrîne,
 Serê hemû kesî nîne,
 De xwe bavê mirarî
 Wê nêçîrvan tê vî alî,
 Te bivîne ew li vir,
 Wê hêrskeve gelek gur,
 Wê te derxe ji vira,
 Bigire, bavêje derva,
 Tu bireve aliyê darê,
 Ezê bazdim berbi zerê,
 Eve gotina min tera,
 Neke xem-xayala.
 Nêçîrvan dî ecêba reş,
 Rûvî telêda bûye leş,
 Virda, wêda ew bir-anî,
 Pasê hilda wêda danî,
 Tiving hilda ber yê din çû,
 Lê bin çava rûvî şabû,
 Virda-wêda wî mîzekir,
 Cîda rabû û firqaskir,
 Da tirada, ji wir revî,
 Ser zinarkî ew sekinî.
 Rûviyê dinê li wir bazda,
 Fêza apo li kund veda.
 Govend girtin qure, kubar,
 Ser nêçîrvan kenîyan bê zar,
 Lê nêçîrvan bin darêda,
 Rast du gulle berî wan da.
 Bû weqîna herdu rûviya,
 Post belabû herçar aliya,
 Nêçîrvan wir bi dil keniya,
 Ü riya xweda hêdî meşîya.

Werger ji tîpêñ kîrîlî:
Serdar Dîcle

SALIHÊ KEVIRBİRÎ

SERPEHATÎ-DİROK-SOSYOLOJÎ
20 KILAM 20 QEWIMÎN

filîtê quto

FOLKLOR-DİROK


Weşanên Pêri

DERKET

Navnîşana xwendinê:
Weşanên Pêri

Meşrutiyet cad. Ankara Ap. No. 48/2 Galatasaray-Beyoğlu / İstanbul
Tel: 0212. 251 49 01 Fax: 0212. 249 85 27 salihkevirbiri@hotmail.com

Serxweşî



*Me avakarê Weqfa xwe, kedkar
û dildarê ziman û doza gelê
Kurd Nûrettîn Basût winda kir.
Bila serê malbata wî û gelê
Kurd sax be.*

KÜRT-KAV

Weqfa Çand û Lêkolînî ya Kuro

Weqfa Çand û Lekolînî ya Kurdi



KÜRT-KAV

Li zimanê xwe û li
weqfa xwe xwedî derkeve!